

7 - 8 DECEMBER 1996

UTSTÄLLNING AV KURDISKA BÖCKER PÊŞANGEHA KITÊBÊN KURDÎ

پێشانیگای کتێبێ کوردی



Datum/Dem:

7 - 8 / 12 / 1996

Lördag/Şemî 11.00 - 16.00

Söndag/Yekşemî 11.00 - 15.00

Plats/Cih:

**ABF-HUSET (SANDLER SALLEN)
Sveavägen 41 STOCKHOLM**

Arangên çarî medîyayîndê fêrîyê/Weşanên çarîyê amadekar ê boçkan:

APFC, ÇANDA NÛJEN, DENG, JÎNA NÛ, KITAB-I ERZAN,
KULTURFÖRENINGEN SVERIGE-KURDISTAN, MEZOPOTAMYA, NÛDEM,
PENCÎNAR, REWŞEN, ROJA NÛ, SARA BOKHANDEL, SOL-FÖRLAG

Naverok

Sal 3 • Hejmar 12 • Zivistan 1997

Kultur stûna gel e 3
Ahmet Ferîd

"Feqiyê Teyra êdî kal e, nexweşek pîrr bi hal e" 15
Mahmut Kiper

Jiyana gulekê 18
Ahmet Cantekin

Ji nû ve 21
S. Demir

"Dê û bavê me yek e" 23
Têmûrê Xelîl

Çîrokên hezar û yek şevê 26
Lokman Polat

Bedirxan Beg (Bedirxan Paşa) 29
Malmîsaniy

Çîroka evîna dinyê û hîvê 43
S. Demir

Şert 45
A. Çehov

Rûpelek ji weşangeriya kurdî ya li Swêdê 51
Hevpeyvîn bi berpîrsiyarên weşanxaneyên kurdî re

Haluk Öztürk, Keya Îzol, Mahmûd Lewendî,
Memo Yetkin, Zeynelabidin Zinar, Ahmet Cantekin,
Goran, Hesenê Metê, Ali Çiftçi, Novm Harsan,
Nedim Dağdeviren, Lokman Polat, Firat Cewerî,
Mehabad Qeredaxî, Haydar Diljen

Sal 3
Hejmar 12
Zivistan 1997

| | |
|---|--|
| Xwedî | Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê |
| Redaksiyon | Osman Aytar Mahmûd Lewendî Laleş Qaso Zinar Soran |
| Şertên abonetiye | Salek: 200 SEK Nîv sal: 100 SEK Hejmarek: 50 SEK <i>Ji bo welatên din mesrefa posteyê lê zêde dibe.</i> |
| Îlan | Rûpelek: 1 000 SEK Nîv rûpel: 500 SEK Çarîk rûpel: 200 SEK |
| Pergala rûpelan | Osman Aytar |
| Rismê bergê pêşî | Afişa pêşengeha yekem a kitêbên kurdî (<i>Swêd, 12/1996</i>) |
| Postgiro | 46 32 31-1 |
| ISSN | 1400-528X |
| Çap | Apec-Tryck |
| <i>Berpirsiyariya her nivîsê, ya nivîskarê/nivîskara wê ye.</i> | |

Navnîşan • Adres • Adress:
Box 2015, 176 02 Järfälla/SWEDEN

Kultur stûna gel e

Ahmet Ferîd

Dewletên kolonyalist (Tirkiye, Îran, Iraq û Suriye) hem yek yek di hindurê xwe de û hem di tekîliyên di nav xwede û her wiha di tekîliyên navnetewî de, di derheqê milletê kurd de siyasetên pîralî dimeşînin. Siyaseta wan ya nîjatperest di her warê jiyânê de bi metodên wek: êrîşên leşkerî, ji erdê xwe bi zorê koçkirinê, bi ambargoyên iktîsadî, bi astengiyên di warê jiyana civakî û siyasî de, bi politikayên di warê asimilasyonê de li ser milletê kurd tê tetbîq kirin. Hemû metod û siyasetên li ser xelkê kurd tî tetbîq kirin, di bingaha xwe de ji encameke muşterek re xizmetê dike: Kurd divê wek millet an jî wek civakeke etnîk ji holê bê rakirin û di nav milletên serdest de bê hillandin.

Ji tecrûbeyên heta îro diyar e dewletên ku Kurdistan dagir kirine û bi taybetî dewleta Tirkiyê, pîrsa netewî, ne bi rêyên aşitîyê û ne jî bi tu rêyên din, tucarî çareser ne kirine. Li dijî tekoşîna azadiyê, ya xelkên ji teref wan de bi zorê hatine bindest kirin, her metodên zorê bi kar anîne. Di her hal û karî de, ji bona tevgera netewî bi paş de xî û wê tîk bibin: struktura civakê hilweşandine, qewetên herêmî yen ku muhtemel e, karibin pêşevaniyê ji hereketa netewî re bikin ji ortê rakirine û herwiha bi metodên kirînê, bi xwevegirêdan û bêşexsiyet kirinê, ev hêzana bêrûmet kirine û ji çap de xistine.

Heta iro jî siyaset û metoden dewletên kolonyalist di derheqê pîrsa netewî û bi taybetî di derheqê pîrsa kurdî de ne hatiye guhertin. Lêbelê, hin faktorên esasî rê nedane Tirkiyê ku îro jî bikaribe siyaseta qetîlam û koçkirinê ya ku di xelkê ermenî û li xelkê rûm de kiribû, li ser gelê kurd tetbîq bike. Di vî warî de mirov dikare van mînakên bide: Balansa hêzên siyasî yê herêmî, perçebûna Kurdistanê, konjuktura siyasî ya dinyayê, gelekbûna nufûsa gelê kurd û tevgera netewî.

Di diroka kurd de, ji teref dewletên kolonyalist, erîşên eskerî û koçkirina bi darê zorê periodîk çêbûne. Lê hedefên wan ne wek yê li gelê ermenî û rûm hate kirin bûne. Tedbîrên wisa miweqet bûne û dem bi dem derketine pêş.

Pirtirîn ev metodên ha di demên ku tevgera netewî ya kurdî pêş ketiye û hin fîrsetên ku kurd karibin hin heqên xwe ên siyasî, netewî û kulturî bi destxin, hatine bi karanîn. Heq bi destxistina kurdan li kîjan perçê dibe bila bibe, her dem dewletên perçên din bi hev re nerazîbûna xwe diyar kirine. Ji bo rêlêgirtina van heqên ha, herçî ji dest wan hatiye texsîr nekirine. Ji ber ku ew baş pê dizanin çirûskek herî piçûk, ji bona kurdan dikare ji bona wan hemûyan xeter be. Vê faktorê gelek caran her çar dewlet an jî çendik ji wan, li dijî tevgera kurd anîne ba hev û bi her hawayên xwe êrîşî ser kirine. Tixûbên hevkarîya van dewletan ne bi tenê di çarçova Kurdistanê de maye. Ji ber ku ew dizanin ne bes tenê li Kurdistanê, li derveyî wê, li kuderê dinyayê dibe, îmkana herî piçûk ji bona kurdan, ji xwe re xeter dibînin. Di vî warî de weşanên radyoyên bi zimanê kurdî mînakên herî berbiçav bûne. Weşanên radyoyên Êrivanê, Bexdayê û Tehranê, herçiqas di bin kontrola dewletê de bûne jî û propaganda siyaseta wan kirine, lê programên wan yê kulturî tesîrên xwe li ser hemû kurdên Kurdistanê kiriye. Dewleta Tirkîyê bi xwe hayî ji vê hebû û ihtîmale gelek caran bi rêyên diplomatik hewl daye ku van weşanên rawestîne.

Dewleta Tirkîyê bi xwe ehemiyeta hebûna saziyên wisa û tesîrên wan, yê li dijî siyaseta asimilasyonê, ji me kurdan çêtir fêmkiriye û tedbîrên xwe li gor wê sitendine. Ji ber ku Tirkîyê bingehê siyaseta xwe li ser asîmîlekirin û di nav xwe de hilandina gelê kurd ava kiriye. Ji bona wê jî hedefên wê ew in ku, karibe faktora herî esasî, ya ku heta iro, kurd wek millet li ser lingan hiştiye, ji orte rake. Ancax wê gavê kare civaka kurd bi temamî hilweşîne û wê bêstun bihêle. Ev faktora esasî ye ku civaka kurd heta niha li ser lingan hiştiye, bi hemû elementên xwe kultura kurdî ye. Hedefên Tirkîyê jî ew in ku hemû elementên kultura kurdî, bi taybetî jî zimanê kurdî, folklor, muzîk, edebiyat, urf û adet û stîla jiyana civakî ji orte rake. Tirkîyê ji bo tetbîqkirina vê siyasetê her rê û metod bi karaniye. Ji van metodan çend minak:

Li Kurdistanê mecbûrîna axaftina zimanê tirkî û qedexekirina zimanê kurdî, mektebên bi zimanê tirkî, kontrola li ser masmedyayê, propagandên şovenîstî, şideta li ser civakê, bêşexsiyetkirin û piçûkkirina civaka kurd di çavê raya giştî de.

Tirkîye ji bona ku di vê siyaseta xwe de bi serkeve, herçî tedbîrên ku (çi di hindurê dewletê û çi jî di pêwendiyên navnetewî de) pewist bûne girtiye. Gava pewist bûye, bi dewletên derve re pêwendiyên diplomatik daniye; ji bona îmkânên ku kurdan bi destxistine têk bibe, bi şantaj û tehdîtan ku pêwendiyên xwe ên diplomatik bibire, xistiye mînaqêşê. Wek mînak:

Gava instituya kurdî li Fransayê vebû, radyoya Dengê Emerikayê bi kurdî dest bi weşanê kir û “daghema” mala zarokên kurdan li Swêdê dest bi karê xwe kir, diplomatên dagîrker li dij wan bi protesto û pêwendiyên diplomatik

ketin hereketê.

Ji netîceyên siyasetên her çar dewletên kolonyalîst yê ku di derheqê milletê kurd de heta niha hatiye meşandin, mirov dikare bêje pirsê kurd ne bi tenê di warê siyasî de, herwiha di warê kulturî de jî karakterekî navnetewî stendiye. Ancax ji vê noqte pê de mirov dikare tê bigihê, gelo ehemiyet û rola kulturê ji bo hebûna kurdan çî ye û ji bo çî Tirkîye, Îran, Iraq û Sûriye hebûn û pêşketina kultura kurd naxwazin?

Berî ku li ser van pirsan rawestim, dixwazim bi kurtî li ser têgeha “kultur“ê û ehemiyeta wê çend gotinan bêjim. Kultur:

Tevaya nêrxên an jî qîmetên (yên di warê madî û manewî de) ji teref civakê hatine afirandin û herwiha ji teref wê bi xwe de tî bi karanîna wan e. Ev qîmetana ji adetên-traditionen kulturî pêk tî û prosessa mirovatiyê pêş ve dibin.

Kultur di warê etnîkî de ji alîyekî de fonksiyonên ji hev cidabûnê pêk tîne -teybetiyên grubeke etnîk ji grubên din cida dike û ji aliyekî din jî fonksiyonen întegrasyonê pêk tîne - etnîk grubê di hindurê xwe de întegre dike û yekitiya kulturî pêk tîne.

Karakterê kulturê yê herî mihîm ew e ku, karê kominîkasyonê dike; înfomasyonê diparêze û digihîne cîlên ku di pey re tî. Kultur, formê ragîhandina înfomasyonê bi afirandinên kulturî yê madî û manewî; bi rêya edebiyata devkî û nivîskî û bi dan û stendinên şexsî û ne şexsî pêk tîne.

Li ser van karakter û fonksiyonên kulturê yê taybetî mirov dikare bigihê netîceyekê. Kultur bi tevayî ji bona her milletî û bi taybetî ji bona xelkên wek kuradn bindest, di prosessa pêşketinê û di ya şikilgirtina netewebûyinê de, digel hin faktorên din roleke bingehîn dide ser milê xwe.

Li ser esasên jorîn yê ku di derheqê kulturê de hatine nivîsandin, mirov dikare bêje ku rol û giringiya kultura kurd, di hebûna wî de faktorekî bingehîn e. Dewleta tirk jî ev yekê ha baş analîz kiriye û gihiştîye wê netîceyê ku tenê, wê bi metodên ku karibe civaka kurd ji hindur de bêstûn bihêle, yanî kultura wî bi hemû elementên xwe ji ortê rake û di nav xwe de bihilîne.

Tirkîyê ji bona tetbîqkirina vê siyasetê têra xwe tedbîrên hindurî stendî ye. Lê ew tenê bi van jî namîne, herwiha hem bi her sê dewletên dagirker re û hem jî bi dewletên wek Sovyet ku kurd lê dijîn bi rêyên dîplomatîk li dij mafên ku kurdan bi destxistine rawestiyaye û radiweste. Li cihê ku nikaribe rawestîne jî, hewl dide mafên heyînî ku wan ji bona kurdên Kurdistana Bakur bêtesîr bike. Minaka herî darîçav ku li başûrê Kurdistanê lehça soranî li mekteba di hate xwandin. Eger îmkân hebin mirov karibe li arşîvên dewletên ku kurd lê dijîn binere, muhtemele di derheqê vê mijarê de bi sedan dokument hebin.

Bi vê mijarê ve girêdayî, dixwazim li ser hin dokumentên ku di arşîvên

wezareta Rusyayê a derve de ku min xwendine, rawestim. Li gor agahdariyên karbidestên Sovyetê, di meha temûzê sala 1934 de konferansek bi navê "Konferansa kurdî" û "Konferansa Asûrî" çêdibe. Encamên Konferansa Kurdî, ji bona kurdên Sovyetê avakirina zimanê lîteratûra kurdî ye. Kurdên Sovyetê, nûnerê komarên ku kurd lê dijîyan, gelek kesên alim û ronakbîr beşdarî vê konferansê bûne. Ji van beşdarvanan nerînên çendikan jê bi kurtî ev in. Wergera wan, ji teref min ji zimanê rusî hatiye kirin.

1) Gotara Şamîlov (muhtemele Ereb Şamilov be A.F.) 2.VII. 1934

"Ji bona avakirina zimanê kurdî hem ji bona kurdên Sovyetê û hem jî ji bo yên li welatên din dijîn, pêwîste ku em ji lîteratûra ermeniyana tiştên ji zimanê me re maqûl be bistînin..."

2) Peyva Çoban Zade 2. VII. 1934

"Daxwazkirina avahiya yekitiya zimane kurdî yê ku hemû kurdan temsîl bike, hem ne rast e û hem tiştêkî xayalî ye. Herwiha, ez dibêjim ev yeka ha tiştêkî paşverû ye. Li ber me pirsek konkret heye. Ew jî avakirina yekitiya zimanê kurdî yê Zakafkasyayê ye.⁽¹⁾ Pêwîste em zimanê me yê sovyetî ava bikin, zimanê forma herî bilind yê aboriya kollektîv. Ev ziman ji bona kurdên welatên din jî kare bibe mînakêk.

Bêşik, divê em esasên siyasî û yê civakî jî tevî vî karî bikin. Erê, bi vî hawayî em dikarin pîrsa kurd di mistewa dinya yê de çareser bikin."

3) Peyva Sevak 12. VII. 1934.

"Li welatên derve gelek kurd dijîn. Divê em zimane kurdî-lîteratûrî wisa ava bikin ku ev ziman, di rojên pêş de ji teref kurdên welatên din jî bê qebûl kirin. Herwiha, ev zimanê ha divê ji îro de dest pê bike û tesîra xwe li ser zimanê lîteratûrê yên kurdên welatên din jî bike".

4) Peyva profesor Çoban Zade. (tarix ne diyare)

"Li nig me (Sovyetê) bi dehan komar di derheqê sazkirina îmla, elfabe û termînolojiyê de, xwediyê tecrûbên herî dewlemend in. Pêwîste van tecrûbana wek mînakên afirandinên xelkên Sovyetê bînin kom kirin; tecrûbên wan bidin derve, daku karên di derheqê kurdan de tên kirin, di bin tesîra meylên burjuwazî de nemînin."

5) Peyva heval Şamilov. 13. VII. 1934.

"Profesor Xaçatiryan di gotara xwe de dibêje, ji profesorekî îngilîzî namek stendiye û dibêje ku ew di xizmeta dewletên emperyalîst de ye û ji bona berjewendiyên hêzên emperyalîst fêrî zimanê kurdî dibe. Li gor Xaçatiryan profesorekî îngilîzî pêşneyar dike ku em di zimanê kurdî de guhertinên nû bikin. Wisa diyar e alimê îngilîzî bi îrada xwe hikim li me dike û tesîra xwe li ser me dihêle".

6) Peyva serokê kultprop. KM PK Ermenistanê heval Arisyan.

a) “Ehemiyeta vê konferansê dûr diçe, tixûbên Komara (Ermenistan A.F.) me û tixûbên Yekitiya Sovyetê derbas dike“.

b) “Divê em kultur, ziman û lîteratûra ku di jiyana xebatkarên kurd de ghiştiye ji bona wan ava bikin. Pêwîste vana ne bi tenê ji teref hin alim û nivîskaran bîn fêmkirin, herwiha divê ji teref hemû tebeqên xebatkarên kurd yên li welatê me û birayên me yên welatên din bê fêmkirin. Çimkî wezîfa me ew e ku ne tenê xwe pêş ve bibin, herwiha divê em alîkariya birayên xwe yên tebeqî yên li derveyî welêt jî bikin. Ji bona ku li dijî kapitalîzmê tekoşînek aktiv bidin, divê em bala wan bikşînin û di wan de şûra sosyalîzmê pêş ve bibin“.

7) Peyva heval Pirumov . Li ser navê Akademiya Zanistî ya Sovyetê filiyala Zakafkasyayê.

“Divê hûn alîkariya wan (kurdan) bikin û şûrekî ji wan re çêkin. Ne tenê li vêderê ji bona pêşvebirina kultura xwe şer bikin, herwiha ji bona kurdên li welatên din jî şer bikin. Ji bona ku ew ji talankerên emperyalîstan xelas bin pêwîste şer bikin. Ev e mana konferansa we. Pirsên ku li vê derê wê bîn çareserkirin tixûbên pirsên lingvîstîk derbas dikin“.

Di havîna sala 1934an de wek li jor hatiye nivîsandin, ne tenê ji bo kurdên Sovyetê herwiha ji bona temamê kurdan, ji bona avakirina zimanê kurdî mînaqêşeyên cidî di konferansê de hatine kirin. Belê di destpêka sala 1935an de rewş di eleyhê kurdan de tê guhertin. Pêwendiyên Sovyetê û Elmanyayê xerab dibin; hevkarîyek di nav Îtalya û Almanayê de tê saz kirin; Elmanan çavê xwe berdabûn erdên rojavayî Sovyetê û ji bona wê japonî tehriq dikirin ku bi Sovyetê re şer bikin. Elmanan şertên peymanê Wersalê red dikirin û ji alîkî de jî îngîlîz û fransiyên nêzîkayî li elmanan dikirin. Ev bûyerên ha bi hev re atmosfera pêwendiyên navnetewî dişidand. Ji vê rewşa nû ya navnetewî ji hemû dewletan zêdetir Yekitiya Sovyetê pê muteesîr dibû û rewşa nû ji xwe re xeter didît.

Guhertinên ku di konjuktura siyasî ya dinyayê de çêbûn, rastarasta tesîrên xwe li ser siyaseta Sovyetê ya navnetewî kir. Wê bi dewletên cîran re û dewletên din ên xwedî nîfûz re, eleqeyên xwe ên siyasî ji nû de di ber çav re derbas kir. Di rewşa siyasî ya dinyayê de tehlîka ku şerek navnetewî derkeve zêde dibû. Sovyetê haziriyên şer yên ku ji terf dewletên din dihate kirin ji parastina tixûbên xwe re tehlîke didît û ji ber wê dixwast ku qerarên peymanê Lozanê yên der heq rejîma tengavan de bê guhertin. Yekitiya Sovyetê bi taybetî bi Tirkiyê re di derheqê guhertina rejîma tengavên de li ser bahra Reş, dest bi guft û goyên nû kir. Ev pêşneyara Sovyetê dihat hesabê Tirkiyê jî. Çimkî ji aliyekî de Tirkiyê rewşa xwe ya parastinê xurt dikir û ji aliyê din jî şertên ku bi Sovyetê re têketa bazara hin pirsên di wê demê de ku serêş jê re çêdikir

bi dest dixist. Bi taybetî aktuelbûna van pirsan di demek wisa de ne tesadufî bûn. Ji ber ku ev pirsanan ji berê de mewcûd bûn, lê şertên mînaqêşkirina wan ne wek vê demê misaît bûn.

Çend pirsên esasî yên ku ji bona tirkên serêşî çêdikirin ev in:

Pirsa gelê laz, pirsê gelê asûrî û bi tevayî pirsê kurd û bi taybetî jî kurdên Sovyetê bû. Tirkîyê di prosesa guft û goyan de ji Sovyetê daxwaz dikir ku, hemû mafên gelê kurd, laz û asûriyên li Sovyetê, ji ortê rake. Ji ber ku mafên van xelkan, ji bona yekbûn û selameta xwe xeter didît. Tirkîyê ev daxwaza xwe, wek şertê ku karibin bi hev re pêwendiyên dostane deynin, dajot pêşiya Sovyetê.

Di arşîvên Sovyetê de çend dokumentên balkêş, yên ku ji Tirkîyê re serêşî çêdikir ev in:

Di wê demê de li Gurcistanê Kolxozek (kooperatif) bi navê “Krasniy Lazistan” (Lazistana Sor) hebû. Di vê kolxozê de nêzîkî sêsed mirovên laz kar dikirin. Tirkên bi qanalen xwe ên dîplomatîk ji sovyetîyan re digotin ku “hebûna kolxozek bi navê ”Lazistana Sor” dikare tesîrê li ser lazên Tirkîyê bike û bi xwe re perçebûna welêt bîne“. Ya duyem, di vê demê de li Ermenistanê Cemiyetek asûriyan hebûye û wezîfa vê cemiyetê ew bûye ku kultur, aborî û şertên jiyanê xebatkarên asûriyan pêş ve bibe. Dîplomatîk ajanê Sovyetê Neymark, ji Êrîvanê di 15 nisanê sala 1935an de namakê ji wekîlê wezareta derve re dişiîne û tê de di derheqê gazin û konetiyên diplomatên tirkên û herwiha di derheqê “çalakiyên” cemiyeta asûriyan nerînen xwe bi vî rengî dinivîsîne:

“Ji-wekîlê yekem yê wezareta derve (NKID) heval Tsukerman re:

Konsulên Tirkîyê dîsa dest pê kirine bi asûriyan eleqedar dibin. Rastir bêjim, çalakiyên Cemiyeta Asûriyan (filiyalên li Êrîvanê û li Lenînanê) bala tirkên dikşiîne. Tînim bîra we, di rapora Konferansa Asûriyan ya ku di havîna sala 1934an de çêbû, asûriyan xwe wek aksiyonek siyasî li dij Tirkîyê nişan dane. Muhtemele di pêş de jî, raporên çalakiyên asûriyan bi vî ruhî bîn nivîsandin. Lê di pêş de jî di vê cemiyetê de dibe elementên avanturîst peyda bibin. Eva jî dikare ji me re probleman derxe, eger ne bi tirkîyê re, lê bi îngilîzan re. Konsulê Tirkîyê Aral yê li Lenînanê dikare û jê tê, xebata vê cemiyetê karekî li dij Tirkîyê bihesibîne.

Ji bo wê ez zen dikim wê tişteki rast be, eger ku me pirsê qedexekirina vê cemiyetê baniya ber destê merciyên îdarî. (tekst dewam dike A:F) Dipagent li Êrîvanê Neymark.^{“(2)}

Tirkîyê di destpêka sala 1935an de di prosesa guft û goyên bi Sovyetê re, yên di derheqê rejîma tengavan de, ne bi tenê pirsê lexukirina mafên gelê asûrî û laz aktuel dike, herwiha lexukirina sazîyên kurdan, yên li komarên Sovyetê

hene jî dixê rojevê. Ji dokumentên dîplomatîk diyar dibe ku ev daxwaza Tirkîyê bê bersiv namîne. Serokê yekem yê beşê Rojhilat Pîkerman û wekîlê wî A.F.Miller di derheqê konferansa kurdî ya 1934an de, ji dipajanê xwe Neymark yê Êrîvanê raporekê dixwazin. Paşê rapora ku Neymark ji wan re dişîne, di 15. II. 1935an de ji N.N. Krestinskiy re rê dîkin. Rapor li jêr e.

“Ji heval Krectinckiy N.N. re. ⁽³⁾

Divê em nişan bikin ku di konferansê de digel xêrhatin û raporên di derheqê mijara lingivîstîk û herwiha raporek mezin ku tema wê kurd û rewşa feodalîzmê ye, hatiye xwendin.

Naveroka wê jî diyar dike ku Konferansa Kurdî li Êrîvanê wek agahdariyên heval Skobelev ragihandine û li ser wî esasî me bersiv daye tirkan, nexwedî karakterekî bêzerar e.

Em rica dikin, di vê rewşê de pewîste dîrektîfên heval Skobelev ⁽⁴⁾, yên di derheqê Konferansa Kurdî a duyemîn, ya ku wê li Bakuyê çêbibe û herwiha karê merkeza kurdnasiyê bîn munaqesekirin. Ji bona vê divê hûn bi beşdariya hevalên li Moskovayê dimînin, bi Karahan, Skobelev û Neymark re civînekê çêkin.

Serokê yekem yê beşê Rojhilat Pîkerman

Wekîlê serok Yê beşê Rojhilat A.F.Miller. ⁽⁵⁾

Wekîlê wezaretê derve Krestinskîy, rapora karbidestên wezaretê xwe Pîkerman û Miller ya di derheqê Konferansa Kurdî nîrxand û li ser wî esasî, wî jî di 11. 2. 1935an de raporek, ya ku tedbîrên nû, yên di derheqê sazîyên kurdan hatine standin, ji wekîlê W.D. yê Tiflîsê Skobelev re rê dike.

“Ji wekîlê wezaretê derve yê Tiflîsê heval Skobelev re:

Wek hûn dizanin ji bona karê di nav kurdên Zakafkasyayê de biryara hikumetê ya nû ji van xalên jêr pêk tê.

1) Konferansa di derheqê kurdnasiyê, ya îsal (1935) di meha temmûzê de (li Baku A.F.) hatibû plan kirin îptal bûye.

2) Merkeza kurdnasiyê neqlî fîliyala Akademiya Zanistî ya Tiflîsê dibe. Karên kurdnasiyê lazîmî tenê bi karê ilmî bê sînor kirin.

3) Name û nivîsên merkeza kurdnasiyê yên bi derve re, wê ji teref “Komîta Elfaba nû“ ya Sovyetê û komîta herêma Zakafkasyayê bê kontrol kirin.

4) Rojnameya Êrîvanê “Rêya Taze“ divê karaktêrên rojnamek herêmî-netewî bistîne. Herwiha jê (ji “Rêya Taze“ A.F.) re qedexeye ku bi pirsên kurdên derve re eleqedar bibe.

5) Rêkirina rojname, pirtûkên dersan û yên edebî (bi zimanê kurdî) derveyê welêt qedexe ye.

6) Teknîkuma ⁽⁶⁾ kurdî ya pedagojîyê ku li Êrîvanê ye hatiye reorganîzekirin.

Ji dêl wê ve mekteba partiyê (Sovpartşkola) hatiye vekirin. Mekteba partiyê ji bona herêmên ku kurd tê de di piraniyê de ne wê kadrên partiyê û yên sovyeta bigihîne. Di mekteba partiyê de li gor ihtiyacan pêwîste beşekî pedagojiyê, yê nemezîna bê parastin.

Her sê xalên ewil ku li jor hatine nivîsandin, di berpirsiyariya Komîta Elfaba nû ya herêma Zakafkasyayê û komîta giştî ya Sovyetê de ye. Her sê xalên mayîn jî di berpirsiyariya merciyên herêma Zakafkasyayê û yên Ermenistanê de ne.

Ez rica dikim ku hûn di derheqê vî karî de pêwendîyan bi merciyên Zakafkasyayê û Ermenistanê re deynin û vezaretê derve agahdar bikin ku, gelo ji bona tedbîqkirina dîrektîvên hikûmetê çi tedbîr hatine stendin. Herwiha rica dikim ku hûn bizanibin pêşneyara guhertina teknîkuma pedagojiyê ji teref me û hikûmetê de hate pêşkeşkirin. Van pêşneyariyan li ser esasên meteryalên di dema mînaqêşê de di dest me de bûn, hatine kirin. Lêbelê divê ev meteryalên ha ji nû ve di ber çav re bêin derbas kirin.

Eger ku di netîca kontrolê de diyar bibe ku ji bona gundên kurdan ihtiyac ji mamosteyan hebe; ji texmînên ku me kirine zêdetir be û eger ev ihtiyac parastina ped-teknîkê pêwîst bike, divê hûn bi komîta Zakafkasyayê re îzahatên xwe ji me re rê bikin. Wê gavê em ê vê pîrsê ji nû de di ber çav re derbas bikin.

Wekîlê Komîsarê gel (zam narodnovo komisara) Krestinskiy.“⁽⁷⁾

Li ser dîrektîvên wezaretê derve Skobelev di 29. 5. 1935an de ji Tiflîsê qerarên hikûmetê yê di derheqê saziyên kurdan de ku hatine stendin, ji wekîlê wezaretê Krestinskiy re vê raporê rê dike.

“Ji buroya Wezaretê Derve heval Krestinskiy N.N. re:

Birêz Nikolay Nikolayevîç.

Îlawa nameya xwe ya N: 84/c 27. III. 1935an de radigihînim:

Qerara hikûmetê (muhtemele hikûmeta Gurcistanê be. A.F.) di derheqê çareserkirina pîrsa kurdî li gor van xalên jêrîn hatiye îşaret kirin:

1) Konferansa kurdî ya ku wê li Baku çêbiba hatiye îptal kirin.

2) Hemû karê kurdnasiyê li instituya zanistî a li Tiflîsê top bûye. Li vê derê seksiyona kurdnasiyê hatîye organîze kirin. Serokê wê heval Korvin e. ... Xebata wê bes di çarçova zanistiyê de ye.

3) Nivîs û namên di derheqê kurdnasiyê de yê bi derve re, di bin kontrola komîta kulturpropaganda ya Zakafkasyayê de ne.

4) Redaktorê rojname Êrîvanê “Rêya Taze” hatiye guhertin û rojname di çarçova qerarên hikûmetê de ne.

5) Şandina rojname û weşanên kurdî ji bo derveyî welêt hatine qedexe

kirin.⁽⁸⁾

6) Pedteknîkuma kurdî a li Êrîvanê reorganîze bûye û ji dêl wê ve Sovpartşkola (mekteba partiyê û sovyeta) bi beşê pedagojiyê hatiye vekirin.

Bi silavên hevaltî M. Skobelev. Wekîlê wezareta derve⁽⁹⁾

Di derheqê eynî pirsê de, dipagentê Sovyetê yê Êrîvanê Neymark di 5. 4. 1935an de bi nameyekê bersiva nama wezareta derve ya li Moskova dide. Rapor li jêr e.

“... Bi qerarnama merciyên resmî yên vê derê, tevaya karê kurdnasiyê ji îdareya instituya Ermenistanê ya kultura madî hatiye stendin û dewrî filiyala akademiya zanistî ya Zakafkasyayê bûye. Akademiya zanistî li Tiflîsê ye û bi wekaleta wezareta derve re di eynî xaniyê de dimîne. Eva jî kontrala wekaleta wezareta derve li ser karê merkeza kurdnasiyê hêsa dike ku karibe rê li xetayên ne di hesêb de bigire.

Bi vê ve girêdayî ez dixwazim îşaret bikim ku, hemû haziriyên xebatê yên ji bona çêkirina vê konferansê (Konferansa Kurdî ya havina 1934. A.F.) marîfetên Akademiya Zanistî ya filiyala Zakafkasyayê ye. Vekaleta wezareta derve derheqê civandina konferansê de bi taybetî ez agahdar kirim û berî konferansê ez rêyî Leninakanê kirim. Lê gava ez giham wê derê gotarên herî meşhûr yên Primov hatibûn xwendin.

Di roja ku em çûn Êrîvanê heval Primov li wekaleta wezareta derve bû. Heval Skobelev ne tenê Primov bê talimat hiştibû û herwiha agahdariyên çewt dabû komîsariyata gel.

Piştî wan agahdariyên jorîn, Neymark li ser saziyên kurdî û çalakiyên wan radiweste. Neymark radigihîne ku Rojname kurdî “Rêya Taze“ û Teknîkuma kurdî li Êrîvanê mane.. Rojname her ji şeş rojan carekê derdikeve. Ew di xaniyê narkomzemê de dimîne. “Rêya Taze“ bê îstîsna hewl dide ku jiyana rojane û rewşa kulturî û aboriya gundiyên kurd yên kolxozên Talinskiy, Abaranskiy, Kotayskiy û ... herêmen Ermenistanê (SSRA) pêş ve bibe. Tenê ji kolxozên kurda yên herêma Vedinskiy (SSRA) û herêma Naxçivanê kêman çaran nûçe tên.

Di dema konferansa kurdî ya ku gelekî nav û deng dabû, Rêya Taze bi tu pirsên navnetewî elaqedar nebû û her wek berê, li ser karûbarên kolxozên kurdan dinivîsand.

Merciyên xwedî qerar yên Ermenistanê bi himet serokatîya rojnamê dikin. Rojname wisa miqate û bi tahamul e, mirov dikare mihakeme bike ku konsulên tirkan yên vê derê, nikaribûn tu qulpan jê re bibînin. Wek tê zanîn hemû hejmarên wê ji teref tercûmanên tirkan gelekî bi himet tên tercûme kirin.

Teknîkuma kurdî êdî hatiye fesx kirin û ji dêl wê ve mekteba partiyê

(sovpartşkola) bi beşekî mezin yê pedagojiyê hatiye vekirin. Her sal beşê pedagojiyê wê 15 mezûnan bide û teqrîben ewqasî jî beşê partiyê û beşê sovyetê wê mezûnan bidin. Îsal tenê beşê pedagojiyê wê mezûnan bide. 18 mirov mektebê xelas dikin. Ji wana 10 kes wê di kolxozên kurdan de karê mamostetîyê bikin. 2-3 ji yên mayin wê biçin herêma Naxçivanê karê mamostetîyê bikin. 2 mirov wê biçin mekteba blind û yên mayin wê di karên partiyê an jî di sovyetan (yên herêmên kurdan) de kar bikin.

Midîrê mekteba partiyê mirovekî ne kurd e, belê bi kurdî dizane û di warê siyasî de xwe baş gihandî ye. Dipagent NEYMARK⁽¹⁰⁾

Diyar e hewldanên Tirkiyê yên li dijî asûriyan, lazan û kurdên sovyetê di dema goft û goyên li ser guhertina rejîma tengavan dihate kirin, ji bona Tirkiyê netîceyên pozitif didan. Lê diyar e Tirkiyê bi barkirina rojname “Rêya Taze” û beşê kurdnasiyê ji Êrîvanê û bi cihkirina wan li bajarê Tiflîsê, êrîşên xwe yên şowenîst li dij kurdan dujwartir kir. Tirkiyê bazara xwe bi sovyetîyan re, di derheqê têkberina mafên kurdan berdewam dikir. Bi raporên xwe yên kone erîştî ser saziyên kurdan dikir û ew ji xwe re tehlîkek hayatî îlan dikir. Mînakek ji van êrîşên Tirkiyê, dipagentê Sovyetî Neymark di rapora xwe ya di 9. 5. 1935an de tîne zimên. Rapor li jêr e.

“Ji serokê qismê 1ê yê wezereta derve re.

Li gor agahdariyên di destê min de, demek berê Aral û Yılmaz⁽¹¹⁾ di derheqê pîrsa kurdî de raporek bi dizî hazir kirine. Li gor înfomasyonên di destê me de, muhtewa vê raporê ev e:

Konsulên tirkan dinivîsînin ku “di van rojên nêzîk de xwendvanên mekteba ku jê re dibêjin “pedteknîkum” ya li Êrîvanê wê mezûn bibin. Pêncî kes mezûn dibin (Bi rastî 18 mirov in. E.Neymark.). Ev hejmara ha ihtiyaciya mektebên gundên kurdan yên li Êrîvanê derbas dikin (bi rastî têr nake E.Neymark.).

Li Êrîvanê rojname “Rêya Taze” hebûna xwe her berdewam dike. Hebûna wê li ser tixûbê Tirkiyê jo bo me tehdît e û îşareta dijminatiyê ye.

Bingehên karên di derheqê kurdan de li Azerbeycanê top bûye. Li Azerbeycanê di formeke otonomde herêmek bi navê Kurdistanê ava bûye. Tixûbên wê, herêma Karabaxê û Ermenistanê dighîne hev. Li vê derê rojname tirkî “Kizil Kurdistan” û du rojnamên din tên weşandin. Herçiqas Yekitiya Sovyetê hewl dide baweriya dostayê bide me, lê muhtewa van rojnaman mirovan dide isyankirin û dijminatîya Tirkiyê dikin.“

Neymark rapora konsulên tirkan dinirxîne û nerînên xwe ên di derheqê ve raporê de ji wezaretê xwe re rê dike. Neymark dibêje: “Wek hûn dibînin ji van îzahetên kurt yên vê raporê, bala tirkan li ser Kurdistanê Azerbeycanê û herêmên Kelbajar û Laçîn kom dibin.

Bi rastî, berê, fikirên ku li vê derê herêmek Kurd ya otonom ava bikin hebûn. Lê paşê dev jê qeriyar. Lê diyar e li wan deran hin şopên van fikiran hîn berdewam dikin. Hebûna rojnama bi navê “Kizil Kurdistan” mîna keke. Divê heval Ilinskiy bala xwe bidê.

Di derheqê saziyên kurdî (rojname û teknîkum) yê li Êrîvanê, ez bi heval Xanciyan re peyivîm. Wî ji min re got ku, eger van saziyên kurd ji Ermenistanê (SSRA) rakin û bibin Tiflisê, wê gelekî memnûn bibe. Lê vê pirsê ew bi xwe wê dernexe pêş. Ew ê gelekî memnûn bibe eger ku vê pirsê wezereta derve li Moskovayê an jî li Tiflisê derxe pêş.

Ji bona pêşneyariya pirsê neqilkirina saziyên kurd ji Êrîvanê li bajarê Tiflisê, ez dibêjim, eger ji bo vî karî, wekilê wezereta derve yê li Tiflisê bê wezîfe kirin, wê qerarek bi îsabet be... dipagent Neymark.”

Netîceyên hewldanên dewleta Tirkîyê ên li dij gelê laz, asûrî û kurd û yê ji bona guhertina qerarên peymanê Lozanê, hedî hedî berê xwe didan. Qerarên peymanê Lozanê îmkânên gelek fireh didan gemiyên dewletên ku bi bahra Reş re ne cîran bûn. Di 20. 7. 1936an de li bajarê Montroyê qerarên peymanê Lozanê yê di derheqê tengavan de hatin iptal kirin û ji dêl wê ve peymanek nû, bi navê “Peymana Montroyê” ji teref Yekitiya Sovyetê, Tirkîyê, Ingîlterê, Fransayê, Bilgaristanê, Yûnanistanê, Romaayayê, Yugoslawayê, Awistralyayê û Japonyayê hate îmze kirin. Li gor qerarên peymanê Montroyê, rê li tevgera gemiyên herbê yê dewletên ku tixûbê wan li ser behra Reş tunebûn, hate qedexa kirin. Bi vê peymanê Tirkîyê û Yekitiya Sovyetê gihan armancên xwe û pêwendiyên wan her çû xurtir bûn. Karbidestên Tirkîyê, di wê demê de, di organên masmedya xwe de, heşkere behsa nêzîkbûyina pêwendiyên xwe yê bi Sovyetê re dikirin.

Mixabin rastiyeke, nêzîkbûyina Tirkîyê û Yekitiya Sovyetê her demê li dij berjewendiyên kurdan bûye, an jî kurd ji vê nêzîkbûyina wan zerar dîtine. Bûyerên di sala 1937an de jî delaletê ji vê îdiayê re dike. Di vê salê de gelek ronakbîrên kurd yê wek Ereba Şamilov di nav de tîr hepskirin. Mektebên kurdî tîr girtin. Rojnamên kurdî û “Rêya Taze” tîr girtin.

Ez hêvîdar im ku ehemiyeta kultura kurd bi nivîsek wisa kurt be jî, wê bala mirovên kurd bikêşîne ku dijminên kurdan di her demê de ne bi tenê di hindurê dewleta xwe de, herwiha di pêwendiyên navnetewî de jî, hewl dane ku rê li pêşketina kultura gelê kurd bigrin û qismên mayî jî, ji ortê rakin. Dewleta Tirkîyê, ji roja ku ava bûye û heta roja îro, êrîşên xwe yê siyasî, eskerî, îdeolojîk û kulturî ji bona ku karibe stûna struktûra civaka kurd hilweşîne xistiye hereketê.

Notên binî

- (1) Zakafkas herêma Gurcistan, Ermenistan û Azerbeycanê ye. Li van komaran kurdên li Sovyetê dijîn.
- (2) AVP. RF. F. 0132, Op. 18, Por.N 950, Pop.N. 210, list. 60.
- (3) N.N. Krestinskiy di vê demê de wekilê yekem yê wezaretê ya Yekitiya Sovyetê ye. Di sala 1938an de Krestinskiy û Karahan Sefirê Sovyetê yê li Enqerê ji terf hikumetê de bi mirinê hatin ceze kirin.
- (4) Skobelev, wekilê wezaretê derva ya Yekitiya Sovyetê yê Tiflîsê ye.
- (5) AVP. RF. F. 0132, Op. 18, por. 950, pop. 210, list 72-74
- (6) Mekteba teknik
- (7) AVP. RF. F. 0132, OP. 18, POR.N. 950, POP. 210, List: 66-66%
- (8) Di vê demê de du hejmarên Rêya Taze. dişandin derve. Yek diçû Bexdayê û yek jî ji Bedirxaniyan re diçû Şamê jA.F
- (9) A.V.P. R.F. F. 0132, Op. 18, Por.N. 950, Pap.N. 210, L. 53.
- (10) F. 0132, Op.N. 18, Por.N. 950, PapkaN. 210. list. 61-61%
- (11) Aral û Yılmaz karbidestên diplomatîk yên Tirkîyê ne. Aral konsilê Tirkîyê yê Leninkanê ye.

”Feqiyê Teyra êdî kal e, nexweşek pîrr bi hal e!”

Mahmut Kiper

Xwendevanên ku sernivîsa vê maqala min bixwînin, ew dê ecêbmayî bimînin. Lê ez bawer dikim ku wekî min, gelek heval û dost pîrrê caran rastî tiştên weha hatine, lê belkî bala wan nekşandibin.

Berîya vê bi çendekî ez û çend heval me bi hev re rêwîtiyek kir. Rîya me gelekî drêj bû. Wek herkesî me jî di trimbêlê de muzika kurdî guhdarî dikir. Di trimbêlê de qaseteke muzika klasik a kurdî pîrr xweşê me çûbû û me çend caran ev qaset guhdarî kir. Di qasetê de strana Feqiyê Teyran jî hebû. Piştî guhdarkirina çend caran, min fêm kir ku mixabin peyvên stranê hatine guhertin. Gotina ”Ey dîlberê tu menale, Feqiyê Teyra êdî kal e, nexweşekî pîrr bê hal e” weha hatibû guhertin: ”Ey dîlberê tu menale, Feqiyê teyra êdî kal e, nexweşek pîrr bi hal e” Min fêm kir ku ”hunermenda” me zaravê kurmancî baş nizane. Wê ev stran ji derekê bi dest xistiye, bêyî ku stranê baş kontrol bike û eslê stranê rast peyda bike, wê bi vê tekstê qima xwe aniye. Lê, di navbera ”pîrr bê hal e” û ”pîrr bi hal e” de ji alî mane ferqiyeteke gelek mezin heye. Ev stranbêja me a ”hunermend” keçeke kurd e. Bi zaravayê zazakî /dimilî dipeyive û zaravayê kurmancî nizane. Dema ku ”hunermend” zaravayekî nizaniye divê wê demê hîn bêtir bi diqet û hessas be. Ne ku di nav çend rojan de qasetekê çêke ku muzik, stran û helbestên kurdî qetil bike. Divê di her warî de berpirsariyek bê nîşandan. Anûha bi saya vê ”hunermendê” û nezantîya wê Feqiyê Teyrayê heftê salî ji nişka ve bûye ”bi hal” (hamîle) yanî bi zaro!

Lê eger ev cara peşî bûya, belkî ezê li ser nesekinîbama. Ev bûyera han berê van çend salan cardin bi serê min hatibû. Li wê demê min zêde guh nedabû vê meselê. Xwezî hîn wê demê min nivîsek li ser vê mijarê binivisanda. Wê gavê jî dîsa ”hunermendekî” kurd ku ne kurmancî ne jî zaravayekî din zanibû, kasetek bi zaravayê kurmancî dagirtibû û strana Feqiyê Teyra bi vî şiklî digot: ”Ey dîlberê

tu menale, Feqîyê Teyra êdî kal e, nexweşek pîrr bi hal e ” Ev heval di mala xwê de, bi zaroyên xwe re tirkî dipeyvî. Loma jî wer xwuya bû ku wî hevalî strana Feqîyê Teyra jiber kiribû. Strana Feqîyê Teyra digot, lê bêyî ku mana wê û naveroka stranê bizanibe, distra. Wî jî ber ku naveroka stranê û mana gotinên stranê nizanibû, Feqîyê Teyra kiribû bi hal (hamîle) an bi zaro. Ew kaset jî mixabin li gelek deran belav bû.

Ez bi xwe bi muzîka kurdî mijûl nabim. Lê ji muzîka kurdî pîrr hez dikim û jê zewkê distînim. Xwe wekî guhdarvanekî baş qebûl dikim. Ji ber vê yekê jî, wî heqî di xwe de dibînim ku li ser muzîka kurdî çend gotinan bêjim û fikra xwe bînim zimên. Hin kes hene ku, tu zaravayekî zimanê kurdî nizanin û xwe wekî ”hunermend” didin nasîn. Hunermend; çi helbestvan çi stranbêj û çi dengbêj dibin, divê zimanê netewa xwe û edebîyata wê baş bizanibe ku bikaribe berheman biafirîne. Lê wek gelek tiştên din, muzîka kurdî jî bê xwedî maye. Di vir de jî bê plan û programî û bê otorîtebûnê tê ber çavan. Herkes li gor dilê xwe û li gor zanebûn an nezanbûna xwe bi muzîka kurdî mijûl dibe. Lê, ev tişt divê neyê wê manê ku herkesê ku bixwaze an bikaribe xwe wek ”hunermend” lanse bike. Ji bo hunermendî jî divê hin pîvan hebin. Her kesê dengxweş an her kesê ku li tembûrê dixê divê wekî ”hunermend” neyê qebûl kirin an bê nasîn. Ji bo hunermendîtiyê divê zanebûn, pîvan û krîter hebin. Ji bo beşên weha girîng dibistan hatine avakirin, li ser vî warî xebat û perwerdekirina dîrûdirêj pêwîste. Ev hemû pêwîstî li aliyekî, hîn di zaravayên kurdî de nêr (maskulîn) û mê (femînîn) ji hev venaqetînin û bi vê nezanbûna xwe zimanê kurdî û muzîka kurdî qetil dikin û ji aliyên din bi navê ”hunermend” kasêtan dadigrin. Di vir de a herî xerab, ji aliyê hin insanên kurd ”hunermend”ên weha tên qebûlkirin û hezkirin. Helbet ez naxwazim bawer û qebûl bikim ku di warê muzîkê de insanê Kurd hewqas bê zewk û bê pîvan e.

Muzîk, divê bi zimanekî xweş, paqij û edebî xîtabî dil, ruh û mêjî bike. Însanê ku ne hakimê ziman be, nikare muzîkeke baş jî biafirîne. Ger ”hunermendê” ku tu zaravayî nizanibe, straneke wekî strana Feqîyê Teyra dê qetil bike û ew ji alî tu hunermendî an merovên bi karê kulturî mijûl dibin, neyê rûreşkirin, an jî behsa nezaniyê neyê kirin, ev ji bo min pîrr ecêb tê!. Hunermendekî wek Şivan Perwer, Civan Haco, Nasir Rezazî an kesê din ku di wî warî de pispor in, çawa karin weha bêdeng bimînin? An di vî warî de zanebûna wan tuneye? Hunermendên weha bi nav û deng ku ji alî çar perçeyên Kurdîstanê tên hezkirin û qebûlkirin, li gor min divê bêdeng nemînin.

Ji alîkî din, di van salên dawîn de fenomeke nuh di nav muzîka kurdî de hatîye holê. Gelek kurdên ku berê bi zimanê tirkî klam û stran digotin, îro dixwazin bi zimanê kurdî stran û klaman bibêjin. Ev ji aliyekî, merovan kêfxweş dike ku insanê kurd vedigerin ser eslê xwe û hewl didin ku bi zimanê zikmakî êdî ”hunermendîya” xwe bidomînin. Hin ji wan di civata tirk de wekî ”Aşîk” tên binavkirin. Bi salan li Tirkîyê bi stîla Aşîk Mahsunî an jî Aşîk Ihsanî bi zimanê tirkî berhem danin û wek hunermendekî tirk hatine nasîn. Îro di civata kurd de dixwazin bi zimanê zikmakî ”hunermendîya” xwe bidomînin. Gor min, wan dev ji zimanê tirkî berdabin jî, mixabin tu alaqa stîl û muzîka wan bi muzîka kurdî

re tune. Stil û maqamê muzîka wan, a zimanê tirkî ye. Gotinên stranên xwe ji zimanê tirkî tercûmeyê zimanê kurdî kirine. Ji aliyê din di civata kurdî de mîna Aşîk Mahzunî an Aşîk Ihsanî, "Aşîk" tunene. Di civata kurdî de dengbêj hene, lê ne bi mana "Aşîk". Loma jî "Aşîk" tîne fenomeneke civata kurdî ye. Ji ber vê yekê jî, muzîka ku ew kes îcra dikin ne muzîka kurdî ye.

Problemeke din jî ku di muzîka kurdî de ku ez rast tîm; carnana hin hunermendên ku xwe rastî bi her awayî îspat kirîne û bi salan ji bo muzîka kurdî hîzmet kirîne, dixwazên carnana bi zaravayên cuda ên kurdî stranên bêjin. Ev tiştê gelek baş e ku dixwazîna xîtabî hemû însanên Kurdîstanê bikin. Lê carnana di vî warî de hin şaşîyan dikin ku divê merov bala wan bixşîne ser vê meselê. Pîrr normal e ku hunermend û hozanên kurdî hemû zaravayên baş nizanibin û ji ber vê jî bixwazîna hin stranên ku bi zaravayên wan nebin jî jiber bikin. Dema ku stranekê bi zaravayekî din hunermendên me jiberdikin, divê li ser mesela telafuzê baş bisekinin. Ji însanên zimanzan vî zaravayî pîrs bikin ku dê çawa baştir bêjeyan telafuz bikin. Meseleyek ku bala min pîrr dikşîne, ew e ku di zaravayê dimilî /zazakî de bikaranîna nêr û mê ye. Wek mînak, li aliyê Dêrsimê di zaravayê dimilî /zazakî de nêr û mê bi şaşî bi kar tî. Ew hunermendê ku ne ji vê heremê be û bi zaravayê dimilî /zazakî nizanibe vê şaşîyê nabîne û ew jî eynî şaşîyê dike. Lê dimilî /zazayên ne ji herema Dêrsimê vê şaşî û kêmasîye di cîh de ferq dikin. Hunermendek an nivîskarek ji derûdora Dîyarbekirê û Sêwregê be û bi zaravayê dimilî /zazakî bipeyive, ne mumkun e ku di mesela nêr û mê de tevlihevîyan çêke. Carnana hunermendekî/ê ku bi zaravayê kurmançî stranên dibêje, stranekê ji aliyê Dêrsimê dixwe nav repertuara xwe û di mesela nêr û mê de û ji aliyê telafuzê de stranê li bin guhê hevdu dixwe. Niyet û armanca hunermend elbet paqij e, dixwaze di nav zaravayan de nêzîkîyek pêk bê û bi muzîka xwe xîtabî hemu gelê kurdî bike. Lê divê hîn bêtir li ser zaravayan, telafuza bêjeyan xebatê bike. Divê ji merovên zimanzan pîrs bike û di vî warî de ji wan referens bistîne.

Ji aliyekî dewleta tirkî bi polîtîkayê dijwar dixwaze muzîka kurdî bi wesîta merovên ku eslê wan kurdî e, lê bi tirkî stranbêjîyê dikin û gellek klamên kurdî vegeandine zimanê tirkî, ji hole rake. Ji aliyên din jî hin kesên nezan û nîv zane muzîkekê diafirînin ku zerareke mezin didin muzîk, helbest û kultura kurdî.

Jiyana gulekê

Ahmet Cantekin

"De zû bilezîne," got û bi lez di ber jinikê re derbasî hêla holê bû.

Jinikê hinekî bi hêz:

"Ma tu nabinî ku ez rûnenîştîme. Ez yeko yeko tiştan kom dikim ser hev ku dûra em nebêjin, me ev ji bîr kiriye û me ev ne aniye. Bi vê lezê em ê bikaribin çî bibin û çî nebin gelo!"

Jinik piçekî aciz bû bû. Ji ber ku di çûyina wê a ber deryayê de hin pirsgirêk jê re derdiketin. Eger komkirina tiştan û ji bîrnekirina tiştên wek xwê, çetel û kêrê, hest e yan jî kibrît nebûya; şahiya jinikê wê li cih ba. Ji ber ku wê bi xwe jî dixwast biçe ber deryayê. Kincan ji ser xwe bavêje, xwe bide ber sura bayê deryayê daku xwe hinekî sivik hîs bike. Pelê Sivik dizanibû ku Stêrka Mezin tewzan dike. Wî ji jina xwe re her tim digot:

Jin ji bo hezkirinê û bêhnkirinê ne. Ew gupikên gulan yê nûvekirî ne. Merivên zana wan ji ser destan danaxînin. Wek min hez dikin, wek min bêhn dikin, wek min şa dikin...

Hin tişt bi dest xwe re girtin û ji malê derketin. Li otomobîlê siwarbûn û bi rê ketin. Di hikmê bîst û pênc deqîqeyan de gihan ber deryayê. Royê qûm sincirandibû. Siwana xwe vekirin û darikê sîwanê di qûmê de çikandin. Tiştên xwe di bin de rêz kirin. Kincên xwe ji xwe kirin û krêm di laşê xwe dan. Gava ku Pelê Sivik krêm di piştta çelenga xwe dida, yek caran destê xwe tanî ser sênga wê û her du şîrkaniyên wê mist didan. Wî baş pê dizanibû gava ku mêr şîrkaniyan mist bide, dê li hesabê jinê jî bê. Bi wan leptên wî ên dildariyê re, Stêrka Mezin tifa xwe daqurtand. Bi awireke ku bibêje "fermo, de ka were, hezkirin tiştêkî pir xweş e." li Pelê Sivik nerî û bi ser de xiliya.

Pelê Sivik bi dû ku maçek ji herdu lêvên zeriya xwe girt, piştta xwe dayê. Stêrka wî jî hema yekser lepên xwê ji krêmê dagirt, piştta wî firkand û got:

"Cihin din jî hene ku divê krêm bibin?"

Bi vê gotinê re her du jî kenîyan. Xwe di ber hev re li ser çarşefa raxistî dirêj kirin.

Du saetan bêtir zeman derbas bû bû. Ji helperka ku kiribûn zû birçî bûn. Herduyan bi hev re firavîn amade kirin. Hêdî bi hêdî dest bi xwarinê kirin. Bayekî germ laşê wan î gewr û boz dalast. Nîvtêrî ji ser xwarinê rabûn. Dizanibûn ku meriv nikare bi zikê tije ajnê bike. Piştî demekê her du bi hev re ketin nav ava hênîk. Demekê ajnê kirin. Di nav avê de ketin hembêza hev. Maç û tewz kirin. Dûra derbasî listikê bûn û li ser qûmê meşîyan. Stêrka Mezin li pêşiya Pelê Sivik diçû. Piştî ku wê çend gav avêtin, pêyekî wê bi ber tiştêkî di bin qûmê de ket û likumî. Li paş xwe nerî ku bibîne ka pêyê wê di çi aliqî ye. Çi bibîne! Dît ku çend pêçiyên pêyekî di bin qûmê de xuya dikin.

Pelê Sivik jî ew pêçî dîtin. "Gelo ew çi pêçî ne! Pêçiyên kê ne! Ew pêçî çi dikin di bin qûmê de!" bi hev re gotin û çend pên li qûmê xistin. Çîpên jinîkekê xuya kirin. Her ku wan qûm ji ser çîpan û lingan davêt, laşê jinîkekê derdiket. Stêrka Mezin paxaf girt; dilê wê ricifî û xwe bi paş de avêt. Nedixwast ku ne qûmê bavêje û ne jî lê binere! Pelê Sivik ew hembêz kir û dev ji qûmavêtinê berda. Herçiqaş ku li derdora wan meriv hebûn jî, kesî ew bûyer ferq nekiribû. Li çavên hev dinerîn. Bi çavan mîna ku bêjin em çi bikin.

"Eger em bi vî awayî bisekinin, hin dikarin bêjin ku van ev jinîka ha kuştîye û niha jî dikin bin qûmê."

Wan ew term di wî awayî de hiştin û çûn bin siwana xwe. Pelê Sivik du pere ji bêrika xwe derxistin, çû ku telefon bike. Deh deqîqe çû-neçû polîs û ambolans tev doktoran hatin. Pelê Sivik cih nîşanî wan da. Polîsan dorhêl bi şerîteke sor bi çend çoyan ve girêdayî, di qûmê de tik kirin û şidandin. Tu kes nêzîkî wir ne dikirin. Doktor û çend polîsan jî termê jinîkê ji bin qûmê derdixistin. Zarok, jin û mêran li dora şerîta sor kom bû bûn. Merivan bi meraq dinerîn. Çend kesan wêne kişandin. Hinekan ax û wax dikirin. Di wê navê re, du polîsan çend pirs ji Pelê Sivik û Stêrka Mezin kirin.

Term kirin ambolansê û ji wir bi dût ketin. Xelk belav bûn. Stêrka Mezin êdî ne dixwast li wir bisekine. Tiştên xwe kom kirin û bi lez berê xwe dan malê. Kêf û zewqa wan reviya bû.

Êvar derbasî şevê dibû. Stêrka Mezin li ser hev dihizirî. Ji bûyerê vir de ew nekeniya bû. Herçiqaş dixwast ku li televizyonê binere daku bûyerê ji bîr bike, dîsa jî ji bîra wê ne diçû. Di dûmahîkê de penêrê mîhan, nan, bacanên sor, pîvazên teze, îsotên tûj, çend mêwe, xwê, çetel, kêr û çend bîra kirin sarincoka çenteyê xwe; devê sarincokê rind girt û bi şûn de çû odeya xewê.

Mêrik termosê qehweyê ji qehweyê dagirt. Qehwe dikeliya. Hilmek bilind jê radibû. Termos tije bû û hinek jî ji ber ma. Çend caran pifê lê kir û ew qurta mayî qurt kir. Di mêjiyê wî de hucreyan plan çêdikirin.

Wî dengê deriyê dolaba kincan bihîst. Dizanibû ku Stêrka Mezin kirasê xwe derxistiye. Tiştêk li ser wê tune. Qehwe di gupên wî de, xwe gihand oda xewê û xwe avêt jina xwe. Jinîkê xwest xwe piçekî paş de vekişîne, lê firsend neketê. Pelê

Sivik ew hembêz kir, devê xwe kir devê wê. Nîvê qehwê kir devê jina xwe û ew avêt ser textê razanê.

Paceya odeyê vekirî bû. Hundir hênik bû bû. Lê xwîna Pelê Sivik dikeliya. Germiya laşê wî, li gor hêskirina wî, di ser sifirê re sed derece bû. Demekê hevûdin maç kirin û mist dan bi şûn de, Stêrka Mezin got:

”De rabe em herin hîn ku pir germ nebûye. Na hundirê otomobîlê jî dikele.”

Pelê Sivik got:

”Ma tenê hundirê otomobîlê dikele?”

Stêrka Mezin di cih de bersiva wî da û keniya.

”Ez dibînim, hîs dikim, herçiqas ku tu ne li ber Royê ye jî lê hundirê te jî dikele. Ma kela te danehat vê sibehê?”

”Ew sibeh bû!”

”Malava, em çil deqîqeyî berî vê ji nav latan derketin. Min got rabe taştê amade bike ku em bixwîn û herin ber deryayê û te jî got ku tu jî taştiyan nav latan bide; min jî da te. Ma dilê te hîn rihet nebûye? Ma kezeba te hîn hênik nebûye? Tu çi dixwazî? Tu dixwazî ku malê xwe hemî di rojekê de bixwî û biqedîni?...”

Stêrka Mezin keniya, tev kenê xwe naz jî dikirin. Agirê Pelê Sivik her ku diçû gur dibû.

Nîvsaetê bêtir zeman derbas bû bû ku di nav latan de wan xwe digevizand. Xwêhdan bi laşê herduyan ketibû. Çavên wan girtî bûn û mêjiyên wan têkiliyên xwe ji cihanê birîbû. Ew her du bi laşên xwe yên xwêhdandayî û cihê ku ew li ser dirêj bû bûn, hebûn. Hêzên xwe di hezkirinê de dirijandin. Piştî ku wan çend caran hemû tiştên xwe rijandin bi şûn de, bi tenê solixgirtina wan û dengên çend çûkên ji der ve ku çiv û çiv dikirin dihat guhên wan.

Dil û sênga wan bi lez hildahat û dadihat. Laşê xwêhdayî ji hev cihê nebû bûn. Hîn bêtir nêzikî hev bû bûn.

Tev de çûn odeya razanê. Pelê Sivik bi maç û mistdanê kincên wê jê kir û di guhê wê de got:

”Gul divê wek te bin; bèn hezkirin û bêhnkirin.”

Stêrka Mezin xwe li ser piştê dirêj kiribû û diponiji: Termê ku bi roj dîtibû li ber çavê wê sawêr digirt. Pelê Sivik jî xwe li ser palda bû.

Jin ji bo hezkirinê û bêhnkirinê bû. Lê pelên guleke çeleng hatibûn rûçikandin. Gulek kêr bû bû.

Zana gulan bêhn dikin, nezan diçilmisînin û dirûçikînin.

Ji nû ve

Tu
tu tenê
di xewnên şevan
û tenêbûna min de
wek berê ciwan û spehî
her tê û dibî mêvana min.
Ez qet naxwazim wî çaxî
ji xewna te şiyar bibim.
Xwezî min bikarîba
şev û xewnê
bi te re dirêj bikim
heta dawî...
Gava ku ez radibim
û te li kêleka xwe nabînim
hilm û bêhina welatê Hades tê min...
ez Persephone di kirasekî sipî de
li ser textê banûyan dibînim...
gazî min dike bi biryardarî,
ez hêsan dikarim herim...
lê dixwazim rabim
lew te bi rojan
û bi can jî dixwazim.
Bi rojan û bi can,
ji bo ku
ez goristana gotinên xwe yê evînê vekim
wan rakim
û hemûyan ji te re bibêjim.
Û gava şev bibe nîvê şevê
bi destê te bigirim
ya jî te hilgirim
û bibim.

Û gava
îcar dor bê
ku tu rûyê sincirî
deynî ser sênga min,
bila beşîşin û nerînên te
di wê bêdengiya min û te de
çîrok û kilamên herî xweş ji min re bibêjin.
Bila hêviyê û tehma xweşiya jînê
ji nû ve têxin nava dilê min.
Bila bibêjin ku tu ê êdî
ji ba min nema biçî
tu cîhekî din.

Lê tu êdî
ez dizanim ku
ji dinya xeyalan pê ve
mixabin nema dibî a min.
Lê çî gava ku bêriya te dikim
xortaniya min dîsa tê bîra min...
ez dixwazim vegerim wir
û te ji nû ve nas bikim,
bi te re
ji nû ve dest pê bikim.
Bawer bike
min ê qet nehişta
ku tu ji ba min biçî
û di saxiya min de
bibî a hinên din.

S. Demir

"Dê û bavê me yek e"

Têmurê Xelîl

-Heyran, hûn ji bo çi êzîdiya dikin kurd?

-Ne me ew kiriye, dirokê ew yeka ha kiriye!

-Ew çawa dirok e, ku di van dawiyên de li Ermenistanê 52 hezar mirov xwe "êzîdî" hesabandine?

- Ew jî hela pirs e, ku ewqas mirov xwe êzîdî hesabandine?

- Çawa ew jî hela pirs e? Tu ji malûmatên fermî jî bawer naki? Ma ne di sala 1989an de serokatiya statistikiyê ya Ermenistanê (SSE) ilan kir ku, di komarê de 52 hezar mirov xwe "êzîdî" dihesibînin, lê çar hezar jî- "kurd".

- Ez ê ji te re tenê hema wek nimûne gundê me bibêjim, ku bineciyên wî ji miletê me ne: Gelek gundiya digotin ku, dema hesabkirina bineciyan tu kesî ji wan ne pirsî ye, ku ew ji kîjan miletî ne. Nizanîbûn ku kê dewsa miletiya wan kiviş kiriye û şandiye. Gelekan digotin ku pirs bikirana, wê bigotana ku kurd in, lê ne ku êzîdî ne. Û gundên wisa pir hene. Ango pareke wî 52 hezarî kurd in. Ev yek. Ya duduyan:

Parek wî 52 hezarî jî dibêje: "Rast e, min xwe êzîdî nivîsiye, lê dizanim ku êzîdî bi xwe kurd e". Ya sisêyan:

Parek jî dibêje, "Di paseporta min de dema xweda bi xeletî êzîdî nivîsîne, loma jî min ser bingeha paseportê gotiye ez êzîdî me ango di binî de tiştek nema.

-Ne axir rojnameyan jî li ser bingehê SSE-ê malûmat çap kir ku di komara Ermenistanê de filan netewe hene. Yanî ermeni, êzîdî kurd û hwd.

-Berî her tiştî ez jî rind dizanim tu jî, ku SSE pirsê miletkivşkirinê ve mijûl nabe. Eger rast be, jî ku 52 hezar mirov xwe "êzîdî" nivîsîne, ew hela nayê wê manê ku êzîdî ne kurd in. Ew her tenê tê wê manê ku pareke gelê me, ku dîne xwe êzîdî ye, xwe kurd hesab nake, lê êzîdî hesab dike.

- Çawa nayê wê manê?

- Ji ber ku di cihanê de 400-500 hezar mirovên ji milletê te hene (ku tu ji wan re êzîdî ne dibêjî) û ji wana tenê 52 hezar (?) dibêje, ku êzîdî ne û ne kurd in. Hûn li serhevdu dikine 10-12 selefê (%) wan. Ango çi destûra we heye hûn wana bi zorê bikine êzîdî?

- Heyran me we daye mehkemê jî, ew jî izbat dike ku hûn qedirê milletê me ketine û we em kirine kurd. Disa jî em ji we xilas ne bûn.

- Ê... mehkemê jî ser malûmatên SSE hûn bûbû. Min jî ji te re got ku ew ji ku hatine. Eger tu bixwazî di vî warî de dikarim gelek belgeyên çapkirî binim, ku li dijî wê yekê ne? Hema yek jê:

Gelek rojname û kovarên rûsî û ermenî dinivîsînin ku kurd û êzîdî miletek in. Hûn ji bo çi wan nadin mehkemê? wisa xuya dike ku heq-hesabê we bi gelê we ra heye. Wek dibêjin, hûn kûtê xwe germ dikin.

- Ez nizamim, hema ji wextê ku ez heme min xwe êzîdî dîtiye. Û heta hevt govek bavê xwe ve jî êzîdî dizanim. Di paseporta min de "êzîdî" hatiye nivîsandin.

- Belê dibe tu ji hevt govek bavê xwe ve êzîdî bî, ji ber ku te wisa bihistiye. Lê gelo tu dikarî 70 govek herî? Ya paseportê jî bêjim: Di paseportên 30-35 milyon kurdên cihanê de "kurd" ne hatiye nivîsandin, naxwe ewana ne kurd in, erê?

- Ez ê çawa ewqas herim? Şêx-pîrên me bîr û bawerî pê anîne ku em êzîdî, miletekî cihê ne.

- Qet jî ne wisa ye! Hin şêx "em êzîdî kurd in" û hin jî "em êzîdî ne," dibêjin. Li ser vê yekê kasetên vidyoyê li ba min hene. Eger tu bixwazî ez dikarim bidim te. Yadin, bi qasî ku ez dizanim şêxên me ê herî xwende Erebe Şemo, Ûsivê Beko, Etarê Şero bûne. Ev şêx êzîdiyan kurd dibînin. Hem berhemên wan bi temamî li ser jîn û jiyana kurdeyatîyê hatine nivîsandin. Lê iro hin şêx dibêjin-em qureyşî û muawî ne. Gelo ewana dizanin, ku qureyşî navê qebila Mehemed e? Herwiha Muawî jî ereb e.

- Heyran wisa nabe, ez çi dibêjim tu dijî min derdikevî. Baş e eger em êzîdî û kurd ne du milletên ji hevûdin cihêbana, gerek di civîna ku li Ermenistanê de pêk hatibû, êzîdiyan şêxekî xwe î olî wek pêşîkarê êzîdiyan hilnebijartana. Êzîdiyan ev civîn li darxistibûn.

- Ez rind dizanim ku tu ronakbirên me êzîdiyan beşdarî vê civîne ne bûne û herwiha li dij rawestiyane. Ya duduyan:

Di Ermenistanê de 24 gundên kurdan hene û bineciyên wan bi dinê xwe ve hemû jî êzîdî ne. Ma tu dikarî navê tenê gundekî bidî ku qena 20 selefê (%) bineciyên wî tevî vê civîne bûne an jî tevî "meşa êzîdîtiyê" bûne?

-Lê ewqas millet ji kuderê hat? Ne axir em ji we pirtir in, di nav me de jî ronakbir hene.

-Berî her tiştî hîn jî ne diyar e ku hûn ji me pirtir in. Hem pîrbûna we nayê wê manê ku hûn miletekî ji me cihê ne. Yadin; her mirovê ku xwendina bilind kiribe dikare ronakbîr nebe. Ronakbîrî tişteki din e.

- Min çi got û te jî ez xelet derxistim. Baş e ev çawa tê, hin ronakbirên me bi

xwe jî dibêjin ku "Em êzîdî ne".

-Ewên dibêjin ku em êzîdî ne, hîç xeletî tê de tune, ji ber ku êzîdî jî kurd in. Bi vê bersivê ew bersiva du pirsan didin ku miletê wan kurd e û dinê wan jî êzîdîtî ye.

- Lê çima kurdê êzîdî dikare bêje ez êzîdî me, belê kurdê misilman nikare bêje ez misilman im?

- Ji ber ku gava kurdê misilman bêje ez misilman im, wê neyê fêmkirin ku kurd e, faris e, ereb e, tirk e, bêlûc e, qazax e, tacik e an jî turkman e. Lê gava yek bêje ez êzîdî me cihan jî, xwedê jî wê bizanibe ku ew kurd e.

-Lê çima dibêjin "ez kurmanç im?"

- Ev tê wê maneyê ku miletê wî kurd û zaraveyê wî jî kurmançî ye.

-Lê hûn çima dixwezin navê êzîdîtîyê ji rûbarê cihanê rakin? Ev talûkeyek mezin e ji bo me! Ji bo çî dixwezin me bikin misilman? Dînê me hem qewîne û hem jî bi zimanê me ye.

-Tu dikarî navê kurdekî bi dinê xwe ve êzîdî bidî, ku ji dinê xwe direve, an jî dixweze bibe misilman? Bi texmîna min tu du tiştan ji hev dernaxî: "kurd" navê miletê me ye, "êzîdî" navê dinê me ye.

- Navê dinê min "Şerfedîn" e, ne "êzîdî" ye!

- Gelo tu koka gotina "Şerfedîn" dizanî bê ji ku hatiye? Ew gotineke erebî ye; ji misilmanîyê pêş de hatiye û gelekî mînanî gotinên Nasirdîn, Sucedîn, Fehredîn û yên wek wan in. Lê dinê me çend hezar sal e ku berî misilmanîyê hebûye.

- Heyran tu dizanî çî, ji me re iro ha dest dide em jî ha dibêjin!

- De wisa bêje de! Naxwe ku di sibehê û dusibehê de awakî mayin dest bide, tu ê cûrekî mayin bêjî? Ez bawer im ku wê wisa be, ji ber ku we çima berê ev giliyana ne digotin?

-Tu ya xwe bêje. Heta we got, me rojnama êzîdkî çap kir û radyoya êzîdkî vekir.

- Em baş dizanin! Rojnama we ne ku bi êzîdkî, bi ermenkî ye. Û radyoya we jî ne ku bi êzîdkî, bi kurdî ye. Eger dixwezin rojnama xwe derxin, belavkirinên radyoyê bidin, herin ji xwe re zimanekî nû biafirînin! Wisa nabe heyran, berpîrsyar û çend xebatkarên rêdaksyona rojnamê û radyoyê şêx û ermenî ne. zimanê wan bi ermenkî û kurmanckî ye. Îcar ev "êzîdîtî" an "êzîdkî" li ku ma?

-Heyran dibe ku tu rast dibêjî, belê ez êzîdî me û bi talaq ez ji ser êzîdîtîya xwe jî nehatim xwar weh!

- Berî her tiştî dê û bavê me yek e. Helbet ez jî dixwazim ku tu nebî misilman, êzîdî bimîne. Belê ez û tu em ji dê û bavêkî ne. Em kurd in.

Çîrokên hezar û yek şevê

Lokman Polat

Çîrokên hezar û yek şevê meşhûr in. Qet dawî li wan nayê. Di demeke qedîm de qralek hebûye. Ev qral digel her qîza ku razaye, di a din î rojê de qîz kuştî ye. Bi vî awayî qral ji xelkê xwe bêhejmar qîzan dikuje. Şevêkê bi navê Şahrezat dora razanê digihê qîzekê. Qîz pir bi aqil e. Dizane ku qral dê wê bikuje. Bi kurtî, Şahrezat li ber qrêl digere ku çîrokekê jê re bibêje û ew jî lê guhdar bike. Qral qanih dibe û Şahrezat dest bi çîrokê dike. Çîrok di wê şevê de naqede; qral dixewe û çîrok serguherî şeva din dibe. Di şeva duduyan de Şahrezat dîsa dest bi çîrokê dike û qral jî pir bi mereq lê guhdar dike. Belê di wê şevê de jî dawî li çîrokê nayê. Qîza bi aqil gotinê ji gotinê pêdixe, çiqasî dibêje ewqasî şweştir dibe, dawiyê li çîrokê nayîne; qrêl dide ber bayê çîrokê û wî bi nav şevan de digindirîne. Ji ber hindê navê çîrokê hezar û yek şev hatiye danîn.

Bi rastî, edebiyata welatên rohilat pir dewlemend e. Edebiyata devkî ji a nivîskî dewlemendtir e. Çîrokên hezar û yek şevê, li welatên rohilat ji sedsala 9an heta sedsala 20an bi devkî û nivîskî dihatine gotin. Li Îranê di sala 1890 î de ev çîrokana bi navê “Hezar Efsane” hatine çapkirin. Çîrok wek dem, bûyeran ji sedsala 10an heta sedsala 16an digire.

Kitêba çîrokên hezar û yek şevê bi zimanê erebî, frensî, hîndî, farisî, spanî, îngilîzî, elemanî, rûsî, tirkî û bi gelek zimanên din jî hatine weşandin. Ev çîrokana bi frensî wek 16 cildan hatine weşandin. Şerîf Onaran ê tirk jî van 16 cildan werdigerîne zimanê tirkî. Di nav weşanên “AFA”yê de hatine weşandin. Her cildek wê 250 - 300 rûpel in. Hemû li ser hev nêzikî 5 hezar rûpelî digire.

Bi rastî, wergerandina 16 cildan ne karekî hêsanî ye. Belê herçendî zor dibe bila bibe, gerek ev çîrok bi zimanê kurdî jî bîn nivîsandin. Di sala 1949an de gava ku şahirê tirk Nazim Hîkmet li girtîgeha Bursayê ji Va - Nû re nameyekê dişîne dibêje ku, “Kitêba Hezar û Yek Şevê miheqeq bikire û bixwîne. Di nav kultura rohilat

de xezîneyek bi navê hezar û yek şevê heye. Dema ku em jê fêdê nebînîn, ev rezalet e. Di roava de çîrokbêjî bi kitêba Bokas dest pê kiriye. Belê li rohilat ji wî bi çend qernan pêştir çîrokbêjiyê dest pê kiriye. Lê çi heyf e ku hêj jî bi tirkî wergera vê berhema hêja bi tamamî nebûye. Wexta mirov hin çîrokên vê berhema delal dixwîne, tê de dibîne ku îro jî ne tenê li welatê me, li Ewropayê jî berhemek wiha mukemel û şareze nehatiye nivîsandin.”

Min her şazde cildê kitêba “Hezar û Yek Şevê” bi dilfirehî xwend. Min dil hebû ku di kovarê de li ser van cildan yek bi yek rawestim; belê ji ber ku zimanekî pir teknîk pêwîst dikir, ez heq jê derneketim. Bi kurtayî tenê dixwazim hinekî qala cildê yekê bikim.

Ev cild ji 294 rûpelan pêktê. Wergerê kitêbê pêşgotinek bi tirkî nivîsî ye. Pêşgotinek din jî a weşanxaneyê frensî jî teref Dr. J. C. Mardrus hatiye nivîsandin. Di her du pêşgotinan de jî li ser çîrokên hezar û yek şevê agahdarî heye. Destpêka kitêbê bi çîroka “Serdar Şahriyar û birayê wî Serdar Şahzeman” dest pê dike. Çîrokên hezar û yek şevê di esasê xwe de li ser awayê nedilsoziya jinê hatiye avakirin. Li gor Serdar Şahriyar jin nesadiq û dilsozê zilêm e. Belê li gor Şahrezatê mesele ne wiha ye: Jin pîroz e, jin dilsoz e.

Şahriyar û birayê xwe her du jî li du welatên ji hevûdin cihê hikimdar in. Şahriyar dixwaze biçe serlêdana birayê xwe. Bi kerwanekî mezin xwe amade dike û bi rê dikeve. Di nivê rê de Şahriyar bi xwe dihesa ku diyariya ji birayê xwe re kiribû, li mal ji bîr kiriye. Şahriyar vedigere malê. Dibîne ku jina wî û xulamekî wî di nav livînan de eşq û kêfê dikin. Şahriyar herduyan di cihêcîh de dikuje û dîsa li kerwên vedigere. Di pey rêwitiyek dûdirêj de Şahriyar xwe digihîne saraya birayê xwe.

Rojekê birayê wî jê re dibêje, Xwe kar bike da em biçin nêçîrê. Şahriyar naxwaze biçe nêçîrê, li serayê xwe pal dide û birayê wî digel birek fêris û pêhlewaniyê xwe derdikevin nêçîrê.

Di van rojên ku birayê wî li nêçîrê ye rojekê Şahriyar di pacê re li derve temaşe dike. Dibîne ku jinbira wî digel pazde, bîst xulam û qewraşan ve xwe li nav bexçe şilfitazî kirine û di golê de sobaniyê dikin. Bi dû sobaniyê de jinbira wî bi xulamekî re dikeve eşqê. Bi vî awayî temamê xulam û qerwaşan heta danê êvarî kêf û seyrane dikin. Serdar Şahriyar ecêp dimîne! Deng nake. Vê yeka ha bi xwe re hiltîne heta ku birayê wî ji nêçîrê vedigere. Bûyera ku jina wî û jinbira wî kiribû ji birayê xwe re rave dike; belê bira bawer nake heta ku her tiştî bi çavên xwe dibîne. Serdar Şahzeman jina xwe, xulam û qerwaşeyan bi carekê ve dikuje.

Serdar Şahriyar di pey bûyera jina xwe û jinbira xwe de, êdî tam dibe neyarê pîrekan. Emir li wezîrê xwe dike û dibêje; “Ji min re her şev tuê keçikekê bîn!” Wezîr her şev jê re keçikekê tîne. Şahriyar heta sibehê bi keçikê re radize û bi ro jî wê dikuje. Qral bi salan vê wahşeta han didomîne. Wisa dibe ku xelk ji ber wî welêt terk dikin û bi çol û çîyan dikevin. Li welêt ji qîza wezîr pêve qîz namînin. Vê carê jî qral doza qîza wezîr dike û dibêje; “Hevalo wisa nabe, îşev jî dora qîza te ye!”

Du keçên wezîr hene. Navê yekê Şahrezat û a din jî Dinyazat e. Şahrezat dibîne ku bavê wê bê kêf e. Mirûzê wî xerabe ye, kûrûdûr difikire û niçniça wî ye.

Şahrezat ji bavê xwe dipirse; “Bavo tu çima wiha diponijî? Derdekî te heye ji min re bibêje.”

Wezîr ji qîza xwe re rastiya meselê hemî dibêje. Şahrezat bavê xwe dibersivîne;

“Min ji qralê xwe re bibe; ya ezê wî qanîh bikim û temamê qîzan ji dest wî azat bikim û ya jî ezê bêm kuştin. Ez narevim û bavê xwe di şûna xwe de bikuştinkirin nadim.”

Wezîr qîzê ji qrêl re dibe. Şahrezat berî ku qral torekê têbîke, qral qanîh dike ku jê re çîrokekê bibêje. Şahrezat dest bi çîroka “Tacîr û Îfrît” dike û dibêje: “Ey şahê min ê bextxweş! Di demekê de tacîrekî gelek dewlemend hebûye..... Şahrezat heta berê sibehê çîrokê dibêje. Dawî li çîrokê nayê û qral jî dawiya çîrokê mereq dike. Ev keça bi aqil dîsa qral qanîh dike ku çîrok ne bi ro, bi şev tîn gotin. Bi kurtî, çend şevêkî çîrokê didomîne. Şahrezat bi dû ku çîroka Tacîr û Îfrît diqedîne vê carê jî dibêje;

“Heger Şahê min îro min nekuje ez ê çîroka Masîvan û cin jê re bibêjim. Ev çîroka ha ji a Tacîr û Îfrît pir xweştir e.”

Qral gotina wê qebûl dike û ew dîsa dest bi çîrokê dike. Şahrezat bi vî awayî li dor sê salan çîrokan ji qrêl re dibêje. Di dûmahîkê de sê zarokên wan ji hevûdin çêdibin û temamê qîzên welêt ji destê vî zalim î azat dike.

Di kitêba Hezar û Yek Şevê de gelek çîrokên xweş û balkêş hene. Her edebiyathez divê çîrokên Hezar û Yek Şevê bixwînin. Bi rastî di programa min de karekî wisa tunebû. Laleş Qaso ji min daxwaz kir ku ez li ser vê kitêbê binivîsînim. Dîsa dibêjim hêvîdar im ku her xwendevanê kurd vê kitêbê bixwîne.

Bedirxan Beg (Bedirxan Paşa)

Malmîsanij

"Berê Xanê li tîla:

*Eskerê Osman Paşa li binya mala xula xula; xila xila
Tavekî baranê hato li hiçka 'ebaya Bedirxan Begê, kekê Tilî Begî
Ter kiro şil û mila...*

Şevoka der şevî, weyla malikwêrano,

Tu çima şerî nekî ji eşq û dila.

De rabe, rabe, fermanîyo, de rabe,

Fermana Bedirxan Begê, kekê Tilî Begî rabû ji Stembolê.

Berê xanê li rêwo,

Derîya dêrê li rêwo;

Osman Paşa şand Heleba xopan Topa-qalê, Toqa mezin ji min re bêwo;

Xaîn nebû li dewletê,

Xaîn bû li hikûmetê,

Dengê topan û tîfinga xweş tê li pê me.

Şevoka der şevî, weyla malikwêrano,

Romîkê di kumsor ketine Cezîra Bota,

Xirab kirin sençaq 'eşîreta.

Berê xanê bi lalîka:

Eskerê Osman Paşa li binya mala hîka hîka:

Heyfa min têt wê heyfê; hate girtin Esefê Lotî Teherê Meymo

Digel girgirê 'eşîra Cezîra Bota.

Şevoka der şevî, weyla malikwêrano,

Romîkê di kumsorî ketine Cezîra Bota,

Xirab kirin ciyê zavan û bûka " ⁽¹⁾

(Ji straneke gelêrî ya kurdî ku behsa liberxwedana
Bedirxan Beg û aligirên wî ya li dijî Osmaniyan dike)

"Mala bar kir ji berîyê
Danîn Çemê Zihêrîyê,
Derbas kirine kelek û gemîyê Ribehîyê,
Bedirê Xezalê cûavkê dide Cizîra Bota,
Dibêje "Eva koçerê Mîra hatin,
Dibêjin em nadin xerc û xeracê mîrîtîyê".

Bedilxan Begê ban dike Mîr Zêydîne,
Dibêjit "Çi dinyak e mi dewran bi kîn e,
Hespa derxin, lê bikin merek û zîne."
Xudê ava bikit mala Bedilxan Begê delal,
Zêde bike dewleta Mîr Zêydîne.

Me şerekî giran danîbûy li qesra Kalê li qûna çiyê
Bedilxan Begê cûavkê rêdikit pey qewm û 'eşîrê çiya.
De rabin eskerê Botanîyê bînin,
Emê bêne meydana Geliyê Hesena,
De emê herne pêşîyê.

Me şerekî giran danî binya mala rikinî,
Dengê va şeşxana li hevdu disekinin,
Minê heyf û sêsid mixabînat e,
Ji şerê ewilî kuştine melekê Divinê.

Me şerekî giran danîbû di pêşî mala,
Dyûyê şeşxana xwe dabûy ber kendala,
Heyf û sêsid mixabînat e,
Derba dî kuştine Hacîkê 'Evdala.

Bestê Beleka wa bi şov e,
Li milkê şov e, yek batov e,
Minê heyfik û mixabînat e,
Kuştine Bedirê Xezalê, ew beranê tov e.

Bestê Beleka wê bi av e,
Sûar û peya dane nave,
Şer xoş kirin mêrkê bi kulav e.

Exmîr Axa derket meşî bi rêyo,
Koma xulam giran e, xwe dane li pêyo,
Mîrê min, şêwr û tekbîr destê xwedêyo.

*Exmîr Axa meşî berê xwe da Cizîrê,
Girgir, mezinên cîhê Bota dîkin vê şêwrê, vê tekbîrê.*

*Exmîr Axa dibê "Cûavkî rêkin mala mino,
Xudê kî, kes girê nedin hizna mino,
Heger ez bême kuştin, Wefat Beg rakin şûna mino."*

*Cûavkî rêkin nav stûyka,
Xudê kî, girê nedin beznên hoka,
Exmîr Axa kuştin li ser tehtûka."* (2)

(Ji straneke gelêrî ya kurdî ku behsa şerrê eşîrên kurd ên ku
nexwestine bacê bidin Bedirxan Begî û alîgirên Bedirxan Begî dike)

Bedirxan Beg*, begê dawî yê mîrnişîna Botan e ya ku navenda wê Cizîra Botan bû.

Hin nivîskar, 'Elaeddîn Secadî, Kendal Nezan, Celîlê Celîl û Cemal Nebez jî tê de, dinivîsin ku Bedirxan Beg sala 1802-yê (3) hatiye dinê. Ne zelal e ka van nivîskaran ev înfomasyon ji kû bi dest xistiye, lê eger înfomasyonên kurê wî 'Ebdirehman rast bin, divê sala çêbûna Bedirxan Begî 1806 be (4).

Bedirxan Begê li Cizîrê hatî dinê (5), ji binyata begên Botan e yên ku bi navê Azîzî, Azîziye yan Azîzan nav dane (6) û binyata binemala wî weha ye (7):

Emîr Şeref Xan I

Emîr Mihemed Xan

Emîr Şeref Xan II

Mensûr Xan

*Di "Ansîklopedîya Tirkî" (Türk Ansiklopedisi) de li ser Bedirxan Beg (Bedirxan Paşa) bi kurtî weha hatiye nivîsandin: "Bedirxan Paşa: Ji mîrêmîranên osmanî B[edirxan] P[aşaa] sala 1843-yê bo Cizîrê hatiye şandin. Ji ber ku navbera wî û eşîrên li deverê xirab bûye, û ji ber kirinên wî yên ne di rê de, walîyê Helebê Osman Paşayê ku sala 1845-ê bû mereşalê Ordîya Enedoluyê, B[edirxan] Paşa girt û ew li gel malbata wî ya tîrmîrov anî Stembolê." (Türk Ansiklopedisi, Milli Eğitim Basımevi, İstanbul, cild 6, r. 6).

Hevoka "ji mîrêmîranên osmanî Bedirxan Paşa sala 1843-yê bo Cizîrê hat şandin" dikare bibe sedema tîgîhiştineka şaş ku Bedirxan Paşa ji cihêkî dî bo Cizîrê hatiye şandin. Lê neku ew ji cihêkî dî bo Cizîrê hatiye şandin, ew jixwe mîrê herêma Cizîrê bû û li Cizîrê dima.

Her weha Bedirxan Beg sala 1847-ê tevî malbata xwe bo Stembolê hatiye birin û mîrêmîran û paşabûna wî jî piştî hingê, 1858-ê ye.

(Bin. Nazmi Sevgen. Doğu ve Güneydoğu Anadolu'da Türk Beylikleri, Türk Kültürünün Araştırma Enstitüsü Yayınları, Ankara, 1982, r. 116.)

Îsmâil Xan
Mistefa Xan
'Ebdulla Xan ('Ebdulxan)
Emîr Bedirxan

Hatiye gotin ku ziryeta vê malbatê digihe Selaheddînê Eyûbî, hinek jî digihînin Xalidê Îbnî Welîd⁽⁸⁾. Lê li gor lêkolîneran iddiaya duyê ne rast e ⁽⁹⁾. Li gor hin nivîskarên jî "kalikên navnas yên malbatî" yên vê binemalê "di babê heftê de" digihin Xanê Bidlîsê, nivîskarê Şerefnameya bi navûdeng Şeref Xan I.⁽¹⁰⁾

Bedirxan Beg (Emîr Bedirxan)⁽¹¹⁾ sala 1835-ê bû "hakimê Kurdistanê" ⁽¹²⁾, bere bere bi hêz ket û serdestiya wî li herêmê belav bû. Diwanzde salan li ser navê xwe xutbe da xwendin⁽¹³⁾.

Di hinek serkaniyan de hatiye diyarkirin ku Bedirxan Begî di şerê osmanî û rûsan yê salên 1828–1829-ê de peyayên xwe neşandine hawara osmaniyan⁽¹⁴⁾, carna bi darê zorê jî otorîteya xwe di nav eşîrên kurd de bi cih kiriye, zordarî li kurdên êzîdî û bi taybetî jî li nestûrîyan kiriye ku bac nedidanê. Sala 1843 û çend salên piştî wê nestûrî bi qefleyan ji aliyê alîgirên wî û yên Nûrillah Begê Hekarîyê ve hatin kuştin. Li gor gotinan di qirkirina nestûrîyan de hejmara kuştîyan gihîşt deh hezaran. Hetta hin konsilên rojavayî ev hejmar gihandine bîst hezaran⁽¹⁵⁾.

E. R. Toledano, dinivîsîne ku li gor belgenamên osmanî, di serhildana Bedirxan Begî de jin û zarokên êzîdî, nestûrî û yaqûbî hatin girtin û li devera Mûsil–Diyarbakirê wek kole hatin firotin⁽¹⁶⁾.

Bêguman di pirsra xirabûna peywendiyên baş yên kurd û nestûrîyan û qirkirina nestûrîyan ji aliyê kurdan ve de tesîreka mezin ya mîsyonerên inglîz û emrîkî û nûnerên hin dewletên rojavayê hebû ⁽¹⁷⁾. Nûnerên brîtanî, frensî û rûsî pir hewl dane ku osmanî êrişan bibin ser Bedirxan Beg û kurdên ku wî serokatiya wan dikir. Ji aliyê dî ve jî osmanî xebitîne ku navbera kurd û nestûrîyan xirab bibe. Bo nimûne, paşayê Mûsilê di nameyeka xwe de ku bo Mîr Şem'ûn şandibû, li dijî kurdan soz û qewlên piştgiriya dide. Di bin re bin re jî kurd ji aliyê osmaniyan ve li dijî nestûrîyên ku -bi gotina wan- "xwe firotine Ewropayê" hatine pîj kirin⁽¹⁸⁾.

Tevî peywendiyên nebaş digel nestûrîyan, danûstandinên Bedirxan Beg û ermenîyan pir xweş bûn. Li gor hin nivîskarên ermen, Bedirxan Begî bi hevkarîya ligel ermenan dixwest beşekî mezin yê Kurdistanê têxe jêr kontrola xwe û piştgiriya Îran, Rûsya û gurcîyan bi dest xe. Li gor Bedirxan Begî, ermenî û kurd birayên xwînê bûn. Tê gotin ku wî zewaca di navbera kurd û ermenîyan de xelat dikir. Di ordiya wî de ermenî xwedî hêzeka giran in.

Stephan Manoglyan, Oganés Çalktryan û Mîr Marto ji aqilmend û qumandarên wî bûn ku ji van Manoglyan li Stembolê di Xwendinxaneyê Îtalî de xwendibû û frensî, îtalî û tirkî dizanibû⁽¹⁹⁾. Lê wek patrikê ermenî yê li Stembolê, ermenîyên li dijî kurdan, piştgirên osmanîyan jî hebûn.

Li gir hin serkaniyan Bedirxan Begî li Cizîrê du fabrikayên barûdê ava kirine û ji bo bisporîya şer û çekan xwendekarên kurd şandine Ewropayê. Li ser gola Wanê dest bi çêkirina gemîyan kiriye⁽²⁰⁾. Hetta li gor hin serkanîyan, wî li Cizîrê ala Hikûmeta Kurd jî hilawîstibû⁽²¹⁾.

Pereyê ku Bedirxan Begî li ser navê xwe çêkiriye nîşan dide ku ew çiqas bi hêz ketiye. Suleyman Nazîf di nivîseka xwe de dibêje ku wî yek ji van pereyan ku li ser "Emîr-î Bohtan Bedirxan 1258" [1842-1843] hatiye nivîsandin, dîtîye. Di hin serkanîyan de tê gotin ku li aliyekî wî pereyî "Emîr-î Bohtan Bedirxan", li aliyê dî jî "sal 1258 hicrî" hatiye nivîsandin⁽²²⁾.

Bedirxan Begî, Cizîr kiribû paytext⁽²³⁾ û "*Şêxulîslamê wî Mele 'Ebdulqudûs, sereskerê giştî Tabir Axa (Tabir Mamo), serokê giştî yê siwaran Hemîd Axa, nazirê Xezîneya Xas û karûbarên taybetî Efendî Axa bû*".⁽²⁴⁾

Kesên ku di nav sînorên serdestiya wî de sûcek dikirin bi tundî dihatin cezadan, destê dizan dihat birîn; lê "*bi bihayekî pîr erzan erd bo gundiyan ku li ser erdê wî bi cih dibûn, dihat dayîn. Diviyabû gundiyan ji sisiya yekê hatina xwe bidana wî, ev jî ji ya ku didan osmanîyan pîr kêmtir bû û gundî ji vê yekê razî bûn. Beşek ji hatina mîrnişînê bo kesên feqîr dihat xerckirin. Begî ev pere li jînebi, zarok, pîr û seqet, pîr û bêkesan belav dikir*"⁽²⁵⁾. Mîsyonerekî emrîkî sala 1846-ê dinivîsîne ku Bedirxan begî bi merdane alîkariya feqîrên ku li qesra wî civiyabûn, dikir. Nivîseka dî ji sala 1852-yê diyar dike ku gundiyan kurd bi çavê 'Mihemedê didoyê' li Bedirxan Beg dinêrin⁽²⁶⁾.

Li warê wî "rêgirî û talan nehatibû bihîstin". Li gor gotinan, di dema wî de zarokekî jî dikarîbû zêrek di dest de bêtirs here û were, bîyaniyan dikarîbûn bêreber, bêtirs bigerin⁽²⁷⁾. Bo nimûne mîsyonerên emrîkî MM. Wrigth û Breathe sala 1846-ê dema li herêmê digeriyan, çar hefteyan li ba Bedirxan Begî mabûn, di rêwingiya 23-rojî de tûşî çî probleman nebûbûn. Li gor ku wan nivîsandiye, "çi bigre giş serokeşîrên Kurdistanê bi dîyarîyan siyaneta xwe pêşkêşî wî dikirin; hesp, hêstir û tiştên bihagiran didanê." Karmendekî konsilxaneyê Fransayê sala 1845-ê gava ji Botan derbas dibe, pesnê çandiniya li devera jêr destê Bedirxan Begî dide. Li gor wî, gund ava û bi serûber in û li herêmê ewlehîyeka kamil heye⁽²⁸⁾. Hetta ji ber vê yekê "mişextî li ser erdê Bedirxan Begî bi cih bûn û bûne eskerên wî."⁽²⁹⁾ Lê "her kesê ku bixwaze nikare li ser erdê wî bi cih bibe û navê 'Kurdê Bedirxan' hilde. Şertê pêşî ji bo her kesê nûhatî, hebûna hesp, çek, şûr û tifengek e, bi kurtî divê çak biçekkirî be û di pêwîstiyê de bi ordiya Bedirxan Begî re li hember dijminan " şer bike⁽³⁰⁾.

Li gor hinekan, Bedirxan Begî "herêmên ku dixistin bin destê xwe, bi sîstema 'meşweret'ê bi rê ve dibirin"⁽³¹⁾.

Berî serhildanê bi salan, sala 1838-ê Bedirxan Begî li dijî begekî kurd, Se'îd Beg, li nik osmanîyan cih girtiye, bûye sedema şkestina Se'îd Beg û lewra jî li gor gotina Moltke mîralaytîya Asakirî Redîfe - "alayîya redîf ya ku nav heyî, bixwe neyî" - bo Bedirxan Beg hatiye dan⁽³²⁾ û hatiye qebûl kirin ku ew bibe "hakim"ê çend qezayan⁽³³⁾.

Sala 1839-ê li nêzikî Nizîbê, di şerê navbera ordiya Brahîm kurê Mihemed Elî yê Kavalayî û osmanîyan de, li ser daxwaza osmanîyan, Bedirxan Beg "bi qasî sed hezar" eskerên xwe ve⁽³⁴⁾ çûye hawara osmanîyan⁽³⁵⁾ û di wî şerî de "sih-çil hezar egîdên kurd qurbanî dane û pîl û perîşan vegeyriyaye."⁽³⁶⁾

Berî ku li dijî osmanîyan serî hilde, giregirên osmanîyan ji bona ku piştgiriya Bedirxan Begî bi dest xî, pîr qedrê wî digirtin. V. Dittel bixwe li wir bûye dema Paşayê Bexdayê "gumlekekî biha, cariyeyek, zîniyeka giranbiha û çend hesp" ji Bedirxan Begî re şandine⁽³⁷⁾. Gava bedewîyan gef li Bexdayê xwarine, Bedirxan Begî çek ji paşayê osmanî re şandine, bi ordiya xwe bedewî jî hev xistine û lewra jî Paşayê Bexdayê sipasiya wî kiriye⁽³⁸⁾.

Bedirxan Beg ku li hin serkanîyan wek "babê tevgera netewî ya kurd" tê binavkirin⁽³⁹⁾ û li gor hin lêkolîneran wek yekî otorîter, mêrxas, dûrbîn, bibiryar, qumandarekî jêhatî⁽⁴⁰⁾ tê nasandin, sînorên desthilata xwe ji Mûsilê heta Sincar, Wêranşar, Sêwreg, Diyarbekir, Sêrt, Wan, Şino, Wirmê (Urmiye), Sablax (Mehabad) û Rewandizê fireh kir⁽⁴¹⁾. Wekî ku Chris Kutschera jî dinivîse, Bedirxan Beg "qehreman"ê nemir yê tevgera serbixwebûna Kurdistan ya sedsala 19-ê ye ku nayê jibîr kirin û mîrekî kurdan yê wisa ye ku beşekî ewqas fireh yê Kurdistanê xistiye bin bandûra xwe ku di demeke tarîxê ya gelek dirêj de evyek nebûye nesîbê tu kurdekî⁽⁴²⁾. Otorîteya wî ewqas belav bûye ku şahê Îranê jî "carna bi xelat û dîyarîyan xwestiye Bedirxan Begî ber bi xwe ve bikîşîne."⁽⁴³⁾

Di salên dawî yê padişahiya Mehmûdê Didoyê de ji ber hin tevgerên Bedirxan Beg yê serhildanhesêb, Sedirezem Mehmet Reşîr Paşayê Çerkez xwest bi hinek soz û qewlan pêşî lê bigre⁽⁴⁴⁾.

Lê piştî ku sala 1839 nêzikî Nizîbê hêzên Misrê bi serokatiya Brahîm Paşayî, osmanî şkandin, Bedirxan Begî li Kurdistanê desthilata xwe pitir çespan û bi hinek mîrên kurd re li dijî osmanîyan "hevkarîya pîroz" pêk anî. Yê ku beşdarî vê hevkarîyê bûn: Mistefa Beg, Derwêş Beg, ji serokên herêma Wanê Mehmûd beg (Xan Mehmûd), ji serokên herêma Hekarîyê Nûrîllah Beg û Fettah Beg, ji serokên Hîzanê Xalid Beg, ji serokên herêma Mûşê Şerîf Beg, ji serokên herêma Qers û Acarê Huseyîn Begê Kor bûn. Herweha Şêx Mihemedê Mûsilî û Sêx Yûsive Zaxoyî ku alimên mezin yê Kurdistanê bûn, gazî eşîran dikirin ku bên beşdarî vê hevkarîya pîroz bibin⁽⁴⁵⁾. Ne bi tenha

kurdên li jêr desthilata osmanîyan beşdarî vê hevkarîyê bûbûn, bo nimûne mîrê herêma Erdelana li nav sînorên Îranê jî hatibû nav⁽⁴⁶⁾.

Albayê îngilîz Rich dinivîsîne, dema ku ew bi fermana siltanî çûye Cizîrê, Bedirxan Begî jê re gotiye: "Ez çi siltanan nas nakim, siltan kî ye? Çima fermanan ji min re dişîne? Ez li vir xwedîyê malê me û naxwazim ji fermanan bizanim ka mêvanê min çima hatiye, ez dixwazim ji mêvanê xwe bixwe bipirsim."⁽⁴⁷⁾ Tê gotin ku di dema xwe ya herî bihêz de Bedirxan Begî nexwestiye bacê bide dewletê û ne jî peyayan bişîne eskeriyê⁽⁴⁸⁾.

Di dema Siltan 'Ebdulmecîd de, di 3-yê çirîya paşîn ya 1839-ê de Fermana Tanzîmatê (Gulhane Hatt-i Humayunu) hatibû îlan kirin. Di bendê sisîyê yê vê fermanê de hatibû gotin ku "ji bona ku misilman û milletên dî (grubên dînî) bê awarte bikaribin ji van azadîyan sûdê bigrin, di bendên can, rûmet, namûs û milkîyetê de li gor hikmên şerîetê ji bo hemû gelê welat ji alîyê me ve garantîyeke temam hatiye dan". Bi vî hawî dewleta osmaniyan garantî daye dewletên Ewropî ku heqên filehên jêrdestên osmaniyan dê bên parastin û wekî ku di dawîya fermanê de hatiye destnîşankirin, ev ferman ji bo konsilxaneyên bîyanî yên li Stembolê hatiye şandin. Êrişên mirovên Bedirxan Beg yên li ser nestûriyan û kuştina wan rastî demeke wisa hatiye ku hinek welatên Ewropayê çî bigre garantoriya filehên osmanî dikir. Dawîya dawî li ser gilî û gazindên bêbir yên konsilê îngilîz û frensî ji Bab-i Alîyê, Sedirezem Reşît Paşayê Mezin baştir dibîne ku Bedirxan Beg ji wêderê bê rakirin û bo Stembolê bê anîn. Ji bo pend û axaftinan berê Kemal Paşa tê şandin. "Lê ewlehîya Bedirxan Beg lê nayê û bi ya wî nake".⁽⁴⁹⁾ Gava ew ji daxwazên osmanîyan re serî danayne, di havîna 1847-ê de osmanî bi ordiyeke ji sih hezar kes, panzde hezar milîs û çil topan pêkhatî êrişê dibin ser⁽⁵⁰⁾. Ordîya Çarê ya wê demê giş bi ser Bedirxan Begî de hatibû şandin⁽⁵¹⁾.

Herçiqas osmaniyan hinek bihaneyên dî dabin pêş jî armanca bingehîn ya êrişên li ser Bedirxan Begî bicihkirina otorîteya merkezî li Kurdistanê bû. Hêzên kurd yên serîhildayî ku li gor texmînan⁽⁵²⁾ ji panzde-hivde hezar kesî pêk hatibûn tevî ku di destpêkê de baş li ber xwe dan, dest danîn ser hin topên osmanîyan jî, neşîyan bi kar bînin û serketinên nû bi dest xin⁽⁵³⁾. Ji alîyê dî, di nav kurdan de nexweşîya kolerayê peyda bû gelek kes jê mirin⁽⁵⁴⁾.

Ji bo şkandina Bedirxan Begî, osmanîyan hemû rê bi kar anîn. Bo nimûne ji birêvebirên tirkên yên li Erziromê Hafîz Paşa û Kemal Begî xwestin bi riya alimê kurd yê bi navûdeng Mele Mehmûdê Bayezîdî bi Bedirxan Beg, Nûrîllah Beg û Xan Mehmûd re bipeyivin, ji ber ku Mele Mehmûdî ji zû ve Bedirxan Beg nas dikir. Lê ev daxwaz bêencam ma. Mele Mehmûdê Bayezîdî fermana Sedriezem Mistefa Reşît Paşa gihand Osman Paşayê nêzîkî Cizîrê û çû ba Bedirxan Beg. Lê berî ku Mele Mehmûd ji nik Bedirxan Beg vegere, Osman Paşayê êriş bir ser Cizîrê. Mele Mehmûd zendegirtî ma û hat ba Osman

Paşa. Lê Osman Paşa ew girt û şand Stembolê û ji padişah re nivîsî ku "ev kes hevkarê Bedirxan Beg e, xayînê dewletê ye". Padişah jî bêyî ku li rastîyê bipirse Mele Mehmûd sirgûnî Wanê kir. Paşê, dema ku kurdan bi serokatiya Xan Mehmûd serî hildan bi gumana ku Mele Mehmûdê Bayezîdî jî pê re ye ew dîsa hat girtin, lê piştî pênc rojan hat berdan. (Ji ber ku Xan Mehmûdî ji bilî kurdî bi çi zimanên dî nizanîbû, gava ku li Erziromê bi birêvebirên tirkan re guftûgo kiribûn, Mele Mehmûdê Bayezîdî jê re tercimanî kiribû.)⁽⁵⁵⁾

Di vê navê re osmanîyan hin mîrên ku alîgirên Bedirxan Begî bûn, xapandibûn û anîbûn nav rêzên xwe. Bedirxan Beg ketibû tengavîyê û xwe li keleha Ewrexê asê kiribû⁽⁵⁶⁾. Mareşal Osman Paşa, Sebrî Paşa û Mistefa Paşa dora Bedirxan Beg girtin û "gefnameya Reşît Paşayê Mezin û nameyek ku tê de hatibû nivîsîn ku eger teslîm bibe û bê Stembolê wê dest bi can û milk û malbata wî neyê dan" jê re şandin⁽⁵⁷⁾. Di vê keleha dorpêçkirî de -li gor hin serkanîyan piştî liberxwedana heşt heyîvan⁽⁵⁸⁾- Bedirxan Begî di 20-ê tîrmeha 1847-ê de xwe da dest⁽⁵⁹⁾.

Yek ji sedemên bingehîn yên şkestina Bedirxan Begî xiyaneta mirovê wî Yezdanşêrî (Îzeddîn Şêr) bû ku çû alîyê osmanîyan. (Bedirxanî heta mirina xwe jî ev xîyanet ji bîr nekir, lê nebûrî. Li gor ku tê gotin, li ba wî tikesî nediwêriya navê Yezdanşêr hilde. Carekê di xewna xwe de dîtiye ku kurekî wî keça xwe daye Tahirê kurê Yezdanşêr, lewra jî bi rojan û mehan xemgîn bûye.)⁽⁶⁰⁾ Li gor hin serkanîyan Bedirxan Begî demekê li ser navê mîrekî dî, ango li ser navê Mîr Seyfeddînê ku bi werasetê bûbû mîrê Botan hikim kiribû û berî ku cihê wî bigre kurê Seyfeddîn Yezdanşêr xistibû zîndanê⁽⁶¹⁾. Gelek nivîskar dibêjin ku Yezdanşêr birazîyê Bedirxan Beg e, lê ne weha ye. Li gor İbrahim Alaaetin Gövsa ku bi neviyeka Bedirxan Begî re zewiciye, babê Bedirxan Beg " *Ebdulla Beg gava mîr, berê pismamê Bedirxan, Seyfeddîn Beg bû mîr, lê ji ber ku nekarî bi vî karî rabibe, li ser daxwaza eşîran birayê mezin yê Bedirxan Salih Beg bû mîr. Lê Salih Beg jî piranî bi terîqet û îbadetê daketibû û lewra jî bi rîza dilê xwe rêveberiya mîrîtiyê (yurtluk) ji birayê xwe yê biçûk Bedirxan re hiştiye.* " Tê famkirin ku Seyfeddînê ku li vir navê wî derbas dibe, babê Yezdanşêr e. Wekî ku me berê jî gotibû, Bedirxan Beg li dijî xwedîyê Keleha Gurkêlê Seîd Begî sala 1838-ê piştgiriya osmanîyan kiribû. Ev Seîd Beg jî xalê Yezdanşêrî bû⁽⁶²⁾. Dibe ku di cîyê Seyfeddîn de mîrbûna Salih û -paşê- mîrbûna Bedirxan, û li dijî Seîd Begî piştgiriya Bedirxan bo osmanîyan, di xiyaneta Yezdanşêr de rolek lîstibe. (Bêguman gelek sedemên xiyaneta Yezdanşêr û yên wek wî hene. Ji ber ku yek ji van dest nîşan dike, ez dixwazim gotineka Osman Sebrî bînim bîra we: "Tê gotin ku birazîyê Bedirxan Beg bi mamê xwe re şer kiriye, birazîyê Seyîd Rîza bi mamê xwe re şer kiriye. Guneh yê mîrê bûye, ne yê birazîyan. Wan neheqî li birazîyan kirine. Ew jî rabûne, şerê wan kirine. Mamê min baş bû, ez li ba mam...")

Bedirxan Begê zora wî çûyî, sala 1847-ê bi birayê xwe yê mezin Salih, birayê xwe yê biçûk Esad û malbata xwe ve bo Stembolê hat şandin. Êxsîr di 19-ê îlona 1847-ê de ghiştin Stembolê ⁽⁶³⁾.

Di dema serhildanê de û piştî wê jî eskerên osmanîyan herêm talan kirin, gund wêran kirin; pir kes kuştin, sirgûn kirin, xistin zîندان. Piştî sirgûnkirina Bedirxan Beg, milk û malê wî yê mayî jî bi panzde hezar qurîşan hat firotin⁽⁶⁴⁾.

Piştî birina Bedirxan Begî bo Stembolê jî serhildaran li hinek deverên Kurdistanê li ber xwe dan. Bo nimûne Xan Mehmûdî heta 19-ê îlona 1847-ê li ber xwe da û vê rojê xwe da dest. Rêvebirên osmanî li ser sozê ku wê "emniyeta wî bê temînkirin" neman û *"destên wî bi darekê ve girêdan û demeke dirêj lê xistin, paşê hingivî li rûyê wî dan ji bona ku mêşên hingiv pê ve bidin."* Xan Mehmûd û hevalên wî birin Stembolê, paşê biryar dan ku bi gemîyê bişînin Varnayê û ji wir jî sirgûnî Rusçukê bikin. Ji aliyê boligeka siwariyan ya di bin qumandariya Yehya Axayê Kolaxasiyê Siwaran -ku jî Şûmnûyê hatibû- bo Rusçuka li bakurê Bulgaristanê hatin veguhastin⁽⁶⁵⁾. Lê Nûrillah Begî xwe teslîm nekir, heta 1849-ê li ber xwe da, paşê neçar ma ku bireve biçe Îranê⁽⁶⁶⁾.

Li ser sedema rastîn a serhildana Bedirxan Begî, bawerîyên cida hene. Hinek dibêjin ku ji bo avakirina Kurdistaneka serbixwe serî hildaye, hinek jî dibêjin ku dewletê dixwest Botanê di navbera eyaletên Dîyarbekir û Mûsilê de dabeş bike lewra Bedirxan Begî serî hildaye. Çunkî "li gor wî" ev plan "ji bo şkandina hêza wî hatibû amadekirin."⁽⁶⁷⁾

Bi şkandina serhildana Bedirxan Begî, osmanîyan dawîya mîrîtiyeka dî ya kurd anîn û bi vî awayî otorîteya xwe li Kurdistanê çespendin. Piştî şkandina serhildanê, Eyaleta Kurdistanê hat damezirandin. Ji rapora serokwezîrtiyê ya 20-ê Cemaziyelewwel 1263 [1847]⁽⁶⁸⁾ mirov dikare tê bigihe ku armanc jê çî ye. Ev in çend beş ji vê raporê:

"Ji bo paşeroja herêma Kurdistanê ya ku bes bi saya serê padişahê me ji destê eşqiyayan hatiye rizgarkirin û belkî jî bi vî awayî ji nû ve hatiya dagirkirin, hin hizr û birên hezretî Muşîr Paşayê Ordîya Enedoluyê hebûn. Li ser wan hat peyivîn û roja berê, Seresker Paşa, Fethî Paşa, Reîs Paşa, Muşîr Paşayê Enedoluyê, Nazir Efendî û misteşar li Bab-i Alîyê civiyan.

Li gor gotina berê ya Muşîr Paşa (...) Ji bona ku di dilê Kurdistanê de cih girtiye û ji ber ku bi vî awayî wê kulma Ordîya Enedoluyê li ser qafê kurdên ku hertim divê di bin çavdêriyê de bin, raweste, li ser pêwîstiya ku bajarê Xelatê (Ahlat) bibe navenda Ordîya Enedoluyê (...) biryar hat dayîn ku divê carekê jî li Şûraya Eskerî li ser vê bê peyivîn û piştî ku fikra Zatê Payebilind hat girtin tiştê ku îcab dike bê kirin.

(...) Paşa, ji bo asayîş û ewlehîya herêma Kurdistanê ya ji nû ve hatî vegirtin pêşniyar dike ku rêveberîyeka taybetî û serbixwe bê danîn û yekî zana û jîr bibe serok, ango ji eyaleta Dîyarbekirê û sencaqên Wan, Mûş, Hekarî û ji qezayên Cizîr, Botan, û Mêrdînê eyaleteka mezin pêk bê.

Li Kurdistanê bicihkirina nîzame, girêdayî kar û xebata hevbeş ya berpirsên ordî û îdarê ye. (...) Piştî serketina mezin ya Padişahê me devera Kurdistanê ji destê hin derebeg û zaliman hat rizgarkirin. Li vêderê bicihkirina nîzame û xweşîya xelkê cih û ji bo refah û asayîşê, tê zanîn ku divê herêm têkeve jêr desthilata rêveberîyeka taybetî. Lewra divê ev cih bibin eyaletek û navê wê bibe Wilayeta Kurdistanê. (...)

(...) Ji bilî hatina Cizîr û Mêrdînê ya ku 4 500 kîsî zêdetir e, ango ji ber ku ji bo eyaleta Kurdistanê 5 000 kîs hatin hatiye teqdîrkirin, vê carê yekûna salane ya meaşên ku divê bîn feshkirin dê bibe zêdetirî 2 200 kîsan.

12 800 kîs mesrefê ku li jorê hat nîşandan gava ku bi 17 100 û tiştêk kîs re bê balanskirin, zêdetirî 4 300 kîsan ji xezîneya me re zêde û wek feyde dimînin. Lê ev yekûn texmînî ye û em bêjin ku îsal ewqas be jî li salên pêş wê zêdetir bibe û xasma piştî ku li Kurdistanê nîzame û îdare ya ku em dipên bi cih bibe, bi saya serê Padişahê me wê pir tiştêk hasil bibin. ⁽⁶⁹⁾

Serhildana bi serokatîya Bedirxan Beg û şkestina wê li deverê tesîreka wisa kir ku tevî ku ewqas sal derbas bûne îro jî stranên li ser Bedirxan Begî di nav gel de tên gotin. (Di destpêkê de hinek beşên ji van stranên hatibûn neqlkirin.)

Li Stembolê "bi riya Reşit Paşa" Bedirxan Beg, Siltan 'Ebdulmecîd dibîne û gava Siltan jê sedema serhildana wî dipirse⁽⁷⁰⁾, Bedirxan Beg vê çarîna 'Umer Keyyamî dixwîne:

"Nakerde gonah der cihan k'îst bego
V'an kes ke gonah nekerd çon zîst bego
Men bed konem o to bed mokafat dehî
Pes ferqê meyanê men o to ç'îst bego"⁽⁷¹⁾

Yanî:

"Kî ye yê li vê dinê gunehnekirî bêje
Yê gunehnekirî çawa jiya bêje
Ez xirabîyê bikim û tu b'xirabî l'min vegerînî
Nexwe çî ye ferqa min û te bêje"

Ev bersiv bi dilê Siltanî bûye.

Bedirxan Beg ligel kesên pê re ji Stembolê "bo Gîrîtê, bajarê Kandiye hat şandin, di şûna mal û milkê wî de yê ku dest danîn ser, bi navê 'bedel-i emlak' mehê 20 000 qurîş jê re terxan kirin⁽⁷²⁾. Lêbelê hatina milkê wî yê ku dest danîn ser, bo nimûne bi tenê ya ji şeş karxwêyên (cihê ku xwê jê derdixin) wî, salê 6 000 000 qurîş tê hesabkirin. Zêdetir ji 20 000 heywanên wî yên wek hesp û bargîrên wî li wir mabûn. "⁽⁷³⁾

(Dewama wê heye.)

Wergera ji tirkî: Remzî Kerîm

(1) Roja Nû, Beyrûd, sal: 4, no: 69 (25 Sibat 1946), r. 2

(2) Celîlê Celîl, Zargotina Kurdên Sûriyê, Weşanên Jîna Nû, Uppsala, 1989, r. 279-280

(3) 'Elaeddîn Secadî, Şorişekanî Kurd we Kurd û Komarî 'Îraq, Bexda, 1959, r. 44

-Sous la direction Gérard Chailand; Kendal, Les Kurdes et le Kurdistan, Bedirxan Beg, 1981, r. 47

-Celîlê Celîl, XIX. Yüzyıl Osmanlı İmparatorluğu'nda Kürtler, Öz-Ge Yayınları, Ankara, 1992, r. 78

-Cemal Nebez, di Govarî Niştiman (Temmûzî 1943-Mayisî 1944) Zimanî Halî "Komeley Jê Kaf" e, Binkey Çapemenî Azad, Stockholm, 1985 de, r. 20

-Mahmut Lewendî, "Mala Bedirxaniyan: Niv Dewletek", Rojname, İstanbul, no: 0 (hejmara provayê), r. 28

-İbrahim Alaâettin Gövsa, Türk Meşhurları Ansiklopedisi, c. 1, r. 67-68

Lê li gor Dr. Bleç Şêrko, Bedirxan di hijde saliya xwe de, sala 1821-ê bûye beg, lewra ji sala 1803-ê ji dayik bûye (Dr. Bleç Şêrko, Kêşey Kurd, Mêjîne w Êstay Kurd, Mihemed Heme Baqî kirdûyetî be Kurdî, Le Blawkirawekanî Yekêtiy Nûseranî Kurdistan, Çapxaney Şehîd Ce'fer, 1986, r. 46).

(4) Di rojnameya Kurdistanê ya ku 'Ebdirehmanê kurê Bedirxan Begî derdixist (no: 13) de, hatiye nivîsandin ku Bedirxan Beg di 63 saliya xwe de miriye. Madem ku Bedirxan Beg sala 1869-ê miriye, divê sala jidayikbûna wî 1806 be.

Li gor bînbaşiyê İngilîz Noel, Bedirxan Beg sala 1870-ê, di 65 salîya xwe de wefat kiriye, ango sala 1805-ê ji dayik bûye (b. [E. W. C.] Noel, Yaddaştekanî Mîcir Noel Le Kurdistan, Wergêrranî: Huseyn Êhmed Caf û Huseyn 'Usman Nêrgisecarrî, Bexda, 1984, r. 148).

(6) İbrahim Alaâettin Gövsa, ber. navg. (berhema navgotî), r. 67-68

(5) Şeref Han, Şerefname Kürt Tarihi, Yê ji 'erebî wergerandiye tirkî: Mehmet Emin Bozarslan, Ant Yayınları, 1971, r. 139

-Hawar (komela kurdî), Şam, no: 5 (20. 7. 1932), r. 4

(7) Emir Bedirhan, Naşiri: Kürdler Cemiyeti namına Lütfî, Matbaa-i İctihad, r. 8

(8) İbrahim Alaâettin Gövsa, ber. navg., r. 67-68-Emir Bedirhan, r. 8

(9) Bo nimûne b. Şeref Han, Şerefname Kürt Tarihi, r. 135, jênot 165

(10) İbrahim Alaâettin Gövsa, ber. navg., r. 67-68

(11) "Bedirhan Bey", Kurdistan (pazde roja de carekî têt nivîsandin cerîdeya Kurdî ye),

Cenevre, no: 13 (20 Mart 1315 [1899]); çapa nû: Kurdistan (rojname Kurdî ya pêşîn/ilk Kurd gazetesi 1898-1902), c. 1, Yê ji herfên 'erebî wergerandiye ser herfên latîni: M. Emin Bozarslan, Deng Yayınevi, Uppsala, 1991, r. 264

Di rûpelê 282 yê her vê serkaniyê de tê diyarkirin ku Bedirxan Begî sala 1256-ê [1840-1841] "zîmam-î idare ya Kurdistanê bi dest xistiye".

Robert Surieu ji dinivîsîne ku Bedirxan Begî sala 1842-ê serbixwebûna xwe îlan kiriye (Robert Surieu, "Kurdistan-V", Roja Nû (quotidien kurde), no: 44 (3. 4. 1944), r. 3).

(12)Lê wekî ku min berê jî nivîsandibû, li gor Dr. Bleç Şêrko, Bedirxan sala 1821-ê, di hijde saliya xwe de bûye beg (Dr. Bleç Şêrko, Kêşey Kurd, r. 46).

(13)Emir Bedirhan, r. 13

(14)Yê li gor Safrastian nivîsandî: Martin van Bruinessen, Ağa, Şeyh ve Devlet, Ya ji îngilizî wergerandiye tirkî: Remziye Arslan, Öz-Ge Yayınları, Ankara, r. 220

(15)M. Salih San, Doğu Anadolu ve Muş'un İzahlı Kronolojik Tarihi, Türk Kültürünü Araştırma Enstitüsü Yayınları, Ankara, 1982, r. 57

-Sosyalizm ve Toplumsal Mücadeleler Ansiklopedisi, c. 6, İletişim Yayınları, 1988, r. 1900
-İbrahim Alaâettin Gövsa, ber. navg., r. 67-68

(16)b. Ehud R. Toledano, Osmanlı Köle Ticareti 1840-1890, Wergêr: Y. Hakan Erdem, Tarih Vakfı Yurt Yayınları, İstanbul, 1994, r. 13.

(17)Celilê Celîl, XIX. Yüzyıl Osmanlı İmparatorluğu'nda Kürtler, r. 137, 143-144

(18)Kemal Burkay, Geçmişten Bugüne Kürtler ve Kürdistan Coğrafya-Tarih-Edebiyat, c. 1, Deng Yayınları, İstanbul, 1992, r. 361

(19)b. Garo Sasuni, Kürt Ulusal Hareketleri ve Ermeni-Kürt İlişkileri (15. yy'dan Günümüze), Yên ku wergerandine: Bedros Zartaryan & Memo Yetkin, Orfeus Yayınları, Stockholm, 1986, r. 70-71, 74-75

-Celilê Celîl, XIX. Yüzyıl Osmanlı İmparatorluğu'nda Kürtler, r. 131-132

(20)Dr. Bleç Şêrko, Kêşey Kurd, r. 47

-El-Dr. Bleç Şêrko, El-Qeziye'l-Kurdîyye (Mazîyu'l-Kurd we Hazirûhum), Qahîre, 1930, r. 42

(21)b. 'Elaeddîn Secadî, ber. navg., r. 45

-Baba Merdûxê Rûhanî (Şîwa), Tarîxê Meşahirê Kord, c. 3, Tehran, 1371/1992, r. 524

(22)Dr. Bleç Şêrko, Kêşey Kurd, r. 50

-El-Dr. Bleç Şêrko, El-Qeziye'l-Kurdîyye, r. 44

-Mihemed Emîn Zekî, Kurd û Kurdistan, c. 1, r. 227

-'Elaeddîn Secadî, ber. navg., r. 45

Chris Kutschera dinivîsîne ku Bedirxan Beg di navbera salên 1844-1846-ê de pere dane çêkirin, lê diyar e ku evyek şaş e (Chris Kutschera, Le Mouvement national kurde, Ed. Flammarion, Bedirxan Beg, 1979, r. 15).

(23)'Elaeddîn Secadî, ber. navg., r. 45

(24)Emir Bedirhan, r. 12

(25)Yê ji Martin van Bruinessen neql kirî û nivîsandî: Kemal Burkay, r. 354

(26)Yê ku neql dike: Chris Kutschera, ber. navg., r. 13-14

(27)Celilê Celîl, XIX. Yüzyıl Osmanlı İmparatorluğu'nda Kürtler, r. 133

(28)Yê ku neql dike: Martin van Bruinessen, ber. navg., r. 221

-Chris Kutschera, ber. navg., r. 15

(29)Celilê Celîl, XIX. Yüzyıl Osmanlı İmparatorluğu'nda Kürtler, r. 134

- (30) Celîlê Celîl, XIX. Yüzyıl Osmanlı İmparatorluğu'nda Kürtler, r. 132
- (31) Sosyalizm ve Toplumsal Mücadeleler Ansiklopedisi, c. 6, r. 1900
- (32) Feldmareşal H. von Moltke, Türkiye Mektupları, Yê ji İngilîzî wergerandiye tirkî: Hayrullah Örs, Remzi Kitabevi, İstanbul, 1969, r. 180-181
- Di wergera tirkî ya pirtûka Bruinessen de beşek înformasyona ku li ser devê Moltke hatiye dan şaş e, bi gumana mezin di wergerê de şaşî hatiyekirin (b. Martin van Bruinessen, ber. navg., r. 428, paragrafa dawî ya jêrnota 140).
- (33) Nazmi Sevgen, ber. navg., r. 72
- (34) Emir Bedirhan, r. 15
- (35) Mihemed Heme Baqî ji Rojnâme Gel (El-Şe'b) (no: 1, r. 11) îddiayeka balkêş a bi wî hawî neql dîke: "*Mîr Bedirxan kurri 'Ebdulxaliq Beg e w sali 1802 z[ayini] le dayik bûwe. Em bûwe ke peywendî be İbrahim Paşay kurri Mihemed 'Elî Paşay Gewrey Mîr-ewe kirdûwe, bo hawkarî w cengan û diji 'usmanî le diway têşikanî şorişekêy û le encamî xiyaretî Yezdanşêr û hendêk serok'eşîretî tir da...*"
- Dîsa Mihemed Heme Baqî her li gor wê serkaniye dinivîsê ku Bedirxan Beg sirgûnî Varnaya li Bulgarîstanê bûye, lê evyek şaş e. Bedirxan sirgûnî Varnayê nebûye, sirgûnî Girîdê bûye (b. Dr. Bleç Şêrko, Kêşey Kurd, r. 52).
- (36) Emir Bedirhan, r. 15
- (37) Yê ku neql dîke: Celîlê Celîl, XIX. Yüzyıl Osmanlı İmparatorluğu'nda Kürtler, r. 127
- (38) Celîlê Celîl, XIX. Yüzyıl Osmanlı İmparatorluğu'nda Kürtler, r. 127
- (39) Chris Kutschera, ber. navg., r. 13
- (40) Halfin, 19. yy'da Kürdistan Üzerinde Mücadele, Komal Yayınları, Ankara, 1976, r. 62-63
- (41) Mihemed Emîn Zekî, Kurd û Kurdistan, c. 1, r. 227
- (42) Chris Kutschera, ber. navg., r. 16
- (43) İbrahim Alaâettin Gövsa, ber. navg., r. 67-68
- (44) İbrahim Alaâettin Gövsa, ber. navg., r. 67-68
- (45) Dr. Bleç Şêrko, Kêşey Kurd, r. 47
- El-Dr. Bleç Şêrko, El-Qeziye'l-Kurdiyye, r. 41
- (46) Dr. Bleç Şêrko, Kêşey Kurd, r. 47
- El-Dr. Bleç Şêrko, El-Qeziye'l-Kurdiyye, r. 41
- (47) Celîlê Celîl, XIX. Yüzyıl Osmanlı İmparatorluğu'nda Kürtler, r. 128
- (48) Celîlê Celîl, XIX. Yüzyıl Osmanlı İmparatorluğu'nda Kürtler, r. 129
- (49) İbrahim Alaâettin Gövsa, ber. navg., r. 67-68
- (50) Lê li gor hin serkaniyan, hejmara eskerên ordiya osmanî ya ku êriş bir ser Bedirxanî, ji 25 000'an zêdetir bû (Celîlê Celîl, XIX. Yüzyıl Osmanlı İmparatorluğu'nda Kürtler, r. 148).
- (51) Süleyman Nazif, "Nasturiler", Son Telgraf, İstanbul, 23 Rabiülevvel 1343/22 Teşrinievvel 1340 [1924], r. 2
- (52) Celîlê Celîl, XIX. Yüzyıl Osmanlı İmparatorluğu'nda Kürtler, r. 148
- (53) "Bedirhan Bey", Kurdistan (pazde roja de carekî têt nivîsandin cerîdeya Kurdî ye), Cenevre, no: 14 (7 Nisan 1315 [1899]); çapa nû: Kurdistan (rojname Kurdî ya pêşîn/ilk Kürd gazetesi 1898-1902), c. 1, Yê ji herfên 'erebî wergerandiye ser herfên latînî: M. Emin Bozarslan, Deng Yayınevi, Uppsala, 1991, r. 289
- "Bedirhan Bey", Kurdistan (pazde roja de carekî têt nivîsandin cerîdeya Kurdî ye), Cenevre, no: 13, r. 266

- (54)Halfin, ber. navg., r. 65
- (55)Celîlê Celîl, XIX. Yüzyıl Osmanlı İmparatorluğu'nda Kürtler, r. 145-146
-M. Alexandre Jaba, Recueil de Notice et Récits Kourdes, St. Petersbourg, 1860, r. IX-X
- (56)İbrahim Alaâettin Gövsa, navê vê kelehê bi awayê "Orak" û "Oruh" nivîsandiye, ku her du jî şaş in (İbrahim Alaâettin Gövsa, ber. navg., r. 67-68).
- (57)İbrahim Alaâettin Gövsa, ber. navg., r. 67-68
- (58)Dr. Bleç Şêrko, Kêşey Kurd, r. 51
- (59)Celîlê Celîl, XIX. Yüzyıl Osmanlı İmparatorluğu'nda Kürtler, r. 137, 147
- (60)Salih Bedirhan, Muzekkeratî, Ya wergerandiye'erebî: Rewşen Bedirhan, Yê weşandiye: Dilawer Zengî, Şam, 1991, r. 44
- Min sûd ji nivîsên bi navê "Mehmet Salih Bedirhan'ın Anıları" girt ku di 27-ê Çiriya paşîn - 4-ê Çileyê pêşîn 1992-ê de di rojnameya Özgür Gündemê de bi tirkî hatibûn weşandin û ji aliyê Rewşen Bedirhan û Mehmet Uzun ve hatibûn amadekirin.
- (61)Yê ku ji Sir Austin Henry Layard, Discoveries in the ruins of Niniveh, 1853, r. 54 neql dike: Chris Kutschera, ber. navg., r. 14
- (62)İbrahim Alaâettin Gövsa, ber. navg., r. 67-68
- (63)Celîlê Celîl, XIX. Yüzyıl Osmanlı İmparatorluğu'nda Kürtler, r. 148
- (64)Celîlê Celîl, XIX. Yüzyıl Osmanlı İmparatorluğu'nda Kürtler, r. 147
- (65)Nazmi Sevgen, ber. navg., r. 103
- (66)Celîlê Celîl, XIX, Yüzyıl Osmanlı İmparatorluğu'nda Kürtler, r. 150
- (67)Yê ku li gor belgeyên ku Nazmi Sevgen di B. T. T. D. 11-19 (1969/9)-ê de weşandine dinivîsîne: Martin van Bruinessen, ber. navg., r. 429, jêrenot 146
- (68)Tevî ku Nazmi Sevgen dinivîsîne ku 20 Cemazîyelewwel 1263 a hicrî dibe sala 1846 a miladî, rastiya wê 1847 e (b. Nazmi Sevgen, Doğu ve Güneydoğu Anadolu'da Türk Beylikleri, r. 106).
- (69)Yê ku neql dike: Nazmi Sevgen, Doğu ve Güneydoğu Anadolu'da Türk Beylikleri, r. 106-110
- (70)İbrahim Alaâettin Gövsa, ber. navg., r. 67-68
- (71)Rêza çaran a vê çarînê, tevî ku di pirtûka Emir Bedirhan de bi awayê "*Pes ferq der meyanê men o to ç'ist bego*" be jî diyar e ku "der" a di vê rêzê de zêde ye. Ji xwe di nivîsa Süleyman Nazif de ev rêz weha ye: "*Pes ferqê meyanê men o to ç'ist bego*". (b. Emir Bedirhan, r. 26 ve Süleyman Nazif, ber. navg., r. 2)
- (72)Li gor hin serkaniyan, "wek îhsan û muqabilî milkê wî yê ku li welatê xwe hiştiye, wek meaşê 'yurtluk'ê 200 zêr" didin Bedir Begî (b. İbrahim Alaâettin Gövsa, ber. navg., r. 67-68).
- (73)Emir Bedirhan, r. 27

Çîroka evîna dinyê û hîvê

S. Demir

Ji rojan rojeke payîzê bû. Ezman çik sayî bû. Stêrikan çav didan hevdu. Orîon, Ara, Arîes, Lyra, Vega, Cassiopeia, Corona û Capella hemû hebûn. Perseus li Andromeda dinerî. Hînan jî wek Gamma Arîetîs hevdu girtibûn û li dora hevdu dans dikirin. Bala hîvê li dinyê bû, ew bi dinyê re dikeniya û geş bûbû. Dora xwe bi xelekeke hewş pêçabû û mabû. Biryardar bû. Êdî çaxê eşkerekirina dilketina salan hatibû. Xwe ji gotina mezin re kar dikir. Êdî ew roj hatibû. Êvareke wilo gazî kiribû dinyê:

"Ho cîranê, xatûna bi tenê... ma ka ro? Ma ka çû ku? Ro, ku wilo li ber dilê te ezîz bû, ma gelo tu hişt û çû".

Dinyê;

"Na... royê ez nehiştme û neçûye tu deran... ew tu tiştêkî wilo nake... ew hew çûye germiyanan. Wê serê biharê, bi baran germê, jînê û gulên sor ji min re bîne û dîsa bê ba min. Her sal vî çaxê diçe, lê serê biharan li min vedigere," gotibû.

"Lê ma ka xemila te... ka ew geşiya te... ka ew kenê te... ma tu çima wilo xemgîn î?"

"Rast e, ma ez ê xwe ji kê re bixemilînim, bi kê re bikenim... ro ne li mal e... hewa sar e... heta ro bê, ez ê xwe dîsa bixemilînim".

"Ax cîranê... heger tu min bikî, ez ê ji ba te neçim tu deveran... ez ê her li ba te bim".

"Na... nabe... ro gelekî ji min hez dike. Germê, jînê, xemilê, gulan, kenê dilan û gelek tiştên din dide min. Ma tu dikarî çi bidî min".

"Ez?.. ez dikarim hevaltîyeke heta bi heta, kenê ji dil, dilgeşiya êvarên hênîk û seyrana nav stêrikan bidim te... û heta ez û tu em hebin, ez ê li dora te

helperkê bikim, rîtualala evîna xwe, ji gerdûnê re diyar bikim, bi te serbilind û dilgeş bibim...”

”Na, ew têra min nakin. Û ji xwe navê te jî, wek navê xatûnan e... û tu germ ji te nade min... ma gelo tu wilo dibêjî û dixwazî min bixapînê... gelo tu dixwazî royê ji min bistîn?”

”Na gidî... hevduxapandin karê dilkevîran e... ê însên, gur û roviyan e... ez bi xwe ji te hez dikim... ez bi rastî pir ji te hez dikim... û navê min, hingî ku ez spehî me, ji min re wilo tê gotin; wek navê roya te ye. Navê wê jî ne navê tu xort û egîtan e. De ka were min bike...”

”Na... nabe, ez ê li bendî royê bim. Wê serê biharê bê. Wê ji min re germê û gulan bîne û seranserê rojan bi min re bikene. Ma ne tu nizanî bê heta tê, ez çi bêriya wê dikim! Ez ê li bendî wê bim”

”Ax, lê xatûnê, hinark gulê, lêv beybûnê... ma tu çima rojekê hêviyê nadî min... hew ez bi tenê dizanim bê tu çiqasî spehî yî û ji ber wê yekê ez serê van qase salan, ji wexta ku ez û tu em hene ez dildarê te me, miriyê te me. Lê xelk tolaz in, qet dor nayê min. Ma kî xwe di ber min ranake û te naxwaze! Binere Orîon, Pollux, Castor, Draco, Hercules, herdu Leo, her heft lawên Hîrçê û hîn gelekên din... ew jî hemû evîndarên te ne, her li te dinerin... lê bawer bike, ez ê qet dev ji te bernedim, te ji bîra nekim. Tu seranserê şevan dîsa a min î... ez ê pazdeh şevên mehê li te binerim û bikenim, pezdehên din jî herim xwe veşêrim û ji bo te bigirîm û dîsa binerim. Ez dikim û nakim tu nayê ji bîrakirin.”

”Kuro dîno, here bi rêya xwe de, dev ji min berde, ez bi mêr im.”

”Na... tu bi çi bî ez ê li bendî te bim... belkî... belkî rojekê ji rojan dor bê min.”

Wilo ji hev re gotin. Hîvê serê xwe berda ber xwe û ramiya.

Tavilê, ji her çavekî hêsirek herikî, hêdî hêdî çilmisî û wilo bi hêdî jî çû. Tu kes bi esehî nizane bê çend milyar û milyon sal ji wî çaxî ve çûne, lê ew her wek ku got dike. Ro li mal be ne li mal be ew her wilo dike. Gava dora pazdehên hatina wê û nerîna wê tê, dikene û geş dibe. Bi dû re diçilmise û diçe cîhekî din, li wir digirî. Ew hîna jî bi hisreta wê dişewite û dimîne.

Not: Navên biyanî hemû navên stêrikan ên bi latînî ne.

Şert

A. Çehov

Ji şevên payîzê yeke tarî bû. Bankerê kal di odeya xwe de diçû û dihat; li vexwendineke ku panzdeh sal berê bi darxistibû, difikirî. Li wê vexwendinê gelek kesên intelegent civiyabûn û herweha babetên balkêş hatibûn minaqeşekirin. Yek ji wan babetan cezayê mirinê bû. Piraniya mêvanan - gelek ji wan alim û rojnamevan bûn- li dij cezayê mirinê helwesta xwe diyar kiribû. Wan hizir dikir ku ev cûre şeweya cezayê êdî dema xwe bihurandiye, neexlaqî ye û ne misaîdê dewletên îsewî ye. Hinan ji wan digot ku divê cezayê mirinê bê rakirin û li şûna wî, cezayê miebed bête danîn.

Mazûbên:

- Ez ne bi dîtina we re me. Min ne cezayê mirinê ne jî yê miebedhefskirinê ne ceribandîye; lê eger mirov çî be jî dê ceza bide, ez cezayê mirinê jî cezayê miebedgirtinê mirovane û bi exlaqtir dibînim. Îdam, mirovê girtî bi carekê dîkuje, lê di girtîgehê de mayîn hêdî hêdî dîkuje. Ji wan celadan kîjan bêtir mirovane ye? Yê ku we di çend deqîqeyan de dîkuje, an yê ku bi salan jiyane jî we dimije?

- Herdu cûre ceza jî mîna hev neexlaqî ne; ji wan mêvanan yekê got, ji lewre armanca wan yek e: Girtî jî jiyane mehrûm hiştine. Dewlet ne Xwedê ye. Heqê wê nîne ku tişteki bistîne, ku ew nikaribe careke din lê vegeîne, eger ew bixwaze.

Di nav mêvanan de huqûqzanekî xort, bîst û pênc salî hebû. Gava ku dîtina wî pirs kirin, wî got:

- Cezayê mirinê û cezayê miebedê, herdu jî mîna hev cezayên neexlaqî ne; lê eger ez ji wan yekê hilbijêrim, bêşik ez dê ya duwemîn hilbijêrim. Çawa be jî mirov dê bijî; jiyaneke çawa be jî, ji mirinê çêtir e.

Minaqeşeyeke germ dest pê kir. Banker, yê ku wê gavê xortir û bi heyecantir bû, bi awayekî ji xwe çûyî kulmika xwe li maseyê xist û berê xwe da

huqûqzanê xort:

- Tiştê ku tu dibêjî ne rast e! Ez bi du milyonan şert digirim ku tu nikarî pênc salan jî li zindanê bimînî.

- Eger tu ji dil dibêjî, ne tenê pênc ez dikarim panzdeh salan li zindanê bimînim, huqûqzên got,

Bankêr bi qêrîn:

- Panzdeh sal! Pir baş e! Gelî mêvanan, ez du milyonan datînim!

Huqûqzên di bersiva wî de:

- Min qebûl e! Tu du milyonan ez jî ji azadiya xwe datînim,

Ew şertê xav û bêmane bi wî awayî hate girtin! Bankêr, yê ku wê gavê nedizanî ka çend milyonên wî hene, bi şêweyeke qure û bêhizir, ji şertgirtinê gelekî kêfxweş mabû. Dema şivê wî bi huqûqzên henek kir û got:

- Xortê ciwan, berî ku dereng be baş bifikire. Du milyon ji bo min ne tiştê in; lê tu ji jiyana xwe sê an çar salên herî hêja didî bin piyên xwe. Ez bi zanebûn sê an çar dibêjim ji ber ku tu dê zêdetir nemînî. Û ji bîr meke, bextreşo, bi dilê xwe li zindanê raketin ji mecbûriyetê diwartir e. Fikira ku tu di her deqîqeyê de dikarî poşman bibî û vegeerî azadiyê dê hemû jiyane li te biherimîne. Bi rastî gunehê min bi te tê!

Gava bankêr di odeyê de diçû û dihat ev tişt hemî dihatin bîra wî; û ji xwe pirsî:

- Bi rastî ma ew şert bi kêrî çî hat? Ma çî başiya wî hebû ku huqûqzên panzdeh sal ji jiyana xwe li ber bê berdida û ez du milyonan wînda bikim? Ma ev tişt dikare nîşan bide ku cezayê mirinê ji yê miebedê xerabtir an baştir e? Na, bêşik na. Ev tişt bi tenê bêmane û dînîti ye. Ji alî min bi tenê meraqek bû ku ji mirovekî bi xwe bawer û ziktêr derçû; ji hêla wî jî bêşik quretî bû...

Û li ser tiştên ku di wê êvarê de qewimî bûn, fikirî. Wan li hev kir ku diviyabû huqûqzên li hewşa bankêr li cihekî girtî û li bin çavan cezayê xwe bibuhuranda. Diviyabû ku huqûqzan panzdeh salan li wê derê bimaya, bêî ku ji wê bi derketa an kesekî bidîta, dengên insanan bibihîsta, rojname û name jê re bihatana. Lê heqê huqûqzên hebû ku aletên muzîkê jê re bèn, pirtûkan bixwîne, nameyan binivîse, şerabê vexwe û çixareyê bikişîne. Li gorî peymanan wan têkiliyên wî bi dunyaya derve re tenê bi rêya pencereyeke piçûk e caxkirî re bû; ku wî bikariba jê li derve mêze bikira; ku ji bo vê mebestê hatibû danîn. Herçî tiştên ku pêwistiya wî pê hebû tenê bi nivîskî û çiqas bixwestana dikarî pirtûk, şerab û hwd bi rêya pencereyê bi destxista. Di peymanê de hemî tişt bi detay hatibûn îzah kirin ku heya mimkin be bi her awayî huqûqzên bi tenê û îzole bihêle; huqûqzên ji 12ê meha teşrînê sala 1870î ji saet 12an dest bi jiyana zindanê bike, heya sala 1885an 14ê teşrînê saet 12an. Hewldaneke piçûk li

dijî peymanê ku bi du deqîqeyan be jî beriya wextê li peymanê dîyarkirî ji alî huqûqzên rû bide; wê gavê bankêr ji dayîna du milyonan rizgar dibe.

Tiştên ku ji nameyên huqûqzên yê kurt fêhm dibûn, li sala yekemîn ya ji razana xwe li zindanê, ji tenêbûn û jiyanek monoton aciz dibû. Ji cihê razana wî şev û roj dengê pîanoyê bilind dibû. Şerab û çixare nedixwest. Wî dinivisand; şerab, xwestinê divejîne û xwestin dijminê herî dijwar e. Herwisa ji vexwarina şerabeke tehmxweş, bêh dost û hevalan tişteki nexwestir nîne. Û çixare hewayaya odeyê bi temamî xerab dike. Sala pêşîn, mirov dikare bêje ku kitêbên sivik jê re hatin şandin: romanên bi erotîzmeke têvel xemilandî, novelên bijarte û behsekrîmînal, komedî û hwd.

Di mideta sala duduyan de dengê muzîkê hate birîn, yê girtî di nameyên xwe de tenê kitêbên klasîk dixwestin. Sala pêncemîn careke din dengê muzîkê ji cihê girtî hate bihîstin û girtî şerab dixwest. Yê ku çavdêriya wî dikir, digot ku wê salê wî tenê xwar, vexwar û li ser textê razanê dirêj ket, bawîşk hatin wî û tûrebûyî xwe bi xwe dipeyîvî. Kitêb nexwendin. Carina derengê şevê rûdinişt û mideteke dirêj tiştin dinivîsîn û berbanga sibeyê hemî hûr hûr diqetandin. Carina dihate bihîstin ku digirî.

Dema nivê duwemîn yê şeş saliya razana xwe, girtî bi awayekî jîndar dest bi xwendina zimên, felsefê û tarîxê kir. Welê ji dil û can dest bi xebata ilmî kiribû ku hema bêje bankêr pê re nedigihast jê re kitêban peyda bike. Di midetê çar salan de li ser daxwaza yê girtî 600 cild jê re hatin şandin. Di vê periyodê de, bankêr ji girtiyê xwe di gel hin din nameya jêrîn jî wergirt:

Nobedarê min yê hêja!

Ez van rêzan bi şeş zimanan dinivîsim. Nameyan nîşanê kesên têgihîştî û jîr bide û ji wan rica bike da ku bixwînin. Eger ew çu xeletiyekê nebînin, ricaya min ji te ew e ku tu li hevşa xwe derbek tîfîngê berde. Ew derb dê ji min re bêje ku xebata min ne belesebe ye. Zanayên hemî deman û welatan bi zimanên cida dipeyîvin lê lempeya dilê wan hemiyan yek e. Ax, eger te zanibaya ruhê min çiqas bextiyar e, ji ber ku ez wan fêhm dikim!

Daxwaza girtî hate cih. Bankêr emir da; ku li hewşê du derb bêne berdan.

Piştî deh salan yê girtî li ber maseya xwe rûniştî bêh ku xwe bilivîne tenê Încîla pîroz xwend. Bankêr gelekî ecêb ma; mirovekî ku di midetê çar salan de 600 cild xwendibû, çend salên xwe yê dawiyê bi kitêbeke hêsan û ne mezin re bihurand. Piştî Încîlê dor hate ser dîroka dîn û teolojiyê.

Di mideta du salên dawî de yê girtî bêh lêfikirîne pir xwend. Geh bi ilmên fenî mijûl dibû geh *Byron an jî Schiller* dixwest. Carinan daxwaza çend tiştan bi hev re dikir; ji pirtûkên fêrbûnê yê kîmya, derman, romanek û behsenivîsek feylesofî û teolojî dikir. Xwendina wî dişibiya ku ew li deryayê di nav enqazê keştiyekê de avjenî dike û ji bo xwe xelas bike geh bi vî geh bi wî parçeyê digire.

Ev tişt hemî hatin bîra Bankerê kal û fikirî: "Sibeyê di saet diwanzdehan de ew azad dibe. Li gorî peymanê divê ez du milyonan bidim wî. Egerez wan du milyonan bidim wî, dawiya min tê, miflis dimînim..."

Panzdeh sal berê nedizani ka çend milyonên wî hene, lê nuha cesaret nedikir ku ji xwe bipirse ka pere an deynên wî zêdetir bûn. Li borsayê, carekê bi lezûbez cesaretê spekulasyonê kiribû ku di van salên xwe yê dawiyê de jî, hîn ji tesîra wê carê xelas nebû bû; ew mirovê bi xwe bawer û sermayedarê pozbilind û bi difrûpaye cihê xwe, ji yekî quruş hesabkar re hîştibû ku her carê bi ketin û rabûna borsayê re diricifî.

- Şertgirtina bi lanet! kalo got; û serê xwe xiste nav destên xwe, çima yê girtî nemiriye? Ew nuha çil salî ye. Ew dê quruşê dawiyê jî, ji min bistîne, dê bizewice, li borsayê bilîze, kêf û zewqê ji jiyane bigire; û ez dê bi dilbijokî wek parsekekî her roj li wî mêze bikim û bibihîzim: "Ji bo vê jiyana xweş û bextiyariya xwe ez spasdarê te me; izna min bide ez alîkariya te jî bikim." Na, ne mimkin e... Xelasiya min, ji îflasê û ji eyb û fedî, mirina girtî ye!

Zengilê saetê diyar dikir ku saet sisê ye. Bankêr guhdarî kir: kesên li malê hemî raketibûn, tenê dengê xwişîna darên qeşagirtî ji derve dihat. Wî di rewşeke welê de hewl dida ku heya mimkin be bêdeng bilive; ji kasaya pola mifta deriyê ku panzdeh sal venebû bû hilda, paltoyê xwe li xwe kir û çû derve.

Hewş di nav tarî û sermayê de bû. Baran û bayekî hişk ku çu rehetî ji darên hewşê re nedihîşt, dihat. Bankêr hewl dida ku ber xwe bibîne, lê ne erd didît, ne heykelên spî, ne cihê girtî ne jî dar didîtin. Gava ew hat cihê ku girtî lê bû du caran li ser hev bangî nobedar kir, lê kesî bersiv neda. Îhtîmala mezin ji ber ba û baranê nobedêr xwe li metbexê an cihekî din girtibû û nuha li wir razayîbû.

Bankêr weha fikirî:

- Eger min têra xwe cesaret hebe ku ez bigehîjim armanca xwe; ew dê pêşîn ji nobedêr şik bikin.

Di nav tariyê de bi destpelkê bi derenceyê ve hilkişiya, giha derî û ket hundirê çardaxê, paşê bi pelandina destan pêş ve ber bi korîdoreke piçûk çû û kibrîtek pêxist. Li wê derê textekî vala yê razanê hebû û li koşeyê din ya korîdorê jî sobeyek diçirîsî. Mora li ser deriyê girtî yekparçe bû.

Gava kibrît tefiya yê kal bi ruhekî ricifkar di pencereya piçûk re li hundir mêze kir.

Li odeya girtî, findeke bêtaqet pêketîbû. Girtî li ber maseyê rûniştîbû. Bi tenê pişt wî, por û destên wî xuya dikir. Li ser maseyê, koltuxan û xaliya li dor maseyê kitêbên ji hev vekirî hebûn.

Pênc deqîqe bihurîn lê hîn jî yê girtî xwe nedilivand. Bankerî bi tiliya xwe li pencerê da, lê girtî xwe tev nedida. Wê gavê bankêr bi semt (diqet) mor ji

ser derî rakir û kilît xiste cih. Ji qula kilîta zingargirtî dengekî xetimî rabû û bû zîqîniya derî. Banker li hêviya deng û qêrîneke ecêbmayî bû; lê sê deqîqe bihurîn hîn jî bêdengî hakimê odayê bû. Wî biryara xwe da, ku bikeve odayê.

Li kêleka maseyê mirovekî bê hereket rûniştibû ku ji temamê mirovên din cidatir bû. Skeletek bi çerm pêçayî, biskên bi xelek yên keçanî û rihek bi girêk; ruyê zer bi siyên kesk, hinarikên daketî, piştta dirêj û zeîf; û destê ku alîkariya seriyê bi por dikir, lawaz û zirav, rewşeke welê ku bi mêzekirinê mirov gelekî diêşiya. Di nav porê wî de tayên zîvî dibiriqîn, bi dîtina wî ruyê zeîf, dê kesî bawer nekira ku ew bi tenê çil salî bû. Di xew de bû. Li ber yê raketî li ser maseyê desteyek kaxez li ser hev bû ku bi stîleke zirav, wî, tiştin lê nivisibûn.

”Rebenê Xwedê!” fikirî bankêr. ”Raketî û ihtîmala mezin xewna milyonên xwe dibîne. Lê pêwistiya min tenê bi rakirina vî mexlûqê nîvmirî û avêtina ser textê razanê û bi rehetî bi balîfekê bi fetisînim ku muayeneya herî bi insaf nikare rêça mirinê bi kotekî têde bibîne. Lê berî her tiştî em dê bixwînin ka wî çi nivisiye!”

Bankêr kaxiz ji ser maseyê rakirin û tiştên jêrîn xwendin:

Sibeyê di saet 12an de ez cardin digihêma azadiya xwe ku bi insanen re bigerim. Lê berî ku ez terka vê odayê bikim û rojê bibînim, pêwist dibînim ku çend gotinan ji we re bêjim. Bi wijdanekî rehet û li pêş Xwedê ku min dibîne, eşkere dikim ku ez azadiyê, jiyane, saxî û selametiye û hemî tiştên ku kitêbên we bi xweşiyên dunyayê bi nav dikin, piçûk dibînim.

Min, panzdeh sal, jiyana vê dunyayê xwend. Diyar e ku min dunya û insan gelekî nedîne lê di kitêbên we de min şeraba bi lezet vexwar; stran gotin, li daristanan nêçîra pezkovî û berazên kovî kir, û ji jinan hez kir. Jinên spehî, sivik mîna ewr, ji alî şaîrên we yên sihrî û pir bi aqil afirandî, bi şev hatin seredana min û di guhên min de çîrokên şahane gotin ku bi wan mejiyê min mest bû. Di pirtûkên we de ez ber bi topikên *Elburus û Montblancsê* hilkişiyam û ji wê derê min dît, ka roj serê sibehan çawa dertê û êvaran çawa asîman, okyanûs û bilindahiyên bi zêr û pûrpûr dineqîşîne. Min jihevbelavbûna ewr û lêdana birûskan dît; daristanên kesk, zevî, çem, gol, bajar dît; min stranên horiyên deryayê, qaîdeyên bilûrên şivanan bihîstin; ez di ber baskên şeytanên xweşik re çerixîm, ku di derheqê Xwedê de bipeyivîn hatibûn cem min... Di kitêbên we de ez ketim kûrahiyên bêbinî, min mucîze afirandin; bûm qatîl, bajar şewitandin, wazên dînen nuh dan; min welat dagir kirin...

Kitêbên we zanîn li min bexişandin. Her tiştê ku fikira insanên newestiyayî di mideta sed salan de afirandiye, li ser hev hatiye eciqandin û di mejiyê min de, di qahfê serê min de, bi cih bûye. Ez dizanim, ez, ji we hemiyên bi aqiltir im.

Û ez kitêbên we piçûk dibînim; hemî xweşiyên dunyayê piçûk dibînim; ne

hêjayê pûteyekî ne; bênirx, sefaf û bi hîle mîna leylandê ne. Çi maneya wî heye ku em serbilind, bi aqil û xweşik in; mirin me hemiyana mîna mişkên kadînan ji dunyayê paqij dike û cîlên pişt me, tarîx, nemirina aqilmendên mezin hertişt bi hev re dê di eynî wextê de bi dunyayê re bicemide an bişewite.

We fêhmê xwe wînda kiriye û hûn ne li ser rêya rast in. Hûn derewan di cihê rastiyê de û zîştbûnê di cihê spehîbûnê de bi kar tînin. Hûn dê ecêb bimînin eger li ser darên sêv û porteqalan beq û marmarok çêbibin, an jî gul mîna nêriyên ilorî bihin bidin; her bi vî awayî ez li we ecêb dimînim ku we asîman bi erdê re guhertiye. Ez, naxwazim we fêm bikim.

Ji bo ku bi fiiliyatê nîşan bidim ku awayê jiyana we piçûk dibînim, ez xwe ji wan du milyonan, demekê mîna ku min bihuşt xeyal dikir û nuha piçûk dibînim, bêpar dihêlim. Ji bo ku wî heqî wînda bikim ez dê pênc saet berê wextê peymanê ji vir herim û peymanê xerab bikim...

Gava bankêr ev tişt xwendin, eniya wî mirovê ecêb, ramûsa; kelegirî ji odeyê derket. Tucar, carên ku li borsayê gelekî xesirîbû jî, wek nuha ewqas xwe piçûk nedîtibû. Gava hat malê, dirêj ket lê rondik û halet-î ruhiya wî nehîşt ku rakeve...

Roja dinê serê sibeyê nobedar bi bazdanê rûxwînmiçikî ketin hundir û gotin ku wan dît çawa yê girtî -ku di odeya girtî de bû- di pencereyê re bi çarlepki derket, di hewşê re çû û di deriyê wê re derket... Bankêr bi nobedaran re çû cihê girtî û bûyer kifş kir. Ji bo xeberdana zêde çênebe kaxezên xatirxwestinê yên li ser maseyê hildan; gava hat malê ew xistin kasaya xwe ya ji pola.

Wergera ji swêdî:
Serdar Roşan

Rûpelek ji weşangeriya kurdî ya li Swêdê

Kitêb di her kulturî de xwediyê girîngiyê mezîne e. Hele ji bo me kurdan ku di vî warî de ne xwediyê tarîxeke dîrûdirêj in, rola kitêban hîn bi rûmet e. Ji ber vê yekê jî gavên ku di vî warî de hatine û tên avêtin hêjayî pesindayîne ne û yek ji wasitayên girîng ên têkiliyên navbera nesîlan in.

Weşangeriya kurdî ya Swêdê di vî warî de mîsaleke giranbuha ye. Weşangerî perçeyê girîng a karûbarê kulturî yê kurdên li Swêdê ye û bi babetên din tev ji aliyê hîn kesan wekî "ekol" an jî "epok" hatiye û tê binavkirin. Di vir de naxwazim li ser van nêrînan bisekinim, lê tiştêkî li ber çavan e ku weşangerî jî tê de karûbarê kulturî yê kurdan ku li Swêdê hatiye çêkirin, dê bi awayên cuda cuda her dem di kultura kurdî de xwediyê giraniyê berbiçav be.

Bi vê baweriyê fikira danasîna weşanxaneyên kurdî çêbû û min hema hema tevayîya van hevpeyvînan ji bo rojnameya Rojê (Nûroj, Pêşeroj) ku li Istenbolê der diçû çêkirin. Lê pir mixabin berî ku hemû hevpeyvînan temam bibin û ji bo çapê amade bibin, rojnameya Pêşerojê ku li ser bîngeha Roj û Nûrojê hatibû avakirin jî jiyana xwe ya weşanî bi dawî anî.

Di pey vê, fikira di Çirayê de weşandina van hevpeyvînan hat rojevê. Ji xwediyên hevpeyvînan destûr hate wergirtin û hevpeyvînan wan di vî hejmara Çirayê de li gorî tarîxa avabûna weşanxaneyan tên weşandin. Hevpeyvîna di gel Weşanxaneya Rewşen û listeya kitêbên wê ji ber hîn sebebên teknîkî negihîşt vî hejmarê. Di hejmara bê de vî hevpeyvîna û hîn hevpeyvînan din (wekî yê weşanxaneyên Kitab-î Erzan û Medya) ên ku em li benda wan in em dê çap bikin.

Hin weşanxaneyan (Deng û Komeleyî Ferhengî Swêd-Kurdistan) pêwîstî bi hevpeyvînekê nedîtin, xwestin ku tenê listeyên wan ên kitêban bînin weşandin. Weşanxaneyên Publishing House of Kurdistan û Berhem jî nema jiyana xwe ya weşangerî dom dikirin. Lê cardin jî weşanên wan di nav listeyên kitêban de hene. Kitêbên weşanxaneyên wekî Hêlîn, Newroz û Nefel jî di nav listeyên kitêban de cih digrin.

Hin hevpeyvîn rûbirû hatine kirin û ew bi pirs û bersivan tên weşandin. Hevpeyvînen mayî jî li gor van 8 pirsên jêrîn tên weşandin û tenê hejmarên pirsan di metnên hevpeyvînan de cih digrin:

1. Problemên çapkirinê çi bûn û çi ne?
2. Problemên belavkirinê çi bûn û çi ne?
3. Rewşa firotinê çawa bû û çawa ye?
4. Reaksiyonên xwendevanan çi bûn û çi ne? Çi positif û çi negatîf.
5. Ji aliyê kalîteya çapê û naveroka kitêban dîtina we çi ye? Ger kêmasî yan jî çewtî hebin, li gor we sebebên van çi ne?
6. Hûn di karê weşandinê de tûşî (marûzî) zehmetiyên ku ji kapasîteya zimanê kurdî dihatin, bûn an ne?
7. Projeyên we yên pêşerojê çi ne? Çi ji aliyê kitêbên ku li ber çapê ne, çi jî ji aliyê bi tevayî başkirina karûbarê weşanxaneyê.
8. Hûn di derbarê danûstendinên di navbera weşanxaneyên kurdî de çi difikirin? Pirs û pirsgerêk çi ne û ev dikarin çawa bên çareserkirin?

Kitêbên kurdî ku li Swêdê hatine weşandin bêşik ne tenê ev in. Hin nivîskarên li ser navê xwe kitêb weşandine û hejmara kitêbên weha jî bi sedan e. Herweha hin komel, komîte û rojname yan kovaran jî hin çaran beyî ku weşanxaneyekê ava bikin kitêb weşandine. Kitêbên kurdî yên ku ji aliyê hin dezgehên swêdî yên ku bi karûbarê perwerdeyê elaqeder dibin hatine weşandin jî hene. Wexta listeyên van kitêban amade bibin, em dê wan jî di Çirayê de çap bikin.

Zimanê hevpeyvînan beyî hin rastkirinên di derbarê hin çewtiyên ku li ser wan zêde munaqeşe tunene, wekî xwe ye; forma tebîî ya hevpeyvînan, ger ji xwediyên hevpeyvînan pêşniyar nehatibin, bi awayekî giştî hatiye parastin.

Ji aliyê agahdariyên di derbarê kitêban de min xwest strûktûrek hebe. Hin weşanxaneyan listeyên bi teferûat şandin, lê ji ber ku di yên hinekên din de agahdarî kêm bûn û min jî dixwest strûktûreke hevbeş hebe, min hin agahdarî ji listeyan derxistin. Lê di gel vê jî, ger mirov strûktûra hevbeş bingeş bigre, hin jî kêmagahdarî di derbarê hin kitêban de hene. Çunkî li gel hemû hewldanan jî hin agahdarî negihîştin destê min. Zimanê kitêban jî li gorî lehçeyên kurdî di listeyan de cih digre.

Osman Aytar

Berpirsiyarê Weşanên Roja Nû, Haluk Öztürk:

”Xwendevanên rastî jî êdî her kitêbeke kurdî nastînin”

Weşanxaneya Roja Nû di sala 1980'yê de ava bûye. Kitêbên ku heta niha çap kirine 42 heb in. Ji berpirsiyarên Weşanxaneya Roja Nû, birêz Haluk Öztürk bersiva pirsên me da.

1. Bêguman di destpêkê da problem hebûn. Ji daktîlokirina nivîsaran bigre heta serrastikirina xeletiyên rêzmanî gelek kêmasiyên me hebûn. Amadekirina kitêban bo çapê karekî ne hêsan bû. Yê ku bi vî karî va mijûl dibûn xwedî tecrube nebûn, di nav xebatê da xwe fêr kirin. Him ji aliyê teknîkî da, him jî ji aliyê ziman da bere bere pêşketin çêbû. Û îro gelek ji wan probleman nemane. Zanî û tecrubeyên me zêde bûne, bi saya komputeran êdî karê lêkirin û mîzampajê jî gelekî hêsan bûye. Helbet ev xebateke ideall e, û bi hewldanê kolektîf dimeşe. Û 17 sal e weşanxaneya me bi vî awayî xizmeta ziman û çanda kurdî dike.

Belê li Swêdê siyaseta dewletê li hember çanda mihaciran heta niha comerd bûye. Wek weşanxane, me ji vî rewşa heyî îstîfade kirîye. Lê mixabin ne bi qasî ku me hêvî dikir. Wexta li Swêdê tenê weşanxana me hebû, hingê kitêbên me ji sazîyên çandî alîkarî werdigirtin. Lê bi wextê ra weşanxaneyên kurdan zêde bûn. Alîkarîya me jî kêmtir bû, heta hat birrîn. Lê sedemê birrîna alîkarîyê ne tenê pîrbûna weşanxaneyan bû. Ji sedî (%) 75 ji kitêbên me alîkarî nestandin. Mesela kitêbên wek ”Dîwana Melayê Cizîrî”, ”Nûbihar” a Ehmedê Xanî û gelekên din, alîkarî negirtin, ji ber ku lektorên kurd yê ku sazîyên çandî derheq kitêban da ji wan pirs dikirin, wan li ser kitêbên me referensên baş nedidan, memûrên swêdî jî nizanibûn ka bi rastî kitêbeke wek Dîwana Melayê Cizîrî çiqas ji bo çanda kurdî giring e... Helbet derxistina kitêban bi mesref e. Lê dîsa jî heta niha me 40 kitêb derxistine û karê me niha jî berdewam e.

2. Eger em behsa belavkirina kitêban li Swêdê û li welatên din bikin, bi rastî problemên wisa mezin derneketine pêş me. Problem herdem kêmbûna xwendevanan bûye. Lê ji alî belavkirinê da em gelekî bi şans in, ji ber ku hema-hema li hemû welatên Awrûpayê, komele û komîteyên KOMKAR'ê, sazîyên bira hene û kitêbên me belav dikin. Weşanên me xwe digihînin heta Misir, Kanada, Amerîka, Rûsya û Avûstralyayê. Lê em bi serbestî û rehetî nikarin bişînin hundirê welêt. Problema belavkirina pirtûkan di nav welêt da berê çî bû û niha çî ye dîyar e. Lê em dikarin bibêjin ku gelek ji kitêbên me niha li Tirkîyê dîsa tên çapkirin. Bi vî awayî xebata me feyda xwe dide xebata hundir jî.

3. Di salên pêşîn da kitêbên me gelekî dihatin firotinê. Ji ber ku bi jimareke mezin nisanên me yê siyasî û kesên ronakbîr ji ber hukmê faşîst ê 12'ê îlonê nuh derketibûn dervayî welat. Hema bêje piraniya wan kesan kitêbên kurdî dikirin.

Piştî demekê şûnda kirîna kitêban kêmtir bû. Çimkî êdî di mala herkesî da 5-6 kitêbên kurdî hebûn. Gelek kesan bi peydakirina van çend kitêban dilê xwe rehet kirin, belkî gelek nedixwendin jî, lê dîsa jî dikirîn. Niha xwendevanên rastî jî êdî her kitêbeke kurdî nastînin. Divê kitêb bi qalîte be, him bi naverok, him jî bi çapa xwe baş be.

4. Wek min got însanên me di serî da bi tewrekî rind nêzikî weşanên kurdî bûn. Helbet yên ku wê demê xebata ji bo ziman û çanda kurdî basît û bêkêr didîtin hebûn. Ev wek karekî şoreşgerî nedidîtin. Lê derketina kitêbên kurdî, rojname û kovarên kurdî moralekî baş dida gelê kurd bi tevayî. Xwendin û nivîsandina kurdî di nav ronakbîran da, di nav gel da baş belav bû. Gelek ji wana bi xwe dest bi nivîsandina kitêb û kovaran kirin. Piştî çend salan gelek weşanxaneyên nû ava bûn. Di destpêkê da li Swêdê tenê weşanxaneya Roja Nû, dûra Weşanxaneya Çanda Kurdî (ya hevalbendên DDKD) hebûn, lê niha 10-15 weşanxaneyên kurdî hene. Îro êdî em dikarin qala literatûra modern ya kurdî (kurmancî û zazakî) bikin, herçend zeîf be jî.

5. Li gor bawerîya min, madem xwendevan kêmtir in, weşanxane pir in (li gor jimara xwendevanên heyî), wisa e kontrola xwendevanan jî kêmtir e li ser qalîteyê. Loma gelek kitêb derdikevin ku bi rastî mirov ked û xweêşandineke wisa zêde di wan da nabîne. Ne ji bo ku em hin kes yan jî weşanxaneyên din tawanbar bikin vî tiştî dibêjin, car hebûye me jî kitêbên wisa çapkirine. Ev sedemek e.

Sedemekî din jî ew e ku çapkirina kitêban (li Swêdê) bi alîkarîya dewletê bûye. Eger kitêb neyên firotin jî, xwediyê weşanxaneyê jî alî aborî da zirareke mezin nabîne. Loma hin xebatên basît jî tên çapkirin. Li aliyê din, mixabin bazara pirtûkên kurdî teng e, û weşanxaneyêke biçûk nikare kitêbên xwe bigihîne her derê û her welatî. Loma jî gelek kitêb di kileran da li ser hev lodkirî dimînin.

Ji van sedemên jorîn muhîmtir, sedemekî din jî heye: Tunebûna rexneyên zanistî... Ji bo gelek nivîskarên edebîyata bedew, hesreteke mezin e ku rojekê yek li ser çîrok yan jî şîirên wan du gotinan binivîse. Şûna vê kêmasiyê heta niha jî vala ye.

6. Helbet di karê weşanê da em, berê jî û niha jî tûşî zehmetîyan tên, ku ew jî ne bi kapasîta ziman va girêdayî ne, lê bêtir bi pirsra rastnivîsandina ziman û bi pirsra alfabe û girêdayî ne. Ango nestandartbûna zimanê nivîskî problemeke mezin e. Gerçî di van 15-20 salên dawîn da pêşketinek heye, lê têrê nake.

Pirsra alfabe û heye li ber me. Divê rojekê zûtir bê çareserkirin. Di salên 70 da li welat problema alfabe û tunebû. (Qesta min di nav kurdên Kurdistana Bakur da) Yên ku karê weşanê dikirin qet nebe tûşî problema alfabe û nedihatîn. Mesela rojname Roja Welat (ku her jimarek 30-40 hezar derdiket), Rizgarî, Tîrêj û gelek weşanên din, di nivîsandina kurdî da alfabe û problemeke wek hev dixebitandin. Qet nebe di alfabe û da sergêjiyek tunebû. Lê niha tevlihevîyeke alfabe û peyda bûye, divê bê çareserkirin.

7. Vê gavê 3 kitêbên me li ber çapê ne, du heb ji wan yên nivîskarên kurdên Sovyeta berê ne û yek jî ya Ahmed C. Çamlîbel e, van rojan wê derkevin. Bi dehan kitêb hene di destê me da, me ew kirine dorê û em ê bere bere çap bikin. Ji aliyê

başkirina kar û barê weşanxaneyê da tu projeyeke me ya taybetî tune.

8. Di şertên îro da, derxistin û belavkirina weşanên kurdî karekî îdeal e, hîna negihîştîye warê ticaretê. Li vir reqabeta ticarî tune. Hemû weşanxaneyên kurdî, (îstîsna ne têda), tenê ji bo xizmetê hene, ne ji bo qezenca maddî. Bi kêmanî em wisa dizanin. Loma pirsên me jî kêm zêde wek hev in. Lê ji aliyê belavkirin û firotina kitêban da îmkanên me zêdetir in. Ji ber ku xebata me parçeyekî xebata rêxistinî ye. Weşanxaneya me weşanxaneya KOMKAR'ê ye, ku hema bêje li piraniya welatên Awrûpayê komele û komîteyên wê hene.

Di vê pirsê da em dikarin û dixwazin alîkarîya nivîskaran û weşanxaneyan bikin ku kitêbên wan jî belav bibin. Û em dikin jî. Loma di navbera me û gelek weşanxaneyan da danûstandin heye. Di dawîya sala çûyî da me deh (10) weşanxaneyên kurdî bi hev ra, wek cara yekemîn fuara kitêbên kurdî vekir. Û me li hev kir ku em hersal li Stockholmê fuara kitêban vekin. Di pêşda em ê hewl bidin ku danûstandinên xwe xurttir bikin. Dibe ku hevkarîya me bibe sedem ku em hin pirsên xwe yên muşterek jî safî bikin. Di vî warî da em bi hêvî ne.

Berpirsiyarê Weşanxaneya Çanda Kurdî, Keya Îzol: ”Pirtûkên kurdî nayên firotan”

Weşanxaneya Çanda Kurdî di sala 1979'an de ava bûye. Heta nuha 34 kitêb weşandine. Berpirsiyarê weşanxaneyê, birêz Keya Îzol bersiva pirsên me da:

1. Çapên me bi temamî li derveyî welat bûn, zêde zehmetî nebûn.
2. Problema belavkirinê hebû, hîn jî ew yeka berdewam e. Ji ber ku di kurdan de tradîsyona pirtûk girtinê nîne, pirtûkên kurdî nayên firotan. Tanê cihê resmî (swêdî) pirtûkan dixwazin. Loma jî weşanxane xwe bi xwe nikare fînanse bike û projeyên baştir li dar bixe.
3. Her wek li jor.
4. Reaksîyonên wan baş bû, lê carnar jî bê mane bû.
5. Qalîta pirtûkan baş bûn, lê di nav de gelek şaşiyên teknîkî hebûn. Ew jî ji lezkirina û ne bi metod karkirina me tê.
6. Belê, wek herkesî bi baweriya min. Lê her ku çû ber bi başbûnê ve çû. Bawerim di salên pêş de dê hîn baştir bibe.
7. Projeyên nuh ên me niha tunene. Lê wek fikir me dixwast pirtûkên ku hatibûn çapkirin, li Tirkiyeyê jî werin çapkirinê. Li gor îmkanan, dibe ku li salên pêş ev tişt bibe.
8. Danûstendin baş e. Lê dikare baştir bibe.

Berpirsiyarê Weşanxaneya Jîna Nû, Mahmûd Lewendî: ”Divê ku aborî û profesyonelî hebe”

Weşanxaneya Jîna Nû, di sala 1984'an de li Stockholmê ava bûye. Heta nuha 41 kitêb derxistine. Ji berpirsiyarên weşanxaneyê, birêz Mahmûd Lewendî di derbarê rewşa weşanxaneyê de bersiva pirsên me da.

1. Problema çapkirinê, berî her tiştî di warê aborîyê de ye. Her çendî ji teref dezgeha kulturî ya dewleta Swêdê hin alîkarî tê kirin, lê ev alîkarî têrî çapkirina kitêban nake. Gerçî di navbera salên 1980-1992'an de dewletê alîkarîyek ji ya nuha baştir, dida. Ji ber ku wê demê serê her kitêbekê nivê heqê çapê dida. Lê nuha ev awa hatiye guhertin. Êdî li gor faalîyetên çapxaneyan tenê alîkarîyê didin çapxane an jî weşanxaneyê, ku ew jî alîkarîyeke gelek kêmtir e. Weşanxane divê mecbûrî ji kîsî xwe kitêban çap bikin û bifroşin daku dezgeha wan a aborîyê bigere.

Problemeke din ya çapkirinê jî ji alî teknîkî de bû. Berê pir zahmet bû. Ji ber ku ew berhema ku me yê çapbikira destnivîs bû. Me ji nû ve dinivîsand, tashîh dikir, îmla wê rast dikir, mîzanpaja wê çêdikir û hê dişand çapxaneyê. Lê nuha ev rewş daketîye nivî. Çimkî çî bigre her kesê nivîskar xwedî komputer e, berhemên xwe bi xwe dinivîsin. Êdî karê ku dikeve ser milê weşanxaneyê tenê ew e ku tashîh bike û îmla wê rast bike û mîzanpaja wê çêke. Lê bêguman ji bo vê jî çend kadro lazim in.

Wek weşanxane karê ku me heta nuha kirîye û yê ku em hê jî dikin, karekî bi amatorî û îdeal e. Yanê em wek weşanxaneyên milletên din neku ji bo tîicaretê kar dikin. Ême bêtir karekî welatparêzî an jî siyasî ye. Îcar welatparêzî û siyasî bûn tenê têrî karekî weha nake, divê ku aborî û profesyonelî jî hebe, yan na kar berbi pêş naçe, gur nabe, geş nabe.

Bi ya min di vê rewşa ku ew tê de ne, karê ku weşanxaneyên kurdan dikin karekî amatorî ye, ji tunebûnê çêtir e, lê ne pir baş e. Ji ber ku ne profesyonel e, bivê nevwê ewê rojekê li derekê raweste. Ji ber wê jî divê ku mirov bi hişê tîcarî bi vî karî re rabe, yan na ewê her tim zehmetiyên aborî, kadro û hwd derkevin pêşberî me.

2. Ji ber ku dêzgeheke belavkirinê ya merkezî tune ye, ew jî problemek e. Em karê belavkirinê jî bi awayekî amatorî dikin. Heval û dost û nasên me, an jî bi alîkarîya tevgera siyasî ya ku em nêzî wan in, em kitêbên xwe belav dikin. Ji derveyî wê, dezgehên resmî yên dewletan, an jî yên kurdan ên kulturî û yeko yeko şexs bi postê ji me kitêban dixwazin. Di şandina kitêban de, yên dezgehên resmî ne tê de, di yên dinan de em zerrarê dikin. Ji ber ku heqê postê pir giran e. Û pirê caran jî heqê postê ji kîsî me diçe.

3. Rewşa firotinê wekî min li jorê qal kir, di destê rewşa belavkirineke bi rêk û pêk de ye. Ger bi awayekî rêk û pêk û bi profesyonelî mirov bikaribe bifroşe,

ez bawer im wê weşanxane bikaribin çerxa xwe ya aborîyê baş bigerînin. Hema tenê li Ewrûpayê nîv milyon kurd hene. Ger organîzekirineke baş hebe, firotina 1000 kitêban nabe tu problem.

4. Tesbîtîkirina reaksiyona xwendevanan piçekî zahmet e, ji ber ku divê mirov îstatîstîkekê çêke. Lê tenê em dikarin ji firotina wan vê reaksiyonê derxin holê.

Kitêbên ku em çap dikin, di navbera 800-1000 nusxeyî de ne. Di nav salekê de ji her yekê 200-400 nusxe tên firotin. Kitêbên me yên ku heta nuha pir hatine firotin: Ya li ser Tevgera Şêx Seîd (qet nemaye), Rojnamegerîya Kurdî, kovarên Ronahî û Roja Nû, Ferhenga Dimilî-Tirkî, Jiyanê Rewşenbîrî û Siyasî ya Kurdistan, Dengê Xêzikan.

Her weha di kovar û rojnameyên kurdan de jî gelek nivîs -çi wek nasandin be, çi jî wek rexne be- li ser kitêbên me hatin nivîsîn.

5. Di salên 1985-90'î de di piranîya hişê kurdan de ew bû ku "bila bi kurdî be, çi dibe bila bibe" hakim bû. Lê nuha ne welê ye. Nuha, bi qasî ku ez pê dizanim, piranîya weşanxaneyan xwedî redaksiyonekê ne. Redaksiyon biryara çapkirin û neçapkirina kitêbekê dide. Bêguman ev jî dibe alîkar daku kitêbên ji alî naverokê ve piçekî bi kalîte bînin çapkirin.

Lê dîsa jî gava ku mirov li hin kitêbên ku nuha hê jî derdikevin dinêre, mirov dibêje qey hema tenê bi kurdî ye derdixin. Ji ber ku ya naveroka wan pir qels e, yan jî îmla wan.

6. Di wergera hin kitêban de ji alî ziman ve gelek zahmetî derdikevin pêş me. Bi taybetî di warê lêkolînên tarîxî, nivîsên sosyolojîk û felsefî de.

7. Projeya me ya herî sereke dîsa derxistina kitêban e, lê bêguman ev jî bi aborîyê ve girêdayîye. Çimkî ger kitêb belavnebin û neyên firotin, wê demê em nikarin yên nû jî derxin. Ji ber wê yekê me nuha di destê pêşî de firotina kitêban daye ber xwe. Çimkî di depoya me de bi qasî buhayê 800 000 Kronî kitêb hene. Ger em bikaribin salê jî çara yekê van bifroşin, wê demê em dikarin di nav salekê de bi kêmanî 10 kitêban çapkin. Lê di her halûkarî de dîsa jî ger em pêwîst bibînin em hin kitêban çap dikin.

Di projeya me de çapkirina gelek kitêban heye. Dîsa di projeya me de ev yek jî heye ku em bikaribin kitêbên xwe yên çapbûyî, careke din li Tirkîyê jî çap bikin daku bigihîjin Kurdistanê.

8. Li Swêdê nêzî 25 weşanxaneyên kurdan hene. Lê ji wan tenê 9-10 heb di karûbarên xwe de serketî ne, yên din piranî li ser kaxezê hene, lê di faalîyetê de tunene. Yan jî di wexta xwe de tenê kitêbek derxistine û êdî rawestiyane.

Weşanxaneyek ji bo çî radiweste? Bi a min di destê pêşî de ji ber aborîyê ye, yanê nikarin kitêbên xwe belavbikin û bifroşin. Ji ber wê divê ku hemû weşanxaneyên kurdan werin ba hev, problemên xwe munaqêşe bikin û bigihîjin hin netîceyan. Mesela mirov dikare merkezeke belavkirina kitêban çê bike daku bikaribe kitêbên xwe bifroşe. Bi wasitêya vê merkezê mirov dikare bigihîje hercûre xwendevanan. Îro li Almanyayê nîv milyon kurd hene, ger merkezeke weha

bikaribe bigihîje van xwendevanan, firotina 1000 kitêbî qet nabe derd.

Par cara pêşî hin weşanxaneyên kurdan hatin ba hev û li Stockholmê sala çûnê û îsal du rojan Bazara Kitêbên Kurdî (Panayira Kitêban) çê kirin. Ev gaveke pir baş bû da ku weşanxane, xwendevan û nivîskar hevdu nas bikin, her weha kitêbên xwe bifroşin. Wek weşanxane emê ji bo berdeyamîya vê panayirê bixebitin da ku bikaribin her sal û ne tê nê li Stockholmê, her weha li bajarên din yê Awrûpayê jî panayirên weha amade bikin.

Berpirsiyarê Weşanxaneya Orfeus, Memo Yetkin: ”Kitêb divê di sewiyeya Ewrûpayê de bîn çapkirin”

- *Birêz Memo Yetkin, weşanxaneya we çi wext ava bû? We çi hedef danîbû li ber xwe?*

Yetkin: Di sala 1980'î de du kitêb di destê min de hebûn. Wê wextê hema hema hemû weşanxane di destê partî û rêxistinên kurdan de bûn. Ji bo ku ez girêdayî partiyekê nebûm, min dît ku dijwarî heye li ber çapkirina kitêbên min. Hevalekî min ê ermenî hebû, ermeniyê Tirkîyê bû. Me tev fikir kir, hin projeyên me hebûn. Li ser biratiya kurd û ermenîyan, di tarîxê de çi bûye, me xwest ku hin tiştan bikin. Piştî ku tecrûbeyek ne baş li ser çapkirina kitêbekî min çêbû, min biryar da ku weşanxaneyek vekim. Ez û ev hevalê xwe yê ermenî em runiştin. Wî digot, bila navê weşanxaneyê ”Hayastan” an jî tişteke weha be. Min jî digot bila ”Kurdistan” be, nizam tişteke din be. Di dawiyê de me tişteke muşterek dît. Di mîtolojiya yunaniyan de Orfeus heye. Ev jî navê Ruhayê berê, Horfo tê. Me got, yunanî jî dostên me ne û me nav danî Orfeus. Sala 1985 bû. Kitêba me ya yekemîn jî ya Garo Sasûnî bû.

- *Em werin li ser pîrsa çapkirinê. Wekî tê zanîn problemên çapkirinê ji bo hemû weşanxaneyên kurdan giring in. Hûn wekî weşanxane heta nuha marûzê kîjan pîrs û pîrsgirêkan bûn?*

Yetkin: Berê ku em dest pê bikin, min diditbû ku kurd çawa kitêban çap dikin. Carnan dihat gotin pirtûk in, carna jî wekî broşûr dihatin binavkirin. Carnan bi destan tahsîskirin jî di kitêban de hebû. Ez bi xwe li Ewrûpayê pir mabûm û min digot, eyb e ku mirov weha çap bike. Ji bo vî min digot çawa dibe bila bibe, ez dê di sewiyeya kitêbên Ewrûpayê de kitêban çap bikim. Bila kurd jî îftixar bikin ku kitêbên wan jî bi vî awayî çap dibin. Di vir de pîrsa aborî derdiket. *Kulturrâdet*^(*) hinek alîkarî dikir, lê ev alîkarî bes nedikir. Ji bo her kitêbê min 15-

(*) Dezza Swêdê ya ku piştigirîya karûbarê kulturî dike.

20 hezar kronê swêdî datanî ser. Bi vi awayî min kar dimeşand.

- *Ev pirsên aborî ne. Pirs a çapê we çawa hel dikir?*

Yetkin: Hevalekî min ê swêdî hebû, weşanxaneyê wî hebû. Wexta min dixwest kitêbek çap bikim, diçûm ba wî, min dipirsî li kuderê çapkirin erzan e. Wîya ji min re digot û li gor hesabê xwe ez diçûm wan ciyan û min kitêb çap dikir. Konsultê wan hebûn. Dihatin kitêb ji min digirtin û dibirin çap dikirin û di wextê xwe de jî danîn.

- *Ya problemên belaukirinê çi bûn û çi ne?*

Yetkin: Problemên me zêde bûn. Ji ber ku em ne girêdayî partiyekê bûn, zehmetî hebûn. Di destpêkê de me ji hin dezgehên kurdan re şandin, lê pere baş nezivirî, bêje sedî 20 hat. Şîrêkê min ji vî aciz bû. Ez jî mahçûp bûm. Me ji hin ermeniyên re jî dişand û pere di wextê xwe de dihat. Şîrêkê min, şaş dima. Paşê ez tenê mam û min domand.

- *Rewşa firotinê çawa bû û çawa ye? Li gor hesabê we, kitêb hatin firotinê yan ne? Kijan kitêb herî baş hatin firotinê?*

Yetkin: Kitêba yekemin baş bû, nêzikî 2 hezar hate şandin, pere giş nehat, lê baş bû. Kitêbeke eslî bû. Lê me di serî de dît ku kitêbên kurdî baş nayên firotin. Misalen kitêba Lescot, Çîrokên Kurdî baş nehat firotin.

- *Reaksiyonên xwendevanan girîng in. Di vî warî de çi positif çi negatîf çi rexne û dîtî ji we re hatin?*

Yetkin: Name hatin. Piranî baş bûn. Digotin kitêban bişînin, em peran dişînin. Lê pereyê posteyê zêde bûn. Lê wexta pere neyê mirov aciz dibe. Carekî me nêzikê 300 kitêb ji dezgeheke kurdî re şand, ez nav nadim, qurûşek pere neşandin. Ez pir aciz bûm. Hinekan gotin, bide mehkemê, min got, ez nadim, ez kurdan nadim mehkemê; dibe ku nizanin, hîn nebûne, ew jî ji bo azadiyê kar dikin. Lê tiştêkî ne xweş bû. Qet nebe mirov hinekê wan dişîne. Hinekê hedîseyên din jî hebûn. Alîkariya *Kulturrâdet* bellî bû, min nikaribû her tim ji bêrika xwe pere bida. Min gelek têkilî ji danîbû, mîsalen ez çûm Sovyetê min Lazarev, Hasretyan dîtî, lê îmkân çênebûn ku projeyên me herin serî.

- *Kitêbên we ji aliyê çapê xweş in. Lê ji aliyê naverok wexta mirov binêre, kitêb hene ku hûn wexta nuha bifikirin hûn dê çap nekin? Yan jî hûn qet li ser vî tiştî fikirin?*

Yetkin: Ez bawerim, gotinên hevalê min ê ermenî rast bûn. Wî digot, em tenê kitêbên faktayê çap bikin, bes e. Piştî kitêba me ya yekem heval hatin, dost hatin, gotin kitêbên me jî çap bikin. Roman bûn, çîrok bûn, ji bo zarokan bûn. Min jî got, çima nabe, em dikarin çap bikin. Lê ez bawer im, divê her weşanxaneyek îmajêke wê hebe. Dibe ku ger me tenê kitêbên fakta, lêkolînê çap bikira dê baştir bibûya.

- *Kitêbên we piranî kurdî ne. Gelo hûn di karê weşandinê de, çi di rastkirina tekstan de çi di wergeran de marûzî zehmetiyên ku ji kapasîteya zimanê kurdî dihatin, bûn an ne?*

Yetkin: Hebû, tabî. Kitêbên ku me kurdî çapkirine hinek roman in, hinek tekstên dîrokî ne. Ez bi xwe sadîqê tekstan im. Min nedixwest ku biguherim. Hinekan jî kurdiya hevdu ne dicibandin. Misalen ê Mehmed Uzun. Wexta min kitêba wî çap kir, hin kes hatin gotin, tu çima kitêba wî çap dikî, nizam çî. Lê min bi xwe Mehmed Uzun nas dikir, min zanîbû intereseya wî li ser roman heye. Min çend caran dît çawa dixwîne, dixebite. Min bi xwe jî didît, hinek cumleyên wî wergera yên tirkî ne, tercûme ne, lê em hemû bi kêmasiyên xwe hene. Min digot, mirov divê maqûl be.

- Projeyên we yên pêşerojê çî ne? Çî jî aliyê kitêbên ku li ber çapê ne, çî jî aliyê bi tevayî başkirina karûbarê weşanxaneyê.

Yetkin: Ez nuha dixwazim li Tirkiyeyê kitêban çap bikim. Sebebê yekemîn ekonomîk e. Li gor vir erzan e. Ya din jî gelê me, xwendevanên me li wir in.

- Li wir pîrsa belavkirinê hûn çawa hel dikin?

Yetkin: Kurdên ku belav dikin tunene, gerez mirov bide tirkan.

- Hûn derbarê danûsitendinên di navbera weşanxaneyên kurdî de çî difikirin? Pîrs û pîrsgirêk çî ne û ev dikarin çawa bîr çareser bikin? Çima koordinasyonêk tuneye?

Yetkin: Ez bawer dikim pêşî pîrs siyasî bû. Di destpêkê de weşanxane di destê siyasîyan de bûn. Lê nuha ew jî dibînin ku bi halê berê naçe. Kadro jî warê kulturî nayin, ji siyasî tî. Wexta mirov jî aliyê kulturî binêre, mirov dikare riyan bibîne, bifroşe û hetta pere qezenç bike. Wê wextê dê nebêjin, nefirotin, yan jî zerarkirin normal e.

- Li gor bawerîya we divê mirov çî bike?

Yetkin: Her çiqas me pîrs kitêb çap nekirine jî em vê pîrsê zanin. Divê profesyonelî kar bikin. Yekemîn, divê li vir merkezê deynin, meseleyên çapkirinê û tercûmeyê hel bikin. Ya duyemîn, meseleya belavkirinê ye. Ez bawer dikim kurd dikarin pîrsa belavkirinê hel bikin. Ez nabêjim wekî Ewropa, lê hema her tim bila du erêbê di rê de bin, bi vî awayê bigerin. Bila herin mehleyên ku kurd li wir in bigerin. Divê mirov li vir bicih be. Ez dibêjim, bila werin ez 500 hezar kron didim, 4-5 kesê din jî bila bidin em vê tiştî bi rêkûpêk bikin. Rewşê di ne wekî berê ye.

- Ez rewşa weşanxaneyên kurdan texmîn dikim, lê cardin jî dixwazim bîpîrsim. Pîrsa peredayîna bo nivîskar an jî wergeran. Polîtîkaya we çî bûye di vî warî de?

Yetkin: Eynî min wekî swêdiyan kiriye. Ez çûme Yekîtiya Nivîskarên Swêdê, min pîrsiye, heqê nivîskar di navbera sedî 11-16'yê de diguhere. Ev tişt, min hinek zêde jî kiriye, nêzîkê sedî 20 min daye Mahmut Baksî jî, Mehmed Uzun jî. Peymanên me yên nivîskî jî hene. Carnan kitêb bûye, carnan jî pere bûye.

Berpirsyarê Weşanxaneyê Pencînar, Zeynelabidin Zinar:
"Pencînar ji bo suxreya ziman
û kultura kurdî ye"

- *Birêz Zeynelabidin Zinar, em ji wext û pêwistiya weşanxaneyê dest pê bikin. Weşanxane çi wext ava bû û pêwistî çi bû?*

Zinar: Pencînar Weşanxaneyê Çanda Kurdî, di Newroza 1986'an de programa wê hatiye çêkirin û ew destûr û program li ser du şaxan hatine avakirin: Yek, ji ber ku ez bi koka xwe ji medreseyê hatime, gelek pirtûkên klasîk ên bi tîpên erebî hene ku ev nîşa kurd a nû nizane wan bixwîne, dê ez van klasîkan wergerînim tîpên latênî û wana çap bikim. Ya din jî, folklorê kurdî ya di nav xelkê de dê bête civandin û bi forma pirtûkê çap bibe. Lê wexta ku weşanxane hate avakirin, yek quruş pereyê min tunebû, tenê li ser kaxiz min ew program û destûr çêkiribûn. 1991 bû, yan 1992 bû, rind nayê bîra min, min destûra resmî ji meqamên Swêdî sitend.

- *Problemên çapkirinê çi bûn û çi ne?*

Zinar: Ji 1986'an heta îro, 36 pirtûkên min hatine çapkirin. Ji vanakan hinek min bixwe ew dane çapkirin, hinek ji aliyê weşanxaneyên kurdî yên cuda cuda ve hatine çapkirin. Min pirtûk dane 8-9 weşanxaneyan ji bo çapê. Îcar ev pirtûkên ku min bixwe çapkirine û yên ku weşanxaneyên kurdî yên din çapkirine, piraniya wan alîkarî ji dewleta Swêdê girtine.

- *Misalen wusa lê hatiye ku te xwestiye kitêb çap bikî, lê ji ber ku pere tunebûye te nikaribûye?*

Zinar: Gelek problem derketine. Pirtûkekê ez dê nîşanê te bidim. Ev pirtûk (wek antoloji) li ser nivîskaran e. Ev temam bû, lê ji bo ku pere tunebû, sê salan çap nebû. Dewletê alîkarî neda. Min ji 10-12 weşanxaneyan re teklîf kir, kesî çap nekir. Dawî dawî ez mecbûr man, min pere deyn kir. Min 24 hezar kron lê serf kir. Nuha 16 pirtûkên min hene ku divê ew di nav salekê du salan de bêne çapkirin. Ji ber ku îmkana aborî tuneye, çapkirina wan zehmet e.

- *Ji ber ku şîrketêke yan dezgeheke belavkirinê tûne bû, kifş e ku zahmetî di vî warî de heye. Gelo we problemên belavkirinê çawa çareser kirin?*

Zinar: Meselaya belavkirinê, meseleya herî muhîm a kurdan e. Niyeta min a ji bo fîrotina pirtûkan hîç tune. Tenê gava çi pirtûkeke min derdikeve, ez ji 75 heta 150 hebî wekî diyarî dişînim ji weşanxaneyan re, ji kesên xuyanî, yên naskirî re, heta ew kesên ku li ser zimên kar dikin, ji wan re dişînim, ji 7-8 uniwersiteyên Swêdê re dişînim, ji kutubxaneyan re dişînim. Tenê *Biblotekstjänst*^(*) ji her kitêbekê, ji 50 heta 100 hebî, carinan dikirre. Bê vê, wekî din fîrotin tune. Carnan kesên ku ji derveyê Swêd an ji hundirê Swêd ji bajarên din pirtûk dixwazên,

(*) Dezgeha kitêbxaneyan a Swêdê

bihayê wan tenê têra heqê postê dike.

- *Ger wusa ye, hûn çawa kitêbên xwe finanse dikin?*

Zinar: Armanca Pencînarê ji bo suxreya ziman û kultura kurdî ye, ne ku pere ji kitêban qezenc bike... Herçend ku mîna firmayeke şexsî be jî, lê wek firmayeke komunî xizmet dike. Îcar rewşa aboriya weşanxaneyê, piranî Kulturrâdet e ku her salê wekî otomatîk di navbera 25-40 hezarî de pere alîkarî dike. Îcar ew pereyê ku didin, ez bi hesab bi kar tinîm. Ez karê teknîkî yê pirtûkan hemû bixwe çêdikim. Lê gelek nivîskarên kurd hene, ku vî karî bi pere didin çêkirin. Ji bo vê erzan dibe mal ji bo min.

Çapxaneyên ku herî erzan pirtûk çap dikin, ez wan hildibijêrim. Tenê di sala 1995'an de tevî baca dewletê (moms) 13 hezar kron kitêb hatine firotin, lê mesref nêzî 120 hezar kronî bûye. Pîreka min niha kar dike, ew jî problem dernaxîne. Ev jî bo min xweşiyeke zêde ye.

- *Reaksiyonên xwendevanan çî bûn û çî ne? Çî pozitif û çî negatîf. Tesîrên van çî bûne li ser we?*

Zinar: Yanê rexne.

- *Dikare pesindayin be jî.*

Zinar: Piraniya pirtûkên ku min çap kirine, ne rasterat yê min in; piranî yê klasîkên kurdî ne, folklorê kurdî ne. Mesele ev e, kapasîte ev e. Ji ber hindê rexneyên bi nivîskî nehatine min, lê bi devkî pir hatine, piranî jî ji wan hevalên ku berê me bi hev re siyasî xeban kiribû, ev yek jî nelê ye! Yanî heta heqaret jî hinekan li min kiriye, lê min li rîya xwe domandiye. Min gotiye, dibe ku weha be, ji bo ku ji ziman, ji edebiyat fêr nakin, weha dibêjin; lê wexta piçek zanîna wan zêde bibe, ew dê qimeta van tiştan rind bizanibin. Û hinek pirtûkên ku min nivîsandine, bêyî ya li ser îşkencê, yê mayî jî hema hema folklor in; hinek çîrvanok in, lê min şiklekî din daye wan, hinek dirêj kirine û şikl û rûcîkekî din pê daniye. Lê rexneyên xirab jî tu nehatine.

- *Yan pêşniyar hatine?*

Zinar: Bi nivîskî na, lê bi devkî yê mirovên gelek muhterem hatine, gelek taqdir kirine, gotine ku ev xizmeteke pir baş e. Bi taybetî jî ji bo van pirtûkên folklorî û yê klasîk. Bivê nevé moralê mirov bi van xweş dibe û bevzê mirov li xebatê geştir dibe.

- *Baş e em werin pîrsa qalîteya çapê û naveroka kitêban. Pîrsa xwedî ne(de)rketinê jî heye. Berê mumkun e ku hema çî hat çap bû. Lê nuha hêdî hêdî qalîte û naverok tê munaqeşekirin. Dîtina we çî ye? Di vî warî de ger kêmasî yan jî çewtî hebin, li gor we sebebên van çî ne? Gelo xwendevan mecbûr in ku xwedî li her tiştî derkevin, ji bo ku kurdî ye?*

Zinar: Qalîteya kitêban baş e. 16 hebên wan klasîkên kurdî ne. Naverok qenc ne qenc, ew serweta me ne. Ew ji aliyê bav û bapîrên me ve hatine nivîsandin, em nikarin têkî naveroka wan bibin. Ya duduya, ew pirtûkên din, yê folklorê kurdî ne; piranî çîrok in, stran in, metelok in, yê şeran in, yê evîne ne, weha ne. Evana qalîteya wan baş be, ne baş be dîsa yê me ne. Lê baweriya min ev e ku ji aliyê

qalîteya naverokê ve, pirtûkên ku min derxistine, yên herî baş in.

- *We behsa lêzêdekirinên li hin çîrokan kir. Ji bo yên din çawa ye? Hûn wekî xwe dihêlin, sansûr dikin an ne, yan jî lê zêde dikin an ne?*

Zinar: Diyar e, çi karê ku mirov dike, di serê pêşî de xişimtiya wi karî heye, bêtecrûbetî heye. Her çend min di 11-12 saliya xwe de dest bi nivîsandina kurdî ya bi tipên erebî kiriye jî, heta emrê min bûye 30-31 sal ez li Kurdistanê bûm, me li derve nikaribû serbest bi kurdî bipeyiviya. Vê yekê kêmasiyeke pir mezin di me hemû kurdan de afirand. Îcar ew pirtûkên ku min bi xwe dane hev, mîsalen di Xwençe 1 û 2 de, min hinek çewtî kirine. Hinek jî çewtiya wan kesên ku bi makîne nivîsandibûn çêbûye.

- *Mesela ji aliyê çi?*

Zinar: Mesela ji aliyê devokan ve. Misalen yê ku gotiye, gotinekê bi kar aniye, min ew bi kar neaniye; di şûna wî de min gotineke ku li hemêma min tê bikaranîn nivîsye. Ev, şaşîyeke mezin in bû ku min kiriye. Ya duduya ew cild, min bi xwe ew bi datayê nenivîsandiye. Hinek hevalên din nivîsandine. Wexta wan bixwe jî nivîsandine, wan jî rind ji zimên, ji gramatik fam nekiriye, îcar wan şaşîtiyên min dubare kirine. Şaşîyên wan jî ketine sutuyê min, pir xirab derketine. Xasma jî cilda yekê. Vanê din ne wisan in; çi tiştê ku ji min re hatine, eger kelîme pir xirab be jî min ew neguhartine, wekî xwe hatine nivîsandin. Carnan çîrokbêj kelîmeyên xwe dubare dikin, min ev jê derxistine. Carnan çîrokbêj birêzkirina bêjeyan di hevokan de çewt bi kar tînin. Ew di axaftinê de fam dibin, lê di nivîsandinê de fam nabin. Ji bo vê jî min hinekî sererast kirine.

- *Binavkirina hin tiştan çawa bûye, wekî xwe ma ne yan ne? Mîsalen tiştên li ser organên cînsî.*

Zinar: Ez têkilî vê nebûme, tiştên wekî "şikft", "qelişték" wekî xwe mane.

- *Ya din, carnan mirov ji bo berhemên xwe dibêjin; "ew hemû wekî zarokên min in". Tu wexta ku nuha li wan weşanan dinêrî, pirtûk hene ku tu dibêjî; "îro bûya min dê çap nekira".*

Zinar: Zanî, ev tiştên ku te behs kir, ew karên ku ez dikim tê de ne mevcûd in. Ji ber ku, çi dema pirtûkeke klasîk a kurdî ku bi destên min dikeve, ez dest ji karê xwe yê heyî berdidim û dest bi wê dikim, wê werdigerînim tipên latînî û didime çapkirin. Çimkî ihtiyaciya kurdan pir bi van tiştan heye. Ez nabêjim, "ez dê berê vê çap bikim, yan wê çap bikim." Ya duduya, yên folklorî, wexta karê yên klasîk ku di destên min de tune be, ez yên folklorîk çap dikim. Ev tevek malê Kurdistanê ne, çi qenc bin çi nebin malê me hemûyan in. Lazim e em xwedî li wan derkevin. Di cilda pêşîn a Xwençeyê de min çewtiyeke din kiribû, min tesnîf li gor naverokê nekiriye. Piştî wê, min tasnîfa yên din tevek li gor naverokê kiriye.

- *Yên folklorîk çawa ji te re tînin? Yan jî berê haziriya te hebû?*

Zinar: Piştî ku ez hatim virê, min Projeya Pencînarê di Newroza 1986'an de çêkir û min bi Kurdistanê re têkilî danî. Ji ber ku min medrese xwendiyê, gelek mele hene, feqî hene, şêx hene, însanê wusa dîndar, oldar hene em hevdu nas dikin, heta me bi hevdu re xwendiyê û kar jî kiriye. Lê ew nuha siyasetê nakin.

Min bi wan re têkilî daniye. Hinekê wan ku rewşa wan a aborî xerab bû, min ji wan re hinek pere jî şandiye. Ji min re tiştên weha berev kirine. Şerîd dikirîn, teyib dikirîn û tije dikirîn, ji min re dişandin.

- *Tenê ev bûne?*

Zinar: Li virê diya min, hin pîrejinên Kurd ên din û çend kesên Suryanî jî çîrok û tiştên wisa ji min re gotine. Lê piranî çewa ku min got, ji welêt hatine.

- *Hûn di karê weşandinê de tûşî (marûzî) zehmetiyên ku ji kapasîteya zimanê kurdî dihatin, bûn an ne? Gelo îro zimanê kurdî têrî hemû berhemên edebiyatê dike yan ne?*

Zinar: Pirseke muhîm e, ez dê dîtina xwe, baweriya xwe piçekî fireh îzah bikim. Di dawiya 1994'an de li Parîsê konferansê li ser zimanê kurdî çêbûbû. Navê konferansê "Zimanê kurdî ber bi sala 2000'î ve" bû. Ez jî hatibûme vexwendin. 7-8 profesor beşdar bûbûn. Zimanê konferansê fransîzî, îngilîzî û kurdî bû. Profesorekî îngilîz, navê wî nuha nayê bîra min, weha got; "min bi xwe tesbît kiriye ku zimanê kurdî di zîreetê de, di heywancîtiyê de ji îngilîzî jî û ji fransîzî jî dewlementir e. Lê ji ber ku dewleta kurdî çênebûye, di teknîkê de, di politikayê de û di tibê de kêma e." Îcar zimanê kurdî, ev nîfşên ku niha hene ku emrê wan navbera 30-40 salî de ye, heta emrê xwe yê 25 salî bi zimanê dijmin xwendine. Yê ku bi tirkî, yê ku bi erebî, yê ku bi farisî. Hema bêje kurdî qet xeber nedane. Piştî 20-25 salan hîn dest bi kurdî, kurdîtîyê kirine. Ê de malûm e, ji wan re nivîsandina romanên bi zimanê kurdî pir zehmet e. Gazind ji wan nayê kirin. Lê eve, ji ber ku ez bi koka xwe ji medreseyê û piştre ji Îmam-Xetîbê hatime û min di zaroktiya xwe de ku bi kurdî jî xwendiyê, niha ez çî naverok û babet meqale binivîsinim, ez hiç zahmetî tê de nakişînim. Di rastiyê de bivê nevê mirov dikişîne û li ferhenga merhenga dinêre. Yanê çî kesê/kesa ku ji zaroktiya xwe ve di nava xelkê de mabe û bi kurdî peyivîbe, ew bi hêsanî dikare romana xwe bi kurdî binivîsîne, hiç zahmetî jî nakşîne.

- *Wexta kêmasî hebe, divê metod çî be? Hinek dibêjin, divê mirov kelîman çêke. Lê wexta herkes ji aliyê xwe ve kelîman çêke, wê wextê wekî tê gotin zimanê "çivîkan" derkeve. Di vî warî de baweriya we çî ye? Divê mirov bi xwe çêke, yan jî orijînalê wê bi kar bîne heta ku kelîmeke muşterek bê dîtîne? Yan jî erebî, tirkî bi kar bîne?*

Zinar: Keko, eger mirov bi xwe kelîmeyan çêbike, ew gunehkariyê herî mezin e ku mirov dike. Destûra tu kesî tune ye ku rabe kelîmeyan ji ber xwe ve çêbike û bike malê millet. Kesek wexta tiştêkî dinivîsîne, eger bêjeyek neyê bîra wî, dikare bipirse. Ev sazgehên ku îro hene, mîsalen "Civînen Kurmancî yê Enstîtuya Parîsê", ez bi xwe jî 18.19 caran beşdar bûme, em 17-18 kes ibûn, me bi xwe jî newêribû ku bi serê xwe kelîmeyekê çêbikin. Heta ku ferheng hene, em digerin. Eger di kurdî de tunebe, em digerin li zimanekî nêzî kurdî ka tiştêkî weha heye yan ne. Yanê divê mirov orijînalê kelîman binivîsîne, wexta ku kurdiya wan tunebe, heta wextekî ka kelîmeyê maqûltîr ku bê dîtîne.

- *Projeyên we yê pêşerojê çî ne? Çi ji aliyê kitêbên ku li ber çapê ne, çî jî ji aliyê*

bi tevayî başkirina karûbarê weşanxaneyê.

Zinar: Xeynî projeya klasikên kurdî û projeya folklorê kurdî ango Projeya Xwençeyê, min du proyeyên din jî çêkirine. Yek ji wan ev e ku, ez dê ji çirokên ser heywanan, yên wekî fabil bi resim ji bo zarokan bidim çapkirin. 15-16 hebên wusa min bijartine. Min yek ji wan çap kiriye jî. Projeka din jî, ez dê lêkolîneka giştî li wan herêmên ku kurmancî lê tê axatin, bidim kirin. Weke ku bi tirkî dibêjin, "arama", "tarama". Tiştên kurdî çi hebin, yên devkî, nivîskî, ez ê wan dê bidim berhevkirin û li Stockholmê wana wergerînim tipên latînî, yan jî ger latînî bin em dê bikin wek forma kitêb û çap bikin. Li her perçeyekî Kurdistanê avakirina çapxaneyekê jî di nav armancên me de heye. Li Anqerê, li Şamê, li Bexdadê, li Tehranê û li Awrûpayê çapxane avabibin. Ji bo nivîskaran bi erzanê kitêban çap bikin. Wexta dewleteka kurdî ya demokrat ava bibe, Pencînar dê hemû tiştên xwe dewrî wê bike.

Berpirsîyarê Weşanxaneya Haykurdê, Ahmet Cantekin: "Pirsgirêka mezin rewş e"

Weşanxaneya Haykurd di 23.11.1987'an de li ava bûye. Weşanxanê bi piranî kitêbên ji bo dersê weşandine. Berpirsîyarê weşanxaneyê, birêz Ahmet Cantekin, li ser karûbarê weşanxaneyê bersiva pirsên me da.

1. Pirsgirêkên çapkirinê bi rewşê ve girêdayî ne. Di destpêkê de kompûtira min tunebû. Min bi makîneya pênivîsînê dinivîsî. Dûre bi makîneya kopyeyê mezin dikir û rûpelên wê amadeyî çapê dikirin. Karekî bi êş bû. A niha Power Macintosh min heye. Lê a niha jî min armancên pir bilind dane pêşiya xwe û ji hêla têdayiyê ve amadekirina pirtûkan ne gengaz e. Çapxane pirtûkan çap dikin. Lê pirsgirêk ta çapê amadekirina pirtûkan e. Divê meriv piralî bihizire. Ev jî xwandin, hizirîn û tecrûbe dixwaze. Pirtûkên dersê amadekirin, ne ewqas rihet e. Ji bo min pirsgirêka mezin rewş e.

2. Pirsgirêkên belavkirinê bi armancên merivan ve girêdayî ne. Em dizanin ku kurd naxwînin. Adeta xwandinê li ba kurdan tune. Ji ber vê jî belavkirin ne pirsgirêk e, nexwandina kurdan pirsgirêka mezin e. Merivên ku dixwazin bixwînin, zarokên xwe hînî zimanê xwe yê zikmakî bikin, pirtûkan peyda dikin.

Kêm kes bihayê pirtûkan didin. Lê sedî nodûneh bê pere dixwazin. Di ser de bihayê posteyê jî didim. Kesên ku bixwazin peyda bikin, dipirsin. Eger dezgeh, firosgeh hebin jî pirtûk nêzîktirî xwendevanan dibin. Eger em dev ji vî karî bernadine û dikine, hoya wê armanca me ye. Em mecbûr in ku xelkê xwe hişyar bikin. Zarokên xwe perwerde bikin. Bila bixwînin û wek merivên azad bihizirin

û bijîn. Bi xwe bawer bin. Nebin murîd. Merivên nezan û kar nakin, ji tiştêkî re nabin.

3. 'Pênc sehkarên me' di 1987'an de û 'Bihizire, bigere û bibîne' jî di 1988'an de, -wek çend pirtûkên din- 300 tene hatin çapkirin. Lê ta niha ev herdu qediyane. Dibe ku pirtûkên min ne baş in, yan jî kurd û xwandin! Min herwiha anons jî daye rojnameya Armancê. Med-TV bêyî ku ji min bipirse, bi pirtûk û materyalên min reklama xwandina zimanê kurdî dike, lê nîşanî merivan nade ku kîjan nivîskarî ew nivîsîne û kîjan weşanxaneyê ew çap kirine! Ev jî çalakiya wan e. Piraniya merivên me bê pere dixwazin, mîna ku pirtûk jî bê pere têne amadekirin û çap kirin. Ev jî heye, dibe ku rewşa wan ya aborî dest nade! Em ê alîkariya wan bikin, ta ku ew dewlemend bûne. Meriv divê di tengasiyê de bi destên hevûdu bigirin. Çavên me li perwerdekirina zarokên me ne. Ew hêviya me ne. Eger ez alîkariya zarokên me nekim, kî dê bike? Weşanên Haykurd bi vî awayî dihizire.

4. Hemû meriv ne wek hev in. Yên ku spas kirin û yên ku devên xwe xwar kirin jî min dîtin. Gelek dê û bavan destegul jî dan min. Du gotinên xweş, merivan pirtir dişidînin. Nameyên xwenezanan, tirsokên ku newêrîbûn navên xwe binivîsinin jî hatin.

Min rewşa kurdan zanibû. Ji ber vê jî min çav berda zarokan. Bi plan û program. Pirtûkên biçûk, bi wêne, çend hevokên biçûk û erzan. Armanca min ew bû ku zarok bibin xwediyên pirtûkan. Biçûk bin ku jê netirsin. Nivîsar hindik bin ku bikaribin bixwînin. Yek jî şîreta ku pirtûkên xwe nevêjin, neqetînin... Di vir de cîhê gotinê ye, hîndekearbûna min di vir de roleke mezin û girîng lîst. Ez û şagirt em li ba hev bûn. Me hevûdu hîn dikir. Heft salan li zanîngeha Stockholmê û du salan jî li Xwendegeha Hîndekearan ya Bilind a Stockholmê xwandina min; herwiha xwedî duzarokbûna min, alîkariya min kir û dike. Ez hemû zarok, dê û bavên delal spas dikim.

5. Qalîteya çapa pirtûkên min, bi rewşa min ve girêdayî ye. Min li jor piçekî diyar kiribû. Nebûna kompûtîrê û nebaşbûna rewşa min. Min ta niha bi tenê ji bo pirtûkekê kron ji dewleta Swêdê deyn kirine û deynê xwe jî her ku pirtûkan difroşim, didim. Ez pirtûkan bi kronên ku her meh didim ser hev çap dikim. Ev jî zemanekî dûr û dirêj digire. Weşanxane bi vî awayî nayên meşandinê. Ev awayekî pêşdeneçûyî ye.

Ji aliyê têdayiya pirtûkan ve, meriv dikare gelek tiştan bêje. A niha di dest min de pirtûkeke xwendin, nivîsîn û rêzimanê heye. Ev çar sal in ku ez li ser dixebitim. Min heft caran guhart û gelek zemanê xwe dayê. Lê hîn jî ne amadeyî çapê ye. Nivîsîna pirtûkên dersê zehmet e. Bi giştî qalîte û têdayiya pirtûkan dikaribû baştir bibe. Lê baştir e ku yekî zana li ser wan dîtînen xwe bêje.

Kêmasî û şaşitiyên ku di pirtûkên min de hene, herçiqas ku pir nebin jî ji nezanîna min e. Ez neçûme kurseke pirtûk çêkirinê û wêne xêzkinê. Ez xwe bi xwe têgihîştîme. Di 1986'an de min Xwendegeha Hîndekearan ya Bilind qedand. Pirtûkeke dersê jî bi zimanê kurdî tunebû. Rewşê ez mecbûr kirim ku him hîndekear bim û him jî bibim nivîskar. Min bi xwe di zaroktî û ciwantiya xwe de, ti pirtûkên kurdî nexwandin ku tunebûn. Lê diya min û hîndekear û birayê min

î hêja Reşo Zîlan kurdiya min dewlementir kirin.

6. Ez kurdî dizanim. Keftelefta min ji bo naskirinê ye, lê !.. Li gor zimannasekî me verb û predîkat yek in (!). Verb: listin, predîkat: dilîze. Li gor yekî din jî verb, (kar, likar) e û predîkat jî lêker e. Li gor yekî -an û -ên navdêran pirhejmar dikin û li gor yekî din jî -an, -ên û -in pirhejmar dikin. Çend nivîsarên zanistî bi kurdî hatine nivîsîn? Dema ez pirtûkan werdigerînim kurdî, dikevim tengasiyan. Ev bêtirî deh salan e ku ez pirtûkên pir kesan berî ku herin çapê dixwînim û rast dikim. Gelek pirtûk, kovar û rojnameyên bi kurdî tijî şaşitî ne. Gelek ji wan nayên xwandinê. Herwiha hundirê wan vala ye. Hemberê gelek peyvên tune. Rêzimanêke paqij tune ku meriv lê binihêre. Kurdî hîn 'aj' e, nebûye dar. Zarok divê bixwe ku mezin bibe. Lê 'tarzankî' jî nabe.

7. Ez du karan dikim. Hîndekarî û nivîsîna pirtûkên xwandina zimanê kurdî. Pirtûk û kovarên li ser perwerdekirinê jî dixwînim. Bêyî xwandinê nabe. Ez divê bizanim ku li dorhêlên min çi dibe. Hizirîn jî banîyê xênî tîne holê. Di materyalên dersê de, Weşanên Haykurd pêşeng e. Ta ku ji dest min hatiye, peyvên biyanî bi kar nayim.

Ji 1991'an û vir de, min tiştêkî xwe çapnekiriye. Yek, rewş û yek jî ji karê xwe nerazîbûn ji bo min pirsgirêk in. Min li ser gelek babetan pirtûkên xwandina zimanê kurdî li gor sinifan amade kirine. A niha hejmara wan 57 in. Ez hîndekariya şaşsaliyan ta gymnasiyê (lîseyê) dikim. Ev hemû materyal dixwazin. Dezgeheke me tune ku bêje fermo. Ji ber vê ez mecbûr dimînim ku bi xwe amade bikim. Pênc rojên hefteyê kar dikim, tev swêdiyan beşdarî civînan dibim û ji pêşveçûyînan hayadar im. Herroj hîn dibim. Zanabûn jî hêza min e. Yek jî pirtûkên dersê divê rast bin. Li gor daxwazê nabin. Hinekan nivîsiye ku rûyê Kurdistanê 500.000 kîlometre çarçîqil e. Xelk dipirse 'Gelo te li kû pîva? Te bi çi pîva?

Eger ez bikaribim, ez ê zarok û ciwanan bigihînim pirtûkên xwandin û xebatê. Ji karê hîndekarî û amadekirina pirtûkan, ji weşanxaneyê re pir zeman namîniye.

8. Eger pirtûkên weşanxane çap dikin bèn firotinê, ew dê çalaktir bibin. Têkîliya di navbera weşanxaneyan de jî dê baştir bibe. Lê pirtûkên bi kurdî divê bèn xwandinê. Wek nimûne: pirtûka Cîgerxwîn "Jînenîgariya min", bi kurdiyekê hatiye nivîsîn ku rêziman tê de wenda bûye. Pirtûka "Tarîxa Edebiyata Kurdî 1 û 2" ya Prof. Qanadê Kurdo ku ji hêla Roja Nû ve hatiye çapkirin, nayê xwandinê. Şagirtên min yê gymnasiyê dixwazin bixwînin, lê fehm nakin. Weşanxane jî divê bizanibin ku çi çap dikin. Her partî weşanxaneya xwe heye; herwiha kesên serbixwe jî mecbûr mane ku weşanxaneyekê ava bikin ku pirtûkên xwe çap bikin. Rewşa weşanxaneyan jî wek rewşa eşîretan e. Min ta niha ti danûstandin di navbera weşanxaneyan de nedîtiye. Lê em wek weşanxane dikarin kampanyayên cihê cihê li dar xin. Ji bo vê jî başbûna rewşê pêwîst e. Di vê rewşê de jî çûyîn ji hatinê zêdetir e. Ji ber vê jî ez tim jî kîsik dikim ser. Fîrma bi vî awayî nikarin bixebitin û nikarin karekî baş jî bikin.

Berpirsiyarê Weşanxaneya Sara, Goran:

”Problema herî mezin, tûnebûna sermiyanê ye”

Weşanxaneya Sara di sala 1987'an de li Stockholmê ava bûye. Heta nuha 48 pirtûk weşandine. Berpirsiyarê weşanxaneyê, birêz Goran bersiva pirsên me da.

1. Gelş û problemên çapkirinê hinde pir in ku nayêne jimartin. Problema harî mezin, tûnebûna sermiyanê ye.

2. Gelş û problemên belavkirinê jî weke rewşa siyasî ya kurdî ye. Çi weşanxaneyên kurdî di gel yê mayî hevkarîyê nakin. Xwe hevxeatkar nişan didin, lê derfeta pêşî de xapandinê dikin. Li dij hev radiwestin û pirtûkên hev belav nakin. Dixwazin derbeyên siyasî û îktisadî li raqîbê wan keve. Her kes dixwaze navê xwe tenê bilind bike û çî nav jî bi tenê berz nabe.

3. Di gel van dijwariyan, weşanxaneya Sarayê, hem pirtûkên xwe û hem jî pirtûkên hemû weşanxaneyên din ên kurdî, li gelek ciyên girîng ên dunyayê belav kiriye. Ji sala 1990'î û vir de, Sara korrespondentê The Library of Congress û Harvard College Library ye. Sara bi şêweyêke profesyonel korrespondentiya ciyên wisan dike. Li dunyayê li çî ciyê dibe bila bibe, çî pirtûkên kurdî derkeve ji Sarayê tên xwastin.

4. Weke min li jor jî got pir dijwar e. Bi şêweyêke profesyonel çap û belavkirina pirtûkên kurdî, li tarîxê cara yekemîn pêk tê. Ji ber vê yekê jî, bi şêweyêke tîcarî bazirganî li pirtûkan temaşekirin, ji gel re pir dijwar dihat. Ne dipejirandin. Ticaret bi pirtûkên kurdî ji xwe nayête kirin û ew derfetên heyî jî kor bûne.

5. Naveroka weşanên kurdî, hem ji hêla rêzimanî, hem ji hêla babet pir daketî ye. Sedem jî ew e ku karguzariya weşandina pirtûk û kovarên kurdî di serdema xwe ya destpêkî de ye.

6. Di vî warî de min xwe gelek westandîye û kêmasiyên xwe kêma kirine.

7. Nuha sê pirtûkên me ji bo çapê amade ne. Yek ji wan, pirtûka Mele Mehmûdê Beyazidî, ”Adat û Rûsûmetnameyê Ekradiye” ya û dê bi orîjînalê wê bê çapkirin. Ya din şiklê drama ya Şahmaran e û dê swêdî derkeve. Şahmaran dê wekî forma helbest (bi kurmancî) jî derkeve.

Pêwist e, siyasetmedariya kurdî bi giştî, xwedî li vî karî derkeve. Heger weşanxaneyek ne bi siyasetekê re be, dijminatîya wê divê neyête kirin, bêhtir astengan li pêşiyê neyête derxistin. Em ji bo milletê kurd hemû xebatê dikin.

8. Weke min di xalên jor de jî behs kiriye, pêwendiyên ku hene pir sist û lawaz in, yan jî çî nîn in. Heger weşanxaneyên kurdî dixwazin piştgiriyek ji bo xwe saz bikin, divê dev ji dijmintîya hev berdin.

Berpirsiyarê Weşanxaneya Welat, Hesênê Metê:

”Nivîskariya zimanê kurmancî di roja îroyin de pere nake”

Weşanxaneya Welat di sala 1988'an de ava bûye. Heta sala 1994'an 12 pirtûk weşandine û piştî wê jî li gor agahdariya berpirsiyarê weşanxanê birêz Hesênê Metê karûbarê weşanxaneyê hatiye sekinandin. Ji bo pêşerojê Metê naxwaze ji nuha de tiştan bibêje û ji ber vê yekê jî, bi rewşê ve girêdayî dibêje ”Xwedê mezin e.”

- Birêz Hesênê Metê, armanca damezrandina weşanxaneya we çi bû?

Metê: Ez ji birayê xwe re bibêjim. Ya rastî raman û daxwazeke me ya wusa bilind ji damezrandina weşanxaneyekê tunebû. Em hemû pê dizanin ku li dunyayê, di nava gelên din de damezrandina weşanxaneyekê jî ramanêke bazirganiyê ye. Me pir dixwest ku weşanxanên me kurdan û nemaze ya me jî bi ramanêke weha ava bibûya. Lê mixabin. Daxwaza damezrandina weşanxana me jî weke gelek weşanxanên me kurdan li dor idealekê bû û weke hobî jî li dar ket. Îdeala me ew bû ku em ji aliyê kalîta form, estetîk û navaroka pirtûkan de normekî ava bikin: Sembolîk be jî, kêm be jî me xwest em di nava xwendevan, nivîskar û weşanxanê de tradisyoneke înternasyonalî bi kar binin.

- Gelo hûn di vê daxwaza xwe de bi ser ketine?

Metê: Di vê îdeala xwe de wek Weşanên Welat çî ji destê me hat, me kir. Em bi nivîskarên xwe re ketin heftûheşta peran. Gerçî wan bi xwe doz û daxwaza peran li me nedikirin, lê me hertim pîvana perekî dida ber wan, me dixwest em wan haydar bikin û binin bîra wan ku nivîskariya wan jî pere dike, an jî divê nivîskariya wan jî pere bike. Lê tiştêkî wusa tuneye. Nivîskariya zimanê kurmancî di roja îroyîn de pere nake û pere nake. Di vî warî de em hustuyê xwe di kêrê re didin.

- Yanî ji bo keda nivîskarên xwe we pere dane wan?

Metê: Ji bo me serbilindiyê mezin bû ku me nivîskarekî xwe bi pere bikira. Ez naxwazim wan bi nav bikim, li gel ku wan nedixwestin jî, perên du nivîskarên me gêhiştin destên wan. Nivîskarekî me çeka peran bi şûn de li weşanxanê vegerand, yekî jî tew nexwest em jê re çeka peran bi rê bikin.

- Serî her berhemekê we çiqas pere dane nivîskarê xwe?

Metê: Gotin şerm e, lê wek prensîb serî berhemekê em bibêjin me 5000 hezar kron dane wan. Wek ku tê famkirinê jî ev tenê perê qelemeka wan, ne perê karê qelema wan bû. Me xwest ku nivîskar weke xelat ji xwe re pê qelemekê bikire, ne ku keda qelema wî ewqasî erzan e. Aliyê me î herî baş jî belkî ev pere bû ku me dixwest em têxin rojeva weşangeriyê.

- Di sohbetê de te got ku, ”me dev jê berda.” Ji bo çî we dev jê berda?

Metê: Ez newêrim bibêjim, lê bi min wusa tê ku di roja îroyîn de pêwîstiya weha tune ye û di vê rewşê de ez ruh û îdraqiye teke weha li ba xwendevanê kurmancî nabînim.

- *Ruhekî çawa?*

Metê: Ruhekî yahûdiyane, ruhekî ku dibêje divê em jî bi qasî xelkê li zimanê xwe, li dar û kevirê xwe xwedî derkevin, ruhekî ku dibêje bi qasî xelkê pêwîstiya me jî ji zimanê me heye. Ji bo vê yekê ne pêwîst e ku meriv welatparêz an jî maqûl bin. Li gor lêkolîneran dîroka nivîsê xwe digêhîne heft hezar sal beriya nuha, piştî du salên din em ê van du hezar salên piştî Mesîh jî li pey xwe bihêlin, ku hîn jî ruhekî weha, têngîhîştineke weha li ba me peyda nebûbe heye. Ez bi xwe bi vê yekê dêşim û bi min wusa tê ku di piraniya warên jiyanê de ne weke indîvid lê weke civak, em hîn jî ecemiyên jiyanê ne, em hîn jî ecemiyên vê dunyayê ne.

- *Problemên we û çapa pirtûkan çi bûn?*

Metê: Ji bilî astenga aborî heta wê dema ku me pirtûkek bida çapê jî problemên me tune bûn. Lê problem dûre derdiketin. Em bihêjin: me nikanîbû em pirtûkan belav bikin. Lê ku ez bersîveke rastir bibêjim pirtûk belav nedibûn û nabin. Belavkirineke ku ez dibêjim û dixwazim, îro di nava me de tune ye. Ez ne bawer im ev yeka ji bêkêriya weşangeriya me ye. Kêm zêde ev tişt ji bo hemû weşanxanên zimanê kurdî wusa ye.

- *Ji her pirtûkekê we çend heb çap kirine û we çend heb belav kirine?*

Metê: Ji van pirtûkan du sê libên wan me bi hejmareke hezarî çap kirin. Lê yên mayî me ji her yekî wan pêncsed lib çap kirin. Ku em belavkirina li dost û nasan, diyariyên ji bo arşîvên dezgeh û maqûlan, wan çend libên (5-10 lib) ku me firotin pirtûkxanên Swêdê jî nebêjin, me pirtûk belav nekirine û me nefirotime. Hemû li depoya me ne.

- *Çi negatîf û çî jî pozîtîf, reaksiyonên xwendevanan çawa ye?*

Metê: Ji bo kalîta form, estetîk û navarokên pirtûkên weşanên me, çend nameyên pir giranbuha ketin destê me. Ev ji bo me kêfxweşiyek bû û hîn jî serê me di ber de bilind e. Lê bi rengê negatîfî kesekî tiliyên xwe di çavên xwe re nekirine û ji me re negotine: hûn çima pirtûkan çap dikin!

- *Ji aliyê kalîta çapê û naveroka kitêban dîtina we çî ye? Ger kêmasî yan jî çewtî hebin, li gor we sebebên van çî ne?*

Metê: Li gor kêmhjariya berhemên ku têne çapkirin, ji aliyê kalîta çap û naveroka xwe de gelek tiştên sivik û bêmane jî di nav weşanên kurmancî de çap û belav dibin. Sedemên vê yekê jî dîsa tunebûna xwendevan, rexnegir û baleke ji bo van tiştan e. Weke kalîta berhemekê: hûnandin, hesasiyet û berpîrsiyarî tune ye. Bi min wusa tê ku pîvana hejmara pirtûkan di serê gelek nivîskarên me de bi cî bûye. Ji dêlva ku bibêjin pirtûkek çî û çawa ye, tê gotinê ku pirtûka çendan e. Pîrî caran weşanxane jî, ji bo ku îdeal e, ne dezgehekî bazirganiyê ye, ji ber hinek sedemên diyar û ne diyar radibe li gor îmkanên xwe tiştan çap dike. Ev yeka jî ne di edebiyatê de sewiyekî ava dike û ne jî ji hêla çapê de kalîtekê çêdike. Lê pir kême jî ji hêla kalîta çap û navarokên xwe ve berhemên hêja jî hene.

- *Hûn di karê weşandinê de tûşî zehmetiyên ku ji kapasîteya zimanê kurdî dihatin, bûn an ne?*

Metê: Di karê weşandinê de karê me weşandin bû. Ji bilî hinek pêşniyaran, pêşniyarên ku me dizanibû ew ê berhemê baştir bike, em têkilî zimanê niviskar an jî wergêr nedibûn.

- *Ma fikra we ya ji nû ve destpêkirin û başkirina weşanxanê tuneye?*

Metê: Anuha tişteki me î wusa tuneye. Lê roja ku pêwîst bike, em bibêjin Xwedê mezin e.

- *Di warê danûstandina weşanxanên kurdî de hûn çi difikirin. Problem çi ne û çawa dikarin çareser bibin?*

Metê: Problema mezin ew e ku weşanxanên kurdî bi statuyeye weşanxanan ava nebûne, bi ramanên bazirganiyê çênebûne. Di avabûna tevayiya weşanxanên kurdî de du raman, du karakter, du karîyer, du fenomen xuyane. Yek: weşanxane bi mentalîte û riya rêxistin an jî partiyeye siyasî ava bûye. Dudu: weşanxane bi îmkân û daxwaza niviskarekî ava bûye. Ev yeka ha ne çewtî û ne jî kêmasiyek e. Ev rastiyeke e û em dijîn. Lê ev herdu faktumên avabûna weşanxanê jî te bivê nevē probleman çêdike: problemên karîyerî, komlexî û heta derekê îdeolojîkî. Li gel van hemû astengan jî pêşangehên muşterek, ji bo belavkirinê ciyên muşterek dikane vebin, lê tu ji min bipirsî ev jî ne çareseriyeye bingeîn e. Roja ku bazirganek ji xwe re hesabekî çêke û bibêje: fêda min di weşangeriyê de zêdetir e, a wê çaxê ez ê bibêjim rewşa me baş e.

Berpirsiyarê Weşanxaneyê Apec, Ali Çiftçi: ”Divê koordînasyonêk çê be”

- *Weşanxaneyê we çi wext ava bû? Pêwîstî çi bû?*

Çiftçi: Weşanxane di sala 1988’an de avabû, Pêwîstiya ku min bi xwe dît, bi kurdî weşandina pirtukên zarokan bû. Yek ew bû. Ya didoya jî pirtukên dersê bûn. Ew li Swêdê kêmbûn. Ew du tişt di serê min de hebûn.

Dema ku min dest pê kir, min xwest bingehekî baş avabikim. Tenê weşanxane ne bes bû. Çapxane jî pêwîst bû ku bikaribe kitêbên weşanxaneyê çap bike.

- *Çapxane çi wext ava bû?*

Çiftçi: Ew jî 1988’an de ava bû. Ji ber tunebûna peran berê em mecbûr diman ku dev ji weşandina hin kitêban berdin. Me çapxaneyêke biçûk ji swêdiyan kirî û dest pê kir. Îcar ew bû sedemek ku di 10 salan de me zêdeyî 110 kitêb weşandine.

- *Problemên çapkirinê dibe ku ji bo we ne zêde bin. Lê ji bo bingeheke pêşketî rewş çawa bû?*

Çiftçi: Tebî di destpêkê de gelek zahmetiyên me hebûn. Çapxaneyê me biçûk bû. Aborî têrê nedikir. Sal bi sal me kapasîte zêde kir. Nuha çapxaneyek me heye ku em dikarin hemû babet kitêban çap bikin. Li gel zahmetiyên aborî, ji aliyê ziman jî zahmetî hebûn. Redaksiyoneke me ya bi rêk û pêk tunebû. Yanê em bêjin, çend heval hebûn, bi alîkariya wan me hinek kitap weşandin. Carnan kêmasiyên mezin jî çêdibûn. Heta sala 1990î jî wexta em dinerin, ji aliyê redaktorî de kêmasiyên me gelek bûn. Ew problem îro jî hîn sedî sed hel nebûye. Ew bi temamî ne girêdayê redaksiyonê ne, girêdayê problema zimanê kurdî bi xwe ne.

- *Ji ber ku şirketeke yan dezgeheke belavkirinê tûne bû, kifş e ku zahmetî di vî wari de hebû. Gelo we problemên belavkirinê çawa çareser kirin?*

Çiftçi: Meseleya belavkirinê, rast e problema hemû weşanxaneyan e. Ez bawer dikim li welat jî wusa ye. Kitêbên ku li Îstenbolê tîn weşandin, ji Îstenbolê dernakevin. Pirsê belavkirinê li welat, problemeke siyasî ye. Lê li dervayê welat ew problem teknîkî ye. Sedema yekemîn, li gor baweriyên min, tunebûna hevkarîya navbera weşanxaneyên kurda da ye. Kes nikare bi serê xwe belavkirina kitêban hel bike. Ji bo vê jî hevkarî lazim e. Me bi xwe hin gav avêtine. Ya din jî rewşa aborî ye. Lê Swêd du kitabxane yên kurda hene, Yek ya Sara Bokhandel û ya din jî ya Kitab-i Erzan e. Li ba wan kontrata me heye, kitêbên me difroşin. Li Almanyayê jî Dilan Kitab-Muzik, li bajarê Hamburgê kitêbên me bo hemû Ewropayê belav dike. Dervayê van, çend komeleyên kurdan, wekî Enstîtûya Berlinê, Enstîtûya Kurdî ya Parîsê û KOMKAR jî alîkariya me dikin. Wekî berê nin e. Lê temamî hel nebûye.

- *Wexta mirov rewşa berê bîne li ber çavan di rewşa firotinê de guherandineke berbiçav heye yan ne? Kar ne be jî hûn mesrefan derdixînin?*

Çiftçi: Welle dernaxînin. Bawer nakim ku tu weşanxaneyekî din jî derxîne. Ji ber ku tu çiqas baş bifroşî jî xwendina kurdî kêr e. Firotina kitêbên bi kurdî di navbera 300-500 derbas nabin. Kitabê herî baş jî, hewqas çûye. Girêdayê nasandinê ye jî. Rindo kitêbek ji bo zarokan e. Ji ber ku çend caran di televîsyonê de hatin nîşandan, baş hatin firotin. 400-500 kitêb hatin firotin. Kitêbên ji bo zarokên 2-3 salî baştir diçin. Yê din ne wusa ne. Nizanim çima weha ye, lê dibê ku dê û bav piştî 3-4 salî zêde alaqeder nabin.

- *Baş e, kêmasiya danasîna pirtukan jî tune ye? Weşanxane dikarin reklama xwe bikin?*

Çiftçi: Kêmasî heye. Ew jî carnan girêdayê aborîyê ne. Em sê kes li vir kar dikin, lê, em nagihîjin her tiştî. Esasên divê yek kes tenê bi belavkirina kitêban ve alaqeder bibe. Lê ji bo vê jî pere lazim e. Dîsa tê digihîje pirsê aborî ye. Lê cardin jî dikarin rê bèn dîtin. Me gotiye, weşanxaneyên kurda bi hev ra dikarin şirketeke belavkirinê avabikin, xwediyê wê jî weşanxane bi xwe bin. Em bêjin îro, li Swêd 5-6 weşanxaneyên aktîf hene. Ew dikarin di nav xwe de belavkirinê organîze bikin.

- *Reaksiyonên xwendevanan çî bûn û çî ne? Çî positif û çî negatîf. Tesîrên van çî bî li ser we?*

Çiftçi: Ji bo kitabên zarokan , ji bo zimanê wan tiştên baş tên gotin. Wergerên wan ji aliyê redaksiyonekê da tên kontrolkirin. Kitêbên dersê, yek kitêba tarîxê ye, ji bo sinifên navendî û bilind e, yek jî cografya ye, ji bo van heta nuha tiştên baş tên gotin. Îsal jî me ji bo hînbûna muzîkê kitêbek stran û muzîkê bi herdû zaravayên kurdî, Kurmancî û Soranî weşand. Kitêbên dersê hemû bi tîpên erebî û latînî hatine weşandin. Daxwaz ji Almaniyayê jî hatine. Heta nuha rexneyeke negatîf nehatiye. Ji bo yê lêkolînê jî heta nuha rexneyên pozitif hatine. Demekê ji me ra gelek manusên helbestan dihatin. Me ev paşde şandin. Ew nayê wê maneyê ku em helbestan çap nakin. Me salên 1990, 1991, 1992'yan de hinek derxistin, lê nayên xwendin. Xwendevanên helbestan pir kêman in. Yê edebî, folklorîk, çîrok, ew jî kêman in.

- *Pirsa finansmanê hûn çawa dikin?*

Çiftçi: Piranî me bi xwe finanse kirine. Lê piştî 1992-1993'yan hinek alîkarî ji Daîreya Alîkariya Kulturê ya Swêdê (Kulturrâdet) ê tê. Nuha hinek alîkarî didin, lê ne zêde. Kitêbên ku me ji zimanê swêdî wergerandine bi kontrat dimeşin. Hevalên ku heta niha di redaksiyonê de karkirine, qet pere negirtine, fedekarî kirine. Ew jî zanîn ji alî finansmanê rewş ne baş e. Alîkariya ku Kulturrâdet dide, têrê çapkirina kitêban nake. Salê ger em 10 kitêban derdixînin, alîkariya wan belkî têra 2-3 kitêban dike. Vê alîkariyê nedin jî em ji xwe vî karî dikin, lê cardin jî alîkariyê baş e. Derweyî wê jî pereyê ku ji çapxaneyê tê em didin karê weşanxaneyê.

- *Baş e, em werin pirs qalîteya çapê û naveroka kitêban . Berê mumkun e ku hema çi hat çap bû. Lê nuha hêdî hêdî qalîte û naverok tê munaqesekirin. Dîtina we çi ye? Di vî warî de ger kêmasî yan jî çewtî hebin, li gor we sebebên van çi ne? Gelo xwendevan mecbûr in ku xwedî bi her tiştî derkevin, ji bo ku kurdî ye?*

Çiftçi: Va sê salên dawî em li ser vê pir sekinîn, wek te jî got berê ziman tenê têrê dikir. Lê Nuha naverok girîng e. Dibe ku ji ziman jî girîngtir e. Me di nav van sê salên dawî de nêzî 30 kitêb paş de wegerandin. Sedem jî piranî yê naverokê bûn. Carnan navê lêkolînê û naverok hevdu nagre. Tu dinerî li ser dîrokê lêkolîn hatiye kirin, tê de lêkolîner şîr yan jî bîranînên xwe jî kirine navê. Weha nabe. Divê li gor hin ûsil û qaîdeyan bin. Yanê va du sal e em pir dîqqat dikin. Hevalên ku di redaksiyonê de kar dikin, ew jî vî tiştî zanin.

- *Hûn di karê weşandinê de marûzî zehmetiyên ku ji kapasîteya zimanê kurdî dihatin, bûn an ne?*

Çiftçi: Problema zimanê kurdî ya herî mezin. ku wek zimanekî resmî yanê sereke nehatiye bikaranîn. Dema zimanek tenê di nav malê de wek zimanê rojane bê bikaranîn, nikarê pêşkeve. Ziman, dema vek zimanê serdest, fermî hat bikaranîn dikare xwe li gor dema nû pêşbixîne, di aliyê termînolojîyê de dewlementir bike. Ji ber ku zimanê kurdî wek zimanekî fermî nehatiye bi karanîn di aliyê termînolojîyê de pêşneketîye, meriv dikare bêje termînolojîyek wekhev di zimanê kurdî de çênebuye. Dema tu bixwazî tekstekê bi kurdî ku ji bo hemû kurd lê fêm bikin binivîsînê helbet di aliyê termînolojîyê de zehmetî derdikevin pêşîya

te. Di wergerandina kitêbên zarokan de em pir caran zehmetiyên vê meselê dikşînin. Carnan hevalên ku werdigerînîn zorê didin xwe ku xas kurdî be. Lê li gor bawerîya min ew çewt e. Divê xelk jê fêm bike. Pêwist be meriv dikare kelîmeyên tirkî, erebî û farisî jî bikarbîne, yan jî wek ewropî dibêjin, deyn bike. Navê heywanan wexta tune be em latîniya wan tercîh dikin ku hemû kurd bikaribin fêm bikin. Ger hin kelîme di ziman de rûniştibin, em bikartînin. Em li gel wê nin in ku her weşanxane, çapxane ji xwe re kelîmeyan çê ke. Li welat be hin îmkân hene, lê vir nabe.

- *Projeyên we yên pêşerojê çi ne? Çi ji aliyê kitêbên ku li ber çapê ne, çi jî ji aliyê bi tevayî başkirina karûbarê weşanxaneyê.*

Çiftçi: Niha bingehek çêbûye. Bi taybetî jî ji bo kitêbên zarokan, ez pir giring dibînim, bazarek ve bûye. Em dê giranî her bidin kitêbên zarokan. Niha em bi sê zaravayên kurdî, dimilî, kurmancî û soranî diweşînin. Ji bo lêkolînan jî hinek projeyên me hene. Plana me ya herî mezin, bi weşanxaneyên din re pêkanîna civîneke mezin e. Kêmasî koordînasyonek di navbera wan de çêbe. Ji bo vê jî programeke me heye. Ger di van civîna de em ser bikevin, belkî hinek tiştan em dê bikaribin bi hev re bikin. Wek mîsal; va du sal in ku hemû weşanxaneyên kurda yên li Swêdê ne, bi hev re pêşengeha kitêbên kurdi amade dikin. Hêvî heye ku di salên pêş de li hemû Ewropayê pêşengehên wisa bînin amadekirinê.

- *Ji bo ku weşanên we herin welêt tu projeyên we hene?*

Çiftçi: Ew her heye, lê di rewşa niha de zahmet e. Me çend caran kitêb şandine, piştî demekê disa li me hatine wegerandin. Daxwaza me ew e ku li wir belav be. Mesele, meseleya peran nin e, ger belav bibin baş e. Va salên dawî me kitêbên bo zarokan, ji bo ku li welêt bînin belavkirinê heqê belavkirinê da rojnama *Özgür Politikayê*. *Özgür Politikayê* jî ji bo xwendevanên xwe beleş belav kir. Niha jî rojnama, *Ülkede Gündem* wî karî dimeşîne.

- *Tiştêke din?*

Çiftçi: Di warê belavkirina weşanan de, divê merivên kurd teng nefikirin, ev tiştêkî netewî ye, herkesî jî girê dide. Ji bo vê jî divê koordînasyonek çê be.

Berpirsiyara Weşanxaneya Komeleya Jinên Kurd, Novîn Harsan: "Qalîteya şiklî girêdayî rewşa aborî ye"

Weşanxaneya Komeleya Jinên Kurd li Swêdê di sala 1988'an de ava bûye. Heta nuha 6 kitêb weşandine. Berpirsiyara weşanxaneyê, xanim Novîn Harsan bersiva pirsên me da.

1. Problemên çapê gelek babet in. Yek ji van, ê aborî ye û ev girêdayî peran e.

Ji welat dûrbûyin jî problemekî ye.

2. Problema belavkirinê, yek ji problemên herî giringtir e. Em bi xwe belav dikin, di ser de jî pere didin. Yên ku em dişînin welat jî gelek caran nakevin destê xwendevanan. Yên ku dixwînin jî hindik in, ji ber vê jî dezgehên belavkirinê der nakevin.

3. Kitêb zêde nayên firotinê, gelek belaş diçin. Kitêbxaneyên swêdî hindik dikirin. Ger îmkanên me çêbin, em dixwazim bişînin welêt. Em ji gelek enstîtû û dezgehên welatên din re jî kitêbên xwe wek diyarî dişînin.

4. Reaksiyonên gelek baş li ser hin kitêban hatin. Wek mîsal, li ser kitêba Reşîdê Kurd. Me berhemên wî qezencî kultura kurdî kirin. Çapa erebî ya Hêsir û Baran jî reaksiyonên baş girtin.

5. Qalîte du şiklî dikare bê şirovekirin; qalîteya hundurîn û şeklî. Qalîteya şiklî ya kitêbên me normal e, hinek ji wan baş hatine çapkirin. Qalîteya şiklî girêdayî rewşa aboriyê ye jî. Qalîteya hundurîn li gor nivîskaran dikare cuda cuda bê şirovekirin.

6. Carnan me hin zehmetî kişandin. Ji bo ku me xwest ji aliyê ziman baş bin, xwendevanên me jê razî bin, hin caran zehmetiyên me çê dibûn.

7. Bi taybetî li ser tarîx û lêkolînên din em dixwazin berheman derxînin. Di gel ku zahmetiyên aborî jî tesîr dikin, ger berhenên hêja destê me kevin em dê çap bikin.

8. Koordînasyon kême. Di warên wek ziman û belavkirina kitêban de dikarin hin gav bîn avêtinê. Em weşanxaneyêke îdeel in û li gor îmkanên xwe em amade ne ku bi hev re gavan bavêjin. Divê em rê bibînin hin berhemên xwe wergerînin zimanên ewrûpî jî. Nizanim sebeb çî ye û herdu caran jî gazî me nekirin, lê cardin jî organîzekirina pêşengehên kitêbên kurdî em gaveke baş dibînin. Weşanxaneyên kurdî jî tê de bi hin aliyên elaqeder mirov dikare fondeke kulturî ava bike ku bikaribe hin projeyan baştir bibe serî.

Berpirsiyarê Weşanxaneya Mezopotamya, Nedim Dağdeviren:

”Daxwaza me weşandina kitêbên bi qalîte ye”

Weşanxaneya Mezopotamya di destpêka sala 1989’an de ava bûye. Heta nuha 8 kitêb weşandine. Berpirsiyarê weşanxaneyê, birêz Nedim Dağdeviren li ser karûbarê weşanxaneyê bersiva pirsên me da.

1. Problemên çapkirinê her tim girêdayê daxwaz û şert û rewşên aboriyê ne.

Daxwaza me her tim weşandina kitêbên bi qalîte ye. Lê rewşa me ya aborî dibe faktorekî sînorkirinê. Li aliyê din jî, divê di bazara weşangeriyê de jî "arz û taleb" hebe. Ji ber ku profîla xwendevanên kurd ne zelal e ku ew dixwazin çi bixwînin û meyla wan a xwendinê -ya ku xûyaye- pir sivik e, ev bi serê xwe zehmetîyeke giring derdixîne pêşiya me. Ez bawerim problemên me yên çapkirinê yên herî mezin ev in.

2. Weşangeriya kurdan, ne li gora organîzebûna aborî ne jî li gora çapemenî û estetîkê profesyonel e. Ji ber ku herkes -çi karî be bila be- "ji bo welat û miletê xwe" dikin, ew rewş bi xwe, li mêydana weşangeriyê kaosekî çêdike. Belavkirina bi awayê profesyonelî, ne bi welatparêziyê ve girêdayî ye. Ew tiştêkî tîcarî ye. Divê du-sê kes bi vî karî mijûl bibin û dezgehêkî hebe. Ev mesrefekî mezin e û tesîr li ser buhaya kitêban jî dike. Divê bûhayên kitêbên me kêmasî du qat zêde bin. Xwendevanên kurd ne hazir in ku kitêbên bi zimanî kurdî bi vê bûhayê bên firotinê. Velhasil, problema belavkirinê bixwe paradoksekî ye.

3. Rewşa firotina ku ne profesyonelî dimeşe, nebaş e.

4. Li ser reaksiyonên xwendevanan jî em pir tiştan nizanin. Du problemên mezin hene: Yek ji van ew e ku, zimanê kurdî ne wek zimanê perwerdekariya resmî ye ku mirov di zarokatiya xwe de bikaribe zimanê xwe yê zikmakî bi awayên zanyarî hîn bibe. Ev tesîr li rewşa xwendina kurdî jî dike. Problema dîyemîn jî nezanîna civata kurd û bilindbûna analfabetizmê ye.

Ji ber ku "xwendevanên" kurd pir kêman in û em jî bi xebata profesyonelî nikarin vê rewşê biguherînin, wisa xûya ye ku dê ev demekî dirêj jî bi vî awayî dom bike.

5. Qalîteya çapê, estetîk û naverok pir nizm e. Tûnebûna daxwazên xwendevanên kurd û sewiyeya nivîskar û rewşenbîrên kurd, li ser kêmasiyên qalîteya çapê û naveroka kitêbên kurdî faktorên herî bingehîn in.

6. Na.

7. Projeyên me yên pêşerojê ev in: Ferhengêkî tirkî-kurdî ku ji aliyê Mehmet Tanrikulu hatiye hazirkirin û li gora zanyariya ziman xebatekî pir hêja ye, di destê me de ye û heta çend mehan ji bo çapê hazir e. Dawîya vê salê (1997-OA) em dest bi rêzeke bi navê "berhevkirin û lêkolînên folklorê kurdî" dikin. Ev pakêt jî teqrîben ji bist kitêban pêk tê. Herweha kasetên muzîkê ku ev demeke dirêj e li ba me ne û me li gor lihevhatina du alî ji Radyoya Erîvanê girtibûn, em difikirin ku biweşînin.

8. Li gor baweriya min ger em alîkariya weşanxaneyên ku çî li Swêdê çî li Tirkiyeyê, wekî mîsal Nûdem û Avesta ku karûbarê weşangerî bi awayekî ciddî û profesyonelî dimeşînin, bikin û prensîbên bidezgehbûyinê pêk bînin, dê weşangeriya profesyonelî ya kurdî pêş de here. Ger hûn zêde feyde neanîna marjînal û yek alîtiya weşangeriya hobyîyê û ya jî weşangeriya di bin tesîrên rêxistinan de bînin li ber çavan, dê girîngiya dezgehbûyinê hîn baş bê fêmkirin.

Berpirsiyarê Weşanxaneya Nûjen, Lokman Polat:
”Problemên çapkirinê ji ber
neçariya rewşa aborî tîn”

Weşanxaneya Çanda Nûjen di sala 1990’î de ava bûye. Heta nuha 22 kitêb weşandine. Çanda Nûjen bi navê “Helwest” kovareke kulturî û lîteraturî jî diweşîne. Berpirsiyarê weşanxaneyê, birêz Lokman Polat di derbarê rewşa weşanxaneyê de bersiva pirsên me da.

1. Problemên çapkirinê ji ber neçariya rewşa aborî tîn. Heger pere hebe hemû problem ji holê radibin. Wê demê mirov dikare bi rehetî pirtûkên ku dixwaze biweşîne.

2. Problemên belavkirinê gelek in. Şirketeke belavkirina weşanên kurdan tune. Her weşanxane li gor îmkanên xwe pirtûkên xwe belav dike. Heqê postê gelek biha ye. Loma jî pir hindik têt belavkirin. Ji bo kurdan şirketeke belavkirinê pêwîst e.

3. Rewşa firotinê baş nîn e. Pirtûkên kurdî herî pir li Swêdê têne firotin. Kutupxaneyên swêdî dikirin. Xwendevanên kurd yên li Swêdê dikirin. Li Almanya, Fransa, Swîsre û welatên din yên Ewrûpê gelek kêr pirtûkên kurdî têne firotin. Li Tirkiyê çiqas tîn firotin ez nizanim. Lê heger naveroka pirtûkê baş be û balkêş be li wir jî dê gelek bêt firotin. Yek ji Swêdê çûbû Mêrsînê û hatibû. Wî digot: “Li Mêrsînê û li Stanbolê ez çûm dikanên ku pirtûk difroşin. Di wan dikanan de herdu pirtûkên te yên ku li Tirkiyê hatibûn çapkirin, Bayê Azadiyê û Rewşa Edebiyata Kurdî, hebûn. Li gor ku dikandar digot herdu pirtûk jî baş hatine firotin.”

Lê dîsa têr nake. Ez dizanim tu pirtûkek kurdî bi firotina xwe heqê mesrefa xwe ya çapê dernaxe. Karê li cihê bêtin, di hemû pirtûkên kurdî de zirar têt kirin. Bazar tune ye. Yên ku bi kurdî pirtûk dinivîsînin û diweşînin ji ber welatparêziya dilê xwe vî karî dikin, ji xwe re wek wezîfeyek netewayî dibînin û loma dikin. Ez bawer nakim tu nivîskarekî kurd ji pirtûkek xwe qezenç bike. Na! Kesek ji pirtûkên xwe pere qezenç nekiriye. Hemûyan jî zirar kirine.

4. Reaksiyonên xwendevanên kurd ji bo kar û xebata kulturî gelek baş in, postîf in. Mirovên dilpak, kesên şoreşger û welatparêz qîmet didin xebatên weha. Lê hinek kurd ên ecêp hene ku karên weha ji destê wan nayê, ew wan karana piçûk dibînin, li gor mentalîta xwe tinazan dikin, tiştan naecibînin. Yanê kurdên weha hesûd jî hene.

5. Qalîteya çapê bi pereyan ve girêdayî ye. Heger pere hebe, qalîteya çapa pirtûkê, bergên wê dikare gelek baş derkeve. Heger pere tune be dê nebaş derkeve. Bergên kovar û pirtûkan yên bi rengîn biha ne. Berg wexta ku bi rengîn be dê xweşik be, bê rengîn be dê xweşik nebe.

Naverokên pirtûkên ku bi kurdî derdikevin baş in. Hinek qelsî heye, lê dîsa jî baş e. Romanên kurdî gelek kêr derdikevin. Hinek ji wan jî li gor pîvana romanên roman nîn in. Lê, di vê hêlê de jî hêviyek heye. Romana kurdî jî ber bi pêş ve diçe. Di hêla pirtûkên li ser zimên û li ser dîrokê de qelsiyek mezin hene. Bi kurdî pirtûkên weha bi tiliyan tên jimartin. Kovarên kurdan yên li ser ziman û dîrokê qet tune ne.

6. Hin pirs hene, lê astengên bingehîn tunene.

7. Weşanxaneya me dê hendî car caran bi tirkî, lê bi pirranî jî pirtûkên xwerû bi zimanê kurdî biweşîne. Hin pirtûk amadeyî çapê ne. Weşanxaneya me ji bo zarokên kurd dê gelek pirtûkên zarokan ên wergêra bi kurdî biweşîne.

8. Danûstendinên di nav weşanxaneyên kurdî yên li Swêdê baş in. Ev du sal in bi hevûdu re pêkanîna fuara pirtûkên kurdî danûstendinên di nav weşanxaneyên kurdan yên li Swêdê hîn xurtir kir. Danûstendin di navbera yên li Swêdê û yên li Stenbolê ewqas tune ne, yan jî germ nîn in. Ji hevûdu hayidar nîn in. Di derbarê weşanên xwe de hevûdu hayidar nakin. Wek mînak weşanxaneyên li Swêdê nizanin weşanên “Avesta” yan jî weşanek din yên kurdan çî kitêb derxistine. Yên li Stenbolê jî ji weşanxaneyên kurdan yên li Swêdê hayidar nîn in. Ew jî gelek sedemên wê hene. Ez naxwazim wan sedeman li vir rêz bikim. Lê, sedem çî dibin bila bibin, divê têkilî baş bin, bi hevûdu re têkiliyên germ daynin.

Berpirsiyarê Weşanxaneya Nûdem, Firat Cewerî:

”Zimanê kurdî têra edebiyatê dike”

- Birêz Firat Cewerî, weşanxaneya we çî wext ava bû, armanca we çî bû?

Cewerî: Weşanxaneya Nûdemê bi awayekî fermî, bi destpêka weşana kovara Nûdemê re ava bû. Mîna tê zanîn, kovara Nûdemê jî di sala 1992an de dest bi weşana xwe kir û hejmara xwe ya pêşî di meha adarê de derxist. Tu ya rastî bixwazî, me pêşî xwe konsantreyî kovarê kiribû. Me dixwest em bi her awayî kovareke bi naverok û di warê estetîkê de mîna yên ewrûpiyan derxin. Piştî ku me çend hejmar derxistin, em êdî têgihîştin ku hewcedarî bi weşandina pirtûkan jî heye. Ji ber ku piraniya nivîskarên kovarê nivîskarên xwedî pirtûk bûn, me jî xwest em pêşî pirtûkên nivîskarên Nûdemê biweşînin. Armanca me hem bi kovarê hem jî bi weşanxaneyê ew bû ku em tenê weşana bi kurdî bikin û berê xwe bidin profesyonelîzmê. Em qîma xwe bi weşaneke kirêt neynin, em kalîteya weşanê bilind bigirin; zimanê ku evqasî zilm lê hatiye kirin, nepak hatiye nîşandan, pakîti û xweşiya wî bi xwendevanên kurd bidin hîskirin û hezkirin.

Mîna kovara Nûdemê armanca me bi weşanxaneyê jî ew bû ku em zimanê kurdî zindî bihêlin, edebiyata kurdî aktuel bikin û meydana serbixwe ji hemû nivîskar û hunerhezên kurd re ava bikin. Ger tu bala xwe bidî kovarê û weşanên

wê, tu ê bi hêsanî herceleb fikir û îdeolojiyan tê de bibînî. Carinan mirovên ku di jiyana rastî de dijminatîya hev dikin, an jî di warê îdeolojî de bi kîlometreyan dûrî hev in, em wan di kovara Nûdemê û weşanên wê de li rex hev dibînin. Ji xwe yek ji armancên weşanxaneya me ya sereke ew bû ku em diwarên dijminatîyê ji navbera nivîskar, rewşenbîr û partiyên kurdan rakin. Ev ziman yê me hemûyan e, em hemû hevparên vê edebiyatê ne, ev kultur e ku me hemûyan li ser lingan dihêle û me dike şîrikên jiyaneke û berê me ber bi yek armancê ve dike. Wê çaxê çima em ê ji hev bi dûr bikevin, çima em ê kevneşopiya dijminatîya eşîrtî neşîkînin û bi riya huner û edebiyatê cîhana xwe ya tijî kirêtî û neqencî ber bi xweşî û geşiyê ve neguherin?

Em dikarin bi kurtî bibêjin ku Weşanxaneya Nûdemê zarok û berdewamiya kovara Nûdemê ye û îro armanca wê ya sereke ew e ku ji avakirina ziman û edebiyata kurdî ya nûdem re bibe piştgir û alîkar.

- *Ya problemên çapkirinê çi bûn û çi ne?*

Cewerî: Problemên herî mezin, problemên maddî ne. Çapxane pir in, çapxaneyên baş jî hene, lê problem maddî ne. Ji xwe gava min dest bi weşandina kovara Nûdemê kir, min bi keda salan, bi xebitandina restorant û marketan, bingehekî aborî yê pêncsalane ji bo kovarê avêtibû. Min beşek ji vê aboriyê ji weşanên Nûdemê re jî veqetand. Herçiqas min otomobîla xwe ya ku ne di hesêb de bû li ser kir jî, dîsan ji ber encaman ez dilşa me. Karê kurdayetiyê weha ye. Çi di warê siyasî de, çi jî di warên din de ger tu bixwazî karekî durust bikî, divê tu heta malwêraniya xwe jî bidî ber çavan. Yan na tu ê tu encaman nestînî. Îro bazareke kurdî tune ye. Do tew tunebû. Lê bi hêviya ku wê sibe çêbibe û wê ev xebat sibe cihê xwe bigire em jî bi înad vê xebatê didomînin. Em hebekî jî bûne mîna dîndaran. Dîndar dixebitin da piştî mirinê herin buhuştê, em jî dixebitin da xebata me piştî mirinê bi kêr were.

- *Ji ber ku şirketeke yan dezgeheke belavkirinê tûne bû, kifş e ku zahmetî di wî warî de hebûn. Gelo we problemên belavkirinê çawa çareser kirin?*

Cewerî: Bi bawerîya min problema herî mezin, problema ji çapê jî mezintir, problema belavkirinê ye. Mirov bi hêsanî dikare çap bike, lê gava ku belav nebe, neyê firotin, negihîje xwendevanan, wê çaxê heta cihekî çapkirin bê mane dibe; rola xwe nalîze, passîv e. Erê, em dizanin ku îro xwendevanên zimanê kurdî kêm in, pirtûkên kurdî li gora pirtûkên tirkî kêm tene firotin, lêbelê ger partiyên siyasî xwe bidin ber firotina pirtûkên kurdî, rojnameyên kurdan bi qasî ku cih didin weşanên bi tirkî cih bidin weşanên bi kurdî, wê rewş ber bi başiyê ve were guhertin. Ev yeka han, wê ji bo rewşa kurdan ya îro rolekê bileyize, lê ger em bixwazin bibin mîna xelkê, ger em bixwazin ev xebat temendirêj be, divê di gava pêşî de weşanxane ji wê hewa fedekariyê derkeve û bi armanceke tîcarî ava bibe. Herweha şirketên belavkirinê yên bi armancên tîcarî ava bibin. Wê çaxê wê ew şirketên belavkirinê li dû kar û fêdeya xwe bin, çiqas pirtûk bifiroşin wê ewqas pere ji wan re were û çiqas pirtûk werin firotin wê ewqas xwendevanên zimanê kurdî çêbibin. Gava xwendevanên zimanê kurdî çêbibin, wê çaxê wê xwendevan li kalîteya pirtûkan bigerin, wê fêrî xwendina zimanê kurdî bibin û ji xwendina

kurdî zewqê bistînin. Gava xwendevanên zimanê kurdî bi vê girseyê çêbibin wê hingî doza rojnameyên rojane, doza kovarên di her babetî de ji were kirin. Ji ber ku zimanê kurdî hê ji zindîtiya xwe diparêze, dibistanên kurdî venebin ji wê dîsan zimanê kurdî hêdî hêdî bibe zimanekî ticarî, edebî, entelektuelî, felsefî û hwd...

Lê îro ne şîrketên kurdan yê belavkirinê hene, ne ji partiyên siyasî xwe ji dil didin ber belavkirin û firotina weşanên kurdî. Herweha dezgehên kurdan ji xwe nadin ber belavkirin û firotinê. Em ji bi riya Nûdemê xwe digihînin xwendevanên bi sînorkirî. Bi zêdebûna aboneyên Nûdemê, hêdî hêdî bala xwendevanan tê ser edebiyata kurdî. Gava kovar derdikeve em di kovarê de behsa weşanên nû dikin, em îlana pirtûkan didin, em bi vî awayî bala xwendevanên zimanê kurdî dikişînin ser weşanên kurdî.

Lê bi awayekî giştî problema belavkirinê, problema weşanên kurdî ya herî girîng e û divê tavilê were çareser kirin. Îcar wê çawan û bi çi awayî were çareser kirin, ez nizanim.

- *Wexta mirov rewşa berê bine li ber çawan di rewşa firotinê de guherandineke berbiçav heye yan ne?*

Cewerî: Tu bêjî nebêjî, rewşa weşanên kurdî, bal û meyla li ser ziman û edebiyata kurdî, li gorî salên heftê û heştêyî, îro baştir e. Herçiqas weşanên kurdî zêde neyên firotin jî, bi zêdebûna kovarên kurdî, bi peydabûna televizyona kurdî re hewildayîneke zimanê kurdî jî heye. Lêbelê, ev min têr nake. Ez pir li ber dikevim ku piştî evqas şer, evqas koçberî, evqas şehîd, evqas wêranî, hê jî kurd li zimanê xwe, li weşanên xwe, li kultura xwe xwedî dernakevin. Ez dixwazim li vir xweşbîn bim û bibêjim pirtûkên kurdî îro ji do bêtir têne firotin. Lê gava tu bipirsî bibêjî çiqas têne firotin, ez ê ji ber hejmara ku têne firotin şerm bikim. Bila partiyên kurdan yê siyasî dilê xwe negirin, ger ew bi rastî bixwazin ew ê bikaribin vê rewşê biguherin. Gava ew şeveke kulturî çêdikin, meşekê li dar dixin, festîvalekê organîze dikin ew dikarin bi dehhezâr û sedhezâran kurdan bicivînin. Lê gava dor tê ser zimanê kurdî, dor tê ser weşanên kurdî bi tenê çend libek têne firotin. Ma ne divê ew bifikirin? Ma ne divê ew çareyekê ji vê yekê re bibînin? Carinan tê bihîstin ku filan weşanxane, an bêvan weşanxane ne ji me ye. Ev çi gotin e? Ma Dostoyevskî, Çexov, Steinbeck, Becket, Camus, Sartre, Böll, Ehmedê Xanî, Celadet Bedir-Xan, û hwd. wê çawan bibin ji wan? Ma ew nafikirin ku ev dibin malê zimanê wan? Ger sibe Kurdistan were rizgarkirin ew ê bi çi serê xwe bilind bikin? Ew ê çawan cihê xwe di nava malbata kultura cihanê de bigirin?

- *Tê bîra min jî. Wexta Nûdem derket, hinekan digot, gelo wê bikaribe weşana xwe bidomîne yan ne. Yê ku gihîştin we, reaksiyonên xwendevanan çi bûn û çi ne? Çi positif û çi negatîf. Tesîrên van çi bû li ser we?*

Cewerî: Gava karekî nû dest pê dibe, mirov li hember bi şik in. Gelo ev kar çi ye? Kî dike? Armanca wê çi ye? Kî li pişt e? Wê paşê bibe çi? Û pirsên bi vî awayî dirêj dibin. Ev yeka han ji bo Nûdemê jî wisa bû. Di destpêka weşana Nûdemê de, kêman kesan bawer dikirin ku wê ev kar biçe serî, wê Nûdem bikaribe jiyana xwe ya weşanê bidomîne. Sebebên vê yekê gelek bûn. Ji ber ku di jiyana çapemeniya kurdan de gelek kovar û rojnameyan bi hêvî dest bi weşana xwe

kirine, lê piştî çend hejmaran ji ber sebebên siyasî, an jî aborî mecbûr mane û weşana xwe rawestandine. Hinek kovarên din derketina meydana çapemeniyê, lê ji ber nebûna nivîskaran mecbûr mane û rawestiyane. Ji aliyê din ve jî, li bakurê welêt, bi taybetî jî piştî salên heftêyî tradisyona ku şexs bi karekî weha rabin, tunebû. Çi bigire hemû kovar û rojname an ji aliyê partiyên siyasî ve derdiketin, an jî ji aliyê komeleyên bi partiyên siyasî ve girêdayî dihatin derxistin. Vêca gava hat dîtîn ku kovarek bi xwedîti û berpirsiyariya şexsekî derdikeve, gelek kes ketin şikê. Hinan gotin karê weha nabe, wê çawan şexsek kovarekê derxe, ma karê bê rêxistin, bê redaksiyon wê çawan here serî? Hinan gotin, filan partî an bêvan partî wê fînanse dike, ma ji ku şexsek dikare vî karî bike? Hin kes vekirî li dij xebitîn, li dij nivîsandin, xwestin wê bifetisînin. Hinek li ber keda min û perê min diketin; hinekan digotin hewesek e, wê derbas bibe. Hin kesan jî ew mîna pirtûkek pîroz didîtîn, faks, name û telefonên ku ew dibir ber perê esmanan ji me re dihatin. Welhasil, herkesî tiştê digot. Hin kesan dixwestin bibin abone, lê bi niyeta ku belkî dernekeve û perê wan here, cesaret nedikirin ku bibin abone. Lê ez ji van reaksiyonan re hazir bûm. Min xwe ji vê yekê re hazir kiribû. Min dizanîbû ku wê ev kovar tavilê neyê girtin, wê heta demekê şik û şubhe li ser bimîne. Loma diviyabû min bêhna xwe fireh bikira û armanca ku min dabû ber xwe hêdî hêdî bidomanda. Min wê çaxê jî heq dida gelek reaksiyonan û ez niha jî heq didim reaksiyonên wê demê. Gelek hevalên ku wê demê li hemberî berdewamiya Nûdemê bi şik bûn û bawer nedikirin ku wê Nûdem bikaribe jiyana xwe ya weşanê bidomîne, piştî ku ew berdewamî dîtîn, fikra xwe guhertin û gelekî kêfxweşiya xwe anîn zimên. Ji ber ku reaksiyonên neyînî bêtir têne xuyakirin, mirov girseya reaksiyonên erînî ji bîr dike. Niha, bi qasî sê karton name û faksên nivîskar û xwendevanên kurd ji seranserî dinyayê ji me re hatine. Ji bilî hin gazinên ku Nûdem nagihîje wan, hemû bi gotinên xweş û dilşahiye ve mişt in. Ev gotinên han bû motora birêvebirina Nûdemê. Her ku Nûdem di wextê xwe de derket, şika li hemberî berdewamiya wê kêmtir bû; her ku Nûdem di warê naverokê de dewlemendtir bû, xwendevan ewqasî nêzîkî wê bûn; her ku sal di ser Nûdemê re buhurîn, aboneyên wê ewqasî zêde bûn; her ku bêhêliya Nûdemê ya di warê partîyê de diyar bû; kurdan ewçend hemêza xwe jê re vekirin; her ku Kurdistanîbûna Nûdemê xuya bû, ew ewqasî bû malê girseya kurdan.

Nûdem niha ketiye heft saliya xwe, ji 100 rûpelî bûye li dor 200 rûpelî, bûye xwediyê bi sedan abone û digihîje destên bi hezaran xwendevan. Ew êdî bûye endameke malê, em nema dikarin bê wê bijîn; lê em dixwazin hê bêtir guh bidinê, hê bêtir lê xwedî derkevin; bikin ku ew hê bêtir bi kêrî ziman û edebiyata kurdî were.

- Baş e, em werin pîrsa qalîteya çapê û naveroka kitêban. Berê mumkun e ku hema çî hat çap bû. Lê nuha hêdî hêdî qalîte û naverok tê munaqesekirin. Dîtina we çî ye? Di vî warî de ger kêmasî yan jî çewtî hebin, li gor we sebebên van çî ne? Gelo xwendevan mecbûr in ku xwedî bi her tiştî derkevin, ji bo ku kurdî ye?

Cewerî: Xwendevan qet ne mecbûr in. Heqê xwendevanan heye ku tiştêkî necibînin bi pişte destê xwe wê de dehf bidin. Divê xwendevan li tiştên baş xwedî

derkevin, li tiştên bi kalîte û spehî xwedî derkevin. Divê li tiştên nebaş xwedî neyê derketin. Ez bawer dikim, ew dema ku tu behs dikî, li Swêdê destpêka salên 80 bû û gelekî normal bû. Piştî 70 salî kurd li xwe vedigeriyan, bi xwe dihesiyan, bi girîngiya kultur û zimanê xwe dihesiyan. Loma jî bi kurdî nivîsandina tiştan belkî jî naverokê girîngtir dihate dîtin. Ji ber ku pîvaneke berbiçav tunebû, destpêk bû. Ew destpêk jî bû bingeha xebata îro. Lê ez bawer dikim di van salên dawî de, êdî mirov jî bi kurdî nivîsandina pirtûkan wêdetir, li kalîte û naverokê digere. Lê di firotina pirtûkan de ferqeke zêde tune ye. Pirs a firotin an nefirotina pirtûkan îro ne bi kalîteya pirtûkan ve girêdayî ye. Bo nimûne; herkes li ser Ehmedê Xanî peyivîn, lê pirtûka wî nehat firotin. Herkes behsa Celadet Bedir-Xan dikin, me pirtûka wî ya li ser gramerê weşand, pirtûka wî û pirtûka nivîskarekî nenas bi qasî hev hatin firotin.

- *Carnan mirov ji bo berhemên xwe dibêjin; "ew hemû wekî zarokên me ne". Tu wexta nuha li wan weşanan dinêrî, pirtûk hene ku tu dibêjî; "îro bû ya min dê ew çap nekirana."*

Cewerî: Nûdem û weşanên Nûdemê di destpêkê de digel kalîteyê, hewildayîneke wê ya teşwîqê jî hebû. Me dixwest em bala kurdan, bala xwende û rewşenbîrên kurdan bikişînin ser kurdî. Gelek kesan nivîsa xwe ya pêşî di Nûdemê de weşandin û niha bûne xwedî pirtûk. Herweha gelek kes bi riya weşanên Nûdemê bûne xwedî pirtûk. Ev jî politikayêke me ya weşanê bû. Tu bala xwe bidî weşanxaneyên Ewropîyan, digel ku ew tîcarî ne jî, salê bi dehan keç û xortên nû dikişînin cihana edebiyatê; reklama wan dikin, di weşanên xwe de cihekî mezin didin wan, pirtûkên wan di camekanên pirtûkêfiroşan de li pêşiya nivîskarên navdar rênê raxistin. Me jî xwest em hebekî ve politikayê bimeşînin. Lê gava ez îro li hin pirtûkan dinihêrin, ez dibêjim ger ew derneketana jî, edebiyata kurdî tiştêk wînda nedikir; lê bi derketina wan jî nivîskarê wan hê bi awayekî cidîtir ber bi cihana edebiyatê ve hatine kişandin. Ji xwe ya ku kêfxweşiyê dide min jî, ev e. Lê em niha di warê çapê de hişktir bûne, em bêtir dineqînin û me bêtir giranî daye ser wergerê.

- *Projeyên we yên pêşerojê çi ne? Çi ji aliyê kitêbên ku li ber çapê ne, çi jî ji aliyê bi tevayî başkirina karûbarê weşanxaneyê.*

Cewerî: Ez bawer dikim di salên pêş de jî wê xebata me her bi vê tempoyê dom bike. Wê salê çar hejmarên Nûdemê û hejmarek Nûdem Werger derkeve. Û ger em problema belavkirin û firotinê çareser bikin, em ê mehê jî pirtûkekê derxin. Em ê hewl bidin ku hem jî aliyê naverokê, hem jî ji aliyê estetîkî ve kalîteya weşanan bilindtir bikin.

- *Hûn di karê weşandinê de tûşî, yanî marûzî zehmetiyên ku ji kapasîteya zimanê kurdî dihatin, bûn an ne?*

Cewerî: Em pêrgî şaşbikaranîna zimanê kurdî bûn. Em gelekî jî dibin. Lê herçî zimanê kurdî ye, herçiqas di warê teknîkî de hebekî qels be jî, bi hêsanî têra edebiyatê dike. Zimanê kurdî zimanekî lîrîk e, bi edebiyata devkî li ser lîngan maye. Edebiyata devkî jî tije gotinên pêşiyar, tije îdyom, tije felsefe ye...

Berpirsiyara Weşanxaneyaya Newroz, Mehabad Qeredaxî: ”Nivîskarên kurd heta nuha ji hev dûr mane”

Weşanxaneyaya Newroz di sala 1993'yan de ava bûye. Heta nuha 21 kitêb weşandine. Berpirsiyara weşanxaneyê, xanim Mehabad Qeredaxî bersiva pirsên me da.

1. Mixabin mirov nikare ji 500 hebî zêdetir pirtûkên kurdî biweşîne li derveyî Kurdistanê. Ev jî probleman ji bo çapê çê dike, mesrefa çapê zêde dibe û qalîteyên pirtûkan hewqas baş nabin wekî yên swêdî. Het nuha jî ev problem berdewam e. Eger em bikaribin li welatên din pirtûkên xwe çap bikin ku li wan deran erzantir e, dê baştir bibe. Qalîteyê kitêban jî dê wê gavê baştir bibe.

2. Problema belavkirina pirtûkên kurdî ew e ku melbendên taybetî yan jî pirtûkxaneyên kurdî li hemû welatên Ewrûpa tunene ku mirov ji wan re pirtûkên xwe bişîne. Ev problem heta nuha jî berdewam e. Mixabin li hemû welatên Ewrûpa kurd hene, lê pirtûkxaneyên kurdî tunene.

3. Heta rewşa çapkirin û belavkirina pirtûkan baş nebe, rewşa firotinê baş nabe. Ez dikarim bibêjim ku hemû pirtûkên min hatine nêzî qedandinê, lê di nav pênc-şeş salan de. Eger melbendên ji bo firotinê li hemû bajarên mezin ên Ewrûpa hebin, di salekê de gelek pirtûk dikarin bên firotinê.

4. Mixabin mirov dikare bibêje, xwendevanên kurd ne aktîf in. Pirtûkên wêjeyî, kulturî, li gor yên siyasî kêm tîn dawa kirin. Eger reaksiyonên xwendevanan wusa negatîf bin li hember pirtûkên wêjeyî û kulturî, weşanxane jî ji van pirtûkan zêde çap nakin. Ez wek nivîskar di vî warî de gelek kêmasî dibînim.

5. Di bersivên pirsên 4, 5 û 6'an de min kêmasî û çewtî û sebebên wan anîn ziman. Tiştê ku dikarim lê zêde bikim ew e ku xwendevanên kurd ên ji çar perçeyên Kurdistanê ji hev dûrin, nikarin berhemên hevdu bixwînin, hevdu nas bikin. Nivîskarên kurd ên ji bakurê Kurdistanê nikarin berhem û pirtûkên ku bi herfên erebî hatine nivîsandin bixwînin. Herwusa nivîskarên başûr û rojhilatê Kurdistanê nikarin berhemên bakur binasin. Li gor min ev problemeke ciddî û xetereke mezin e ku nivîskarên kurd heta nuha ji hev dûr mane.

6. Zimanê kurdî gelek dewlemend e, lê heta nuha ji ber sebebên siyasî zaravayên zimanê kurdî ji hev dûr in. Eger hewldanên rewşenbiri zêde bin, zimanê kurdî dikare bibe zimanê zanist, siyasî û hemû tişt, wekî her zimanekî din.

7. Projeyên me yên pêşerojê ew in ku pirtûkên perwerdeyê, ji bo hînkirina zimanê kurdî li dibistanên swêdî û ewrûpî, çap bikin. Herwusa pirtûkên nivîskarên jin, yan jî li ser xebata jinên kurd, lêkolînên li ser jinên kurd di nav projeyên me de henin. Di nav van de 3 pirtûkên min bi xwe hene, yek ji van

lêkolîneke li ser rewşa jinên kurd e.

8. Ez hêvîdar im ku berpirsiyarên weşanxaneyên kurdî hevdu nas bikin û danûstendin di navbera wan de hebe. Dikarin li ser kêmasî û çewtîyan munaqêşe bikin û çareseriyên maqûl ji wan re bibînin.

Berpirsiyarê Weşanxaneya Diljen, Haydar Diljen: "Weşanxane divê daxwazên xwendevanên kurd esas bigirin"

Weşanxaneya Diljen di sala 1995'an de ava bûye. Heta nuha 2 kitêb weşandine. Berpirsiyarê weşanxaneyê, birêz Haydar Diljen bersiva pirsên me da.

1. Dema ku me dest bi amadekirina pirtûkên dersê kir, nimûneyên ku me jê sûd wergirta pir kêm bûn. Yên heyî jî hem di warê şikil de û hem jî di warê naverokê de pir pêşketî nebûn.

Ji aliyê din ve, di vî warî de çapxaneyên kurdan yêrî hêrî be tecrûbe bûn. Wek tê zanîn, weşan û çapkirina pirtûkên dersê hin zanyarî û kompetensên taybetî dixwaze. Ev yeka li ba çapxaneyên kurdan tunebû û hîn jî tune. Nivîsandin û bicîhkirina rûpelan jî tê de, divê hertiştî nivîskar bi xwe bike. Bi ser de jî xebatkarên çapxaneyên kurdan yêrî ku li metropolên tirkî pirtûkan çap dikin kurdî nizanibin, êdî hûn bifikirin dê şaşiyên çawan derkevin holê.

Di pirtûkên dersê de wêne bi qasî nivîsê girîng e; hetta carnî ji nivîsê girîngtir e. Lê di nav kurdan de kesên ku bikaribin wêneyên pirtûkên dersê çêkin pir kêmin. Di serê gelek wêneçêkerên kurd de civaka kurd hîn ya 40-50 sal berê ye. Dema ku qelem û firçeyên xwe dixebitînin, pêşveçûn û guhertinên di jiyana kurdan de û yêrî dunyayê hesab nakin. Loma em kesên ku pirtûkên dersê û pirtûkên zarokan yêrî din diweşînin di vî warî de zehmetiyên mezin dikişînin. Carnî ji bo ku wêneçêker fêrî bike, ka em wêneyekî çawan dixwazin, em bi rûpelan wêne salox didin.

2. Wek ku me li jor jî got, me qada xebata xwe bi pirtûkên dersê ve sînor kiriye. Û qada pirtûkên dersê jî hin taybetiyên xwe hene. Em li gor van taybetîyan karên xwe dimeşînin. Berî hertiştî em faktayên vê qadê dicivînin. Daxwaz û hewcedariyên mamoste û şagirtan tespît dikin.

Pirtûkên me ji bo darsa kurdî ne. Li Swêdê nêzî 3 hezar şagirtên kurd hene. Darsa kurdî, wek 91 zimanên din, li Swêdê di dibistanan de ji sinifa yekê heta dawîya lîseyê resmî ye. Pirtûkên ku bîrî bikaranînin mamostayê dersê hildibijêre û ji dibistanê re dibêje, dibistan dikire û belediye heqê wan dide.

Wek ku tê zanîn, firotina pirtûkên dersê girêdayî mamosteyên dersa kurdî ye. Divê weşanxane xwe bigîne mamosteyên kurdî, pirtûkên xwe bi wan bide nasandin. Ji bo ku mirov bi mamostan re peywendiyên dayne gelek rê hene. Ji van rêyan yek rêya ku dunya alem bikar tîne, ango rêya reklama bi çapemeniyê ye, yê din jî bikaranîna hin îmkanên din in ku bes ji bo kurdan derbas dibin. Yanê weşanxaneyê ku pirtûkên dersê belav dike, divê bi pirsra "ez çawan dikarim xwe bigihînim mamostayên kurd?" ve herroj mijûl be. Helbet pirtûkên ku baş bin, reklama xwe bi xwe dikin, lê ev reklam bi sînor e.

Belê, ji ber sedemên ku tên zanîn, hejmara xwendevanên kurdî kêm e, lê ji ber sedema awayê xebata weşanxaneyên kurdan ya pîrîmîtîv weşanxane nikarin xwe bihigînin xwendevanên heyî jî.

Mesela, ku weşanxaneyek berî çapkirina pirtûkekê nefikire û nebêje em vê pirtûkê jî bo çî diweşînin, xwendevanên vê pirtûkê dê kîjan kategoriya civakê bin, jî vê kategoriye dikarin çiqas xwendevan hebin. Li gor tecrubeyên berê, ev pirtûk dikare çiqas bê firotin? Berî ku bersiva van pirsan bê dayîn pirtûk bê çapkirin, dê firotina xwe fîyasko be. Divê her nivîskar û çapxane bizanibe, ku kurd êdî ketine pêvajoya kirîna pirtûkên ku bi kêrî wan tên, ne yê ku bes bi kurdî hatine nivîsîn.

3. Em rewşa firotina pirtûkên weşanxaneyên din baş nizanin, lê li gor weşanxaneyên din ez bawerim rewşa firotina pirtûkên me ne xirab e. Ev du sal in ku em pirtûkan belav dikin. Em dixwazin bes du nimûneyan bidin:

Ji pirtûka **Destpêka Rêzimana Kurdî** (Haydar Diljen) di nav du salan de 809 heb hatin firotin û pereyên wan gihaştin me. Pirtûka **Zimanê Min 2** (Haydar Diljen) di dawîya tebaxê de derket piyasa. Heta dawîya sala 1997an, ango di çar mehên de 378 heb hatin firotin û pereyên wan gihaştin destên me.

Helbet ev hejmar li gor mîletên din hejmareke pîr kêm e, lê li gor rewşa firotina pirtûkên kurdî ne hejmareke xirab e.

4. Me heta niha ji mamosteyên kurdî û ji şagirtên kurd reaksiyonên gelek pozîtîv girtine. Me pîrozbayî û pesnên gelek giranbiha jî hin kurdzanên jî girtine. Mesela nameyên Michael L. Chyet û A. Hassanpour yê li ser pirtûkên me li vir hêjayê behskirinê ne. Ku mamoste, şagirt û kurdzanên me li ser pirtûkên me şandina rexneyên xwe ji me re bidomînin, em ê hewl bidin ku pirtûkên baştir biweşînin.

5. Helbet qalîta çapa pirtûkên her mîletî li gor sewiya pêşketina wî mîletî ye. Qalîteye çapa pirtûkên kurdî jî li gor pêşketina civaka me ye. Qalîta çapê hinekî jî girêdayî sewiya têgihîştina kurdan ya estetîkê ye. Civakeka ku gundîtî di rih û mêjiyê endamên wê de hêlinên hesinî çikirine pêşketina nîrxên estetîkî zehmet e. Em hêvîdar in daxwaza qalîteyeka baştir ji xwendevanan were û weşanxane mecbûr bimînin ku pirtûkên baştir derxin. Lê li vir divê mirov bêje ku qalîta çapa pirtûkên weşanxaneyê APEC yê zarokan hêjayî pesindayîne ne.

6. Kîjan ziman dibe bila bibe, ku di qadekê de pîr nehatibe bikaranîn, di wê qadê de di destpêkê de bikaranîna wî zimanî çetin e. Lema di pirtûkên dersê, bi taybetî di pirtûkên dersê yê xebatê de, bikaranîna kurdî di destpêkê de hinekî

zehmet bû. Lê ne zehmetiyeke wisan mezin bû.

7. Di warê pirtûkên dersê de valahîyeke mezin heye. Tijîkirina vê valahiyê ji quweta me der e. Lê dîsa jî em dixwazin van tiştên piçûk bikin:

Îsal em dê pirtûka min a bi navê "Zimanê Min 1" bi hin guhertinên naverokî û bi formeke nû, ji nû ve biweşînin. Ji vê pirtûkê di sala 1990î de 1500 heb çap bûbûn, lê hemû hatine firotin.

Her weha îsal em ê ji bo sinifên 3-4an pirtûkeke kurtenivîsan biweşînin. Ji bo şagirtên lîseyê em pirtûkekê amade dikin. Ev pirtûk dê di sala 1999 de bê weşandin. Û herweha em ê pirtûkên xwe bi mamosteyên kurdî yên ku li welatên din in re bidin nasandin,

8. Pirsê belavkirina pirtûkan ji bo nivîskar û weşanxaneyên kurdan pirseke sereke ye. Lê struktûra weşanxaneyên kurdan jî bi serê xwe pirseke girîng e. Hema hema hemû weşanxaneyên kurdan bi hêviya alîkariya dewletê hatine avakirin. Dema ku dewlet vê alîkariyê kêm dike, krîza weşanxane û komelan jî dest pê dike. Gelek weşanxane bê plan û bê hedef in, nizanin kîjan pirtûkê ji bo çi diweşînin.

Bazara pirtûkên kurdî bazareke teng e. Ev bazar bi pirtûkên ku di warê form û naverokê de dubareyê hev in têr bûye. Divê her weşanxaneya kurd daxwazên xwendevanên kurd esas bigire û bi awayekî nûjen û li gorî serdema zanyariyê di warê şikil û naverokê de li tiştên nû bigere. Ku wa neke û xwe bes bi hêviya alîkariya dewletê ve girêde, pêşeroja weşanxaneyan ji îro de tarî ye!

Em ne bawer in, tiştên ku weşanxaneyên kurdan bi hev re bikaribin bikin, pir in. Lê weşanxane dikarin bi hev re pêşengehan amede bikin, bi hev re li rêyên belavkirinê bigerin.

Lîsteyên kitêbên weşanxaneyan

Weşanên Roja Nû

(Stockholm*, 1980)

- Alîko û Baz/ Baran/ çîrok/ 1985/ 40 rûpel/ kurmancî.
- Azadî û Jîyan/ Kemal Burkay/ helbest/ 1988/ 256 rûpel/ kurmancî-tirkî.
- Çarîn/ Kemal Burkay/ helbest/ 1992/ 70 rûpel/ kurmancî.
- Çend Pirsên Alfabeya Kurdî/ Dr. Celadet Çelîker/ lêkolîn-şirove/1996/ 173 rûpel/ kurmancî.
- Daxwazname/Namî/ helbest/ 1986/ 54 rûpel/ kurmancî.
- Dersên Zimanê Kurdî/ Baran/ 1988/ 167 rûpel/ kurmancî-tirkî.
- Dîsa Şer û Hesret Para Me Ket/ Vazgal Bazîdî/ helbest/ 88 rûpel/ 1989
- Dîwan/ Melayê Cizîrî/ 1987/ 570 rûpel/ kurmancî.
- Dimdim/ Erebe Şemo/ roman/ 1983/ 206 rûpel/ kurmancî.
- Em û Dijmin/ Seydayê Keleş/ helbest/ 1986/ 212 rûpel/ kurmancî.
- Folklorê Kurdî/ Cîgerxwîn/ lêkolîn-berhevok/ 1988/ 206 rûpel/ kurmancî.
- Gardîyan/ Bûbê Eser/ roman-serpêhatî/ 1994/ 163 rûpel/ kurmancî.
- Gramera Zimanê Kurdî/ Prof.Qanatê Kurdo/ 1990/ 335 rûpel/ kurmancî-soranî.
- Hatîratim/ Nurî Dersîmî/ bîranîn/ 1986/ 221 rûpel/ tirkî.
- Hêvî/ Cîgerxwîn/ helbest/ 1983/ 186 rûpel/ kurmancî.
- Hopo/ Erebe Şemo/ roman/ 1990/ 208 rûpel/ kurmancî.
- Hotay Serra Usivê Qurzkizî/ Mûnzûr Çem/ roman/ 1992/ 343 rûpel/ dimilkî.
- Jîyana Bextewar/ Erebe Şemo/ roman/ 1990/ kurmancî.
- Kürdistan'da Eğitim Süreçleri/ Rohat/ 1985/ 86 rûpel/ tirkî.
- Kîlam û Miqamêd Cimaeta Kurda/ Cemîla Celîl/ 1982/ 143 rûpel/ kurmancî.
- Li Ser Rîya Cîgerxwîn/ helbest/ 1986/ 166 rûpel/ kurmancî.
- Mem û Zîn/ Eskerê Boyîk/ tîyatroy/ 1989/ 80 rûpel/ kurmancî.
- Mem û Zîn (duwanzde varîyant)/ Qanatê Kurdo/ berhevok/ 1996/320 rûpel/ kurmancî.

(*) Stockholm di maneya wîlayetê de hatiye bikar anîn.

- Mewlûd/ Mela Ehmedê Batê/ 1987/ 64 rûpel/ kurmancî.
- Nûbar/ Ehmedê Xanî/ 1986/ 80 rûpel/ kurmancî.
- Peyvên Me/ Haluk Öztürk/ ziman-zarok/ 1984/ 208 rûpel/ kurmancî.
- Ronak/ Cîgerxwîn/ helbest/ 1980/ 208 rûpel/ kurmancî.
- Sîyabend û Xecê/ Tosinê Reşît/ tîyatroy/ 1989/ 70 rûpel/ kurmancî.
- Şefaq/ Cîgerxwîn/ helbest/ 1982/ 180 rûpel/ kurmancî.
- Şervanekî Biçûk ê Vîetnamî/ Nguyen Than/ werger: Aram Bawer/ 1988/ 64 rûpel/ kurmancî.
- Şêx Sen'an/ Feqîyê Teyran/ 1986/ 142 rûpel/ kurmancî.
- Tarîxa Edebiyata Kurdî 1/ Qanatê Kurdo/ 1983/ 192 rûpel/ kurmancî.
- Tarîxa Edebiyata Kurdî 2/ Qanatê Kurdo/ 1985/ 178 rûpel/ kurmancî.
- Tarîxa Kurdistan 1/ Cîgerxwîn/ 1985/ 216 rûpel/ kurmancî.
- Tarîxa Kurdistan 2/ Cîgerxwîn/ 1987/ 256 rûpel/ kurmancî.
- William Tell/ Scherman Katharîne/ çîrok/ 1993/ 62 rûpel/ kurmancî.
- Zembîfiroş/ A. Gernas/ tîyatroy/ 1995/ 104 rûpel/ kurmancî.
- Zend Avista/ Cîgerxwîn/ helbest/ 1981/ 176 rûpel/ kurmancî.
- Zozan/ Casimê Celîl/ helbest/ 1982/ 186 rûpel/ kurmancî.
- Almanaxa Kurdî/amadekar: Navenda Lêkolînên Kurdî-Moskova/ 1997/ 264 rûpel/ kurmancî.
- Duaya Serê Sibê/ Eskerê Boyik/ 1997/ 79 rûpel/ kurmancî.
- Oda Çîroka 1/ Eskerê Boyik/ 1997/ 103 rûpel/ kurmancî.

Weşanên Çanda Kurdî

(Stockholm, 1980)

- Keça Şerrût Lotta/ Astrid Lindgren/ zarok/ 1981/ 60 rûpel/ kurmancî
- Nebezê Li Çîyayê Mazî De/ J. Ahlbom/ zarok/ 1986/ 30 rûpel/ kurmancî.
- Alfonsê Şît/ Gunilla Bergström/ zarok/ 1983/ 22 rûpel/ kurmancî.
- Alfonsî Şîteke/ Gunilla Bergström/ zarok/ 1990/ 22 rûpel/ soranî.
- Ma Tu Tirsonêkî Alfons?/ Gunilla Bergström/ zarok/ 1981/ 30 rûpel/ kurmancî.
- Alfons û Cinawir?/ Gunilla Bergström/ zarok/ 1981/ 30 rûpel/ kurmancî.
- Alfons û Janawarake/ Gunilla Bergström/ zarok/ 1985/ 30 rûpel/ soranî.
- Şevbaş Alfons Åberg/ Gunilla Bergström/ zarok/ 1985/ 24 rûpel/ kurmancî.
- Tuan/ Eva Boholm-Olsson & Pham van Don/ zarok/ 1986/ 27 rûpel/ kurmancî.
- Tuan/ Eva Boholm-Olsson & Pham van Don/ zarok/ 1986/ 27 rûpel/ soranî.

- Pisîngê Ku Wenda Bû/ M. Ekström/ zarok/ 1985/ 30 rûpel/ kurmancî.
- Kundirê Helez/ L. Hellsing/ zarok/ 1986/ 27 rûpel/ kurmancî.
- Çîyayê Agirî/ Yaşar Kemal/ novel/ werger: Kurdî Şerefnazê/ 1990/ 128 rûpel/ kurmancî.
- Akin Di Bawekî Namoda/ B. Kristal-Anderson/ zarok/ 1989/ 42 rûpel/ soranî.
- Akin Di Hembêza Welatê Nû de/ B. Kristal-Anderson/ zarok/ 1989/ 42 rûpel/ kurmancî.
- Kela Jînê/ Veronika Leo/ zarok/ 1986/ 32 rûpel/ kurmancî.
- Baharî Taze/ Astrid Lindgren/ zarok/ 1990/ 32 rûpel/ soranî.
- Belê Lotta Kare Bajo/ Astrid Lindgren/ zarok/ 1982/ 32 rûpel/ kurmancî.
- Binêre Madîkan Berf Dîbare/ Astrid Lindgren/ zarok/ 1983/ 32 rûpel/ kurmancî.
- Gava Rindikê Dixwast Şûmîyan Bike/ Astrid Lindgren/ zarok/ 1985/ 60 rûpel/ kurmancî.
- Pîppî ya Goradirêj/ Astrid Lindgren/ zarok/ 1982/ 24 rûpel/ kurmancî.
- Şûmîya Zîrek ya 325/ Astrid Lindgren/ zarok/ 1986/ 54 rûpel/ kurmancî.
- Arhuaco/ B. A. Runnerström/ zarok/ 1983/ 50 rûpel/ kurmancî.
- Bavo, Were Derve/ Ingrid Sandberg & Lasse Sandberg/ zarok/ 1986/ 32 rûpel/ kurmancî.
- Ma gakûvî Kûçikan Dixwin?/ L. Frick/ zarok/ 1983/ 30 rûpel/ kurmancî.
- Kino Dîgot: Alîkarî Bikim/ Ingrid Sandberg & Lasse Sandberg/ zarok/ 1983/ 32 rûpel/ kurmancî
- Kino Dîgot: Ka Lingê Min/ Ingrid Sandberg & Lasse Sandberg/ zarok/ 1991/ 32 rûpel/ kurmancî.
- Kino Dîgot: Li Wê Derê Binêre/ Ingrid Sandberg & Lasse Sandberg/ zarok/ 1983/ 30 rûpel/ kurmancî.
- Spî û Reş û Hemûyên Din/ Ingrid Sandberg & Lasse Sandberg/ zarok/ 1987/ 29 rûpel/ kurmancî.
- Emîl, Mîha Nîvçe/ P. Szabo/ zarok/ 1986/ 28 rûpel/ kurmancî.
- Sampo Lapecan/ Z. Topelius/ zarok/ 1984/ 28 rûpel/ kurmancî.
- Ordîya Meşên Hunguv/ Bekir Yildiz/ zarok/ werger: Şerefnazê/ 1990/ 46 rûpel/ kurmancî.
- Xwençe 1/ Zeynelabidîn Zinar/ folklor/ 1989/ 278 rûpel/ kurmancî.
- Xwençe 2/ Zeynelabidîn Zinar/ folklor/ 1990/ 288 rûpel/ kurmancî.

Weşanên Jîna Nû

(Uppsala, 1984)

- Dengê Xêzikan/ Mamoste (Abdurrahman Gezgîn)/ karîkatur/ 1984/ 80 rûpel
- 1925 Kürt Ayaklanması (Şeyh Saîd Hareketi)/ M. A. Hasretyan, K. M. Ahmed, M. Ciwan/ tarîx/ 1985/ 75 rûpel/ tirkî.
- Ronahî (Çapa hemû hejmarên -28 hejmar- kovara Ronahî ku di navbera salên 1942-1945'an de ji alî Celadet Alî Bedirxan li Şamê dihat derxistin.)/ dokument 1985/ 584 rûpel/ kurmancî.
- Jiyana Rewşenbîrî û Siyâsî ya Kurdistan (Di Dawîya Sedsala 19'a û Destpêka Sedsala 20'a de)/ Celîlê Celîl/ tarîx/ wergera ji soranî: Elîşêr/ 1985/ 200 rûpel/ kurmancî.
- Büyük Anayurt Savaşında Kürtler (1941-1945)/ H. M. Çetoev/ tarîx/ wergera ji rûsî bo tirkî: J. Pêşengî/ 1985/ 87 rûpel/ tirkî.
- Hommage a Yılmaz Güney -Image du Kurdistan de Turquie- / Şuayib Adlig/ foto album/ 1985/ 52 rûpel/ tirkî û fransî.
- Komara Demokratîk a Kurdistan (Mahabad)/ Kerîmî Husamî/ tarîx/ werger (ji soranî): Elîşêr/ 1986/ 113 rûpel/ kurmancî.
- Roja Nû (Çapa hemû hejmarên -73 hejmar- rojname Roja Nû ku di navbera salên 1943-1946'de ji alî Kamûran Alî Bedirxan li Beyrûdê bi Fransî û Kurdî dihat derxistin.)/ dokument/ 1986/ 290 rûpel/ kurmancî (lat.)+fransî.
- Le Bîrewerîyekanim (Bergî yekem, le minaliyewe ta salî 1957)/ Kerîmî Husamî/ bîranîn/1986/ 316 rûpel/ soranî.
- Yüzyılımız Başlarında Kürt Milliyetçiliği ve Dr. Abdullah Cevdet/ Malmîsanij/ lêkolîn/ 1986/ 124 rûpel/ tirkî.
- Hêsir û Baran/ Bavê Nazê/ çîrok/ 1986/ 62 rûpel/ kurmancî.
- Zazaca-Türkçe Sözlük/ Ferhengê Dimilkî-Tirkî/ Malmîsanij/ ferheng/ 1987 / 431 rûpel/ dimilî-tirkî.
- Agirê Sînema Amûdê/ Mela Ahmedê Namî/ 1987/ 82 rûpel/ kurmancî.
- Na Xumxum a.../ Koyo Berz/ folklor/ 1988/ 213 rûpel/ dimilî.
- Bir Kürtle Konuşma.../ Adonis Budurîs/ helbest/ werger: K. Salîh/ 1988/ 75 rûpel/ tirkî.
- Herakleitos/ Malmîsanij/ helbest/ 1988/ 51 rûpel/ dimilî.
- Dîwana Rûhî/ Şêx Ebdurrehmanê Axtepî/ helbest/ wergera ji tîpên erebî: Z. Kaya, M. E. Narozî/ 1988/ 130 rûpel/ kurmancî.
- Şairên Klasîk ên Kurd/ Ebdulreqîb Yûsif/ biyografî/ wergera ji tîpên erebî: Elîşêr/ 1988/ 110 rûpel/ kurmancî.
- Li Kurdistanê Bakur û li Tirkîyê Rojnamegerîya Kurdî (1908-1981)/ Malmîsanij û Mahmûd Lewendî/ lêkolîn/ 1989/ 309 rûpel/ kurmancî.

- Zargotina Kurdên Suriyê/ Celîlê Celîl/ folklor/ wergera ji tîpên kirîlî: Ahmet Ömer/ 1989/ 408 rûpel/ kurmancî.
- Mîrsad-ul Etfal (Amadegaha Zarûkan)/ Şêx Mihemed Kərbela/ werger (ji herfên erebî): Z. Zinar/ 1989/ 127 rûpel/ kurmancî (78 rûpel lat. + 49 rûpel er.),
- İki Dünya Savaşı Arasında Irak'ta Kürt Sorunu/ Şakirê Xudoyê Mihoyan/ lêkolîn/ wergera ji rûsî bo tirkî: J. Silav/ 1990/ 90 rûpel/ tirkî.
